English-Kurmanji Word List

a

a lot (*see* have (v); much; many; lots; lots of)

Aarat Errarrat (f)

Aaron Harun

abandon (v) hêlan, bihêle (Babî biçîkêt xwe hêlan. *The father abandoned his children.*)

abdomen zik (m) (Zikê min di'êşit. *My stomach hurts.*)

Abel Habîl

Abijah Ebîya

ability (1) qodiret (f) (Xwedê qodiret da me da em bişêîn ferqîê bikîn. *God gave us the ability to make our own choices.*)
(2) zîrek u çespan (Leqman gelek zîrek u çespan e bu şulê xwe. *Leqman is very able / has a lot of ability to do his work.*)

able (1) zîrek u çespan
(2) çelek u çespan (Leqman gelek çelek u çespan e bu şule xwe. *Leqman is very able to do his work.*)

able to (v) (*see* be able to, can)

abolish (v) pîç kirin, pîç bike ('Îsaî got, "Ez ne hatîme da ez disturî pîç bikim." *Jesus said, "I haven't come to abolish the law."*)

abort (v) biçîk ji ber xwe birin, biçîk ji ber xwe bibe (Wê biçîk ji ber xwe bir. *She aborted her baby.*) (Guneh e tu biçîkî ji ber xwe bibî. *It's sin for you to abort the baby.*)

abortion biçîk ji ber xwe birin (Biçîk ji ber xwe birin guneh e. *Abortion is sin.*)

about (1) teqirîben (teqirîben se'et ḧeft *about 7:00*)
(2) tê heye (Ar) (tê heye se'et şeş *about 6:00*)
(3) derbarê (Pisîara min kirin derbarê biçîka. *She asked me about the children.*) (Buçî tu pisîara min dikî derbarê yê baş? *Why do you ask me about what is good?*)

above (1) li hindav (Tavê li hindav me ye. *The sun is above us.*)
(2) (li) ser (Risim li ser 'eynê ye. *The picture is above the mirror.*)

abroad xaric (Ar) (Ezê çim xaric. *I'll go abroad.*)

absent ẍaîb

accept (v) qebîl kirin, qebîl bike (Min qebîl kir ew dîarîe ji te. I *accepted that gift from you.*)

accident belaek (Belaek bi serî hat. *An accident happened.*) (Belaek min çêkir. *It was an accident [that I wrote on the wall].)*

accident (v) (*see* have an accident)

accomplish (v) dirist kirin, dirist bike (Ḧemî şulêt xwe min dirist kirin. *I accomplished / finished all my work.*)

according to bu

account hijmar (f) (Paşaîekîe vîa hijmarê di gel kuîlêt xwi biket. *A king wanted to settle accounts with his servants.*)

accountant miḧasib (m)

ace (playing card) bilî

acknowledge (v) aşkira kirin, aşkira bike (Tu min aşkira ne ke ji ber Dilnazê. *Don't acknowledge me (because I don't want Dilnaz to know I'm here).*)

across rast (Bixwîne rast. *Read across [the page].*)

across from (1) meqabilî (Ew meqabilî min rînişt. *He sat across from me.*) (Mala me meqabilî avê ye. *Our house is across from the water.*)
(2) li pêş … ve (Ez li pêş televizîunê ve rîniştim. *I sat across from the TV.*)
(3) li beramberî (Ez li beramberî te me. *I'm across from you.*)

action kar (m) (Te çi kar kirî ye? *What [action] have you done?*)

active (1) bi xîret
(2) har [for children] (Ew har e. *She's active!*)
(3) bi bizav (Leqman gelek bi bizav e. *Leqman is very active.*)

actor mumeθil

Adam Adem

add (v) zêde kirin, zêde bike

addition zêdekirin (f)

address 'eynwan (m) ('Eynwanê te çi ye? *What's your address?*)

adjective (1) ewil nav
(2) sîfe (Ar)

administrative assistant (1) mi'awinê midîrî
(2) misa'edê midîrî
(3) cêgirê daraî

adolescence (1) miraheq (Heriş kurrkeki miraheq e. *Heriş is an adolescent.*)
(2) [idiomatic] (Kiçik u kurrik geheştî ne. *The girl and boy are "ripe." / The girl and boy are going through adolescence.*) (Kiçik digehit, yê geheştî, yê li şîa ye. *The girl "has arrived", is "ripe", should get married.*) (Ew digehet. / Dengê wî bedil dibit. *He has arrived. / His voice is changing.*)

adult mezin

adult school (1) mekteba şevê
(2) mekteba mîhenî
adulterer (1) dehmen pîs (m/f)
(2) zinaker (m/f)
(3) (*see also* commit adultery)
adultery (1) dehmen pîsî (f) (Ez ḧes ji dehmen pîsîê nakim. I *don't like adultery.*) (Dehmen pîşî gelek ne baş e. *Adultery is very bad.*)
(2) zina (f)
adverb (1) ewil firman
(2) zerif (m) (Ar)
adversary dujmin
advice (1) amujgarî (f) (Amujgarîa wî gelek baş bî. *His advice was very good.*)
(2) nesîḧet (f)
advise (v) amujgarî kirin, amujgarî bike (Amujgarîa li biçîka bike da reḧet bin. *Advise me what I should do so that the children are quiet.*)
affairs kar (m)
affection diluvanî (f)
Afghan Evẍanî
Afghanistan Evẍanistan
afraid (v) (*see* be afraid)
afraid of everything (1) tirrsuker
(2) ceban (Ar)
Africa Efrîqîa
after (1) (li) dîv (Li dîv min were. *Come follow [after] me.*)
(2) piştî (piştî ḧeftîekê *after a week*)
(3) "after some time"
(bê hinek dî *after a while*)
(çend salek dî *after many years*)
(heyamek dî *after a short time [days, weeks]*)
(piçek dî *after a short time [minutes]*)
(piçîskek dî *after a very short time [minutes]*)
(4) "after that" [for story-telling and conversation]
(a) dîv da (Emê dersê xwînîn. Dîv da em dê xwarinê xwîn. *We're studying the lesson. After that we'll eat.*)
(b) paşî (Paşî ezê te bînim. *After that I'll see you.*)
(c) piştî hîngê (Emê çîn şulî. Piştî hîngê dê çîn sîkê. *We're going to work. After that we'll go shopping.*)
(d) rabî(n) (Rabî çû daristanê. *After that he went to the forest.*)
afternoon (1) êvar (f) (Se'et sê heta pênc êvar e. *3:00 - 5:00 is afternoon.*)
(2) êvarî (f) (Êvarî emê timbelê bajoîn. *We'll drive in the afternoon.*)

(3) nîvro (f) (Se'et duzde heta sê nîvro ye. *12:00 - 3:00 is afternoon.*) (Emê nîvro fravînê xwîn. *We'll eat in the afternoon.*)
aftershave lewenta riha
again (1) carek dî (Carek dî were def min. *Come to me again.*)
(2) dîsa [used in story-telling or in making a point] (Dîsa tu hatî def me. *You came to our [house] again.*)
(3) ve [postposition used after verbs] (Vê dersê bixwîne ve. *Read this lesson again.*)
against (1) dijî (çend cara biraê min dijî min xelet bit ez lê biburim? *How many times shall I forgive my brother when he sins against me?*)
(2) derheqê … da (Bilind xelet bî derheqê min da. *Bilind sinned [made a mistake] against me.*) (Ez derheqê Şirînê da ne baş im. *I sinned against Şirîn.*)
age (1) 'emir (m) ('Emirê te çend e? *How old are you?*)
(2) serdem (f) (dumahîa serdema cîhanê *the end of the age of the world*)
(3) dinya (f) (li dumahîka dinyaê *at the end of the age / world*)
agha (feudal landowner; chief of a tribe) aẍa (Pale bu aẍaî şul dikin. *Peasants work for the agha.*)
ago (1) "a long time ago"
(a) ji mêj e (Ez ji mêj e hatim vî xanî. *I came to (live in) this house a long time ago.*)
(b) zemanê berî (Zemanê berî kehreb ne bî. *There was no electricity a long time ago.*)
(2) (ḧeftîa dî / ḧeftîa çûî *a week ago*) (heyva dî / heyva çûî *a month ago*) (par / sala dî / sala çûî *a year ago*)
agree (v) (1) pêk hatin, pêk bê (were) (Li gel wan pêk hat dînarekê bidetê *He agreed to give them a denarius.*) (Heker dû ji we pêk hatin di her karekî da dawxaza wan çi tişt bit … *If two of you agree about anything you ask for …*)
(2) (*see also* make an agreement)
agreement (1) muafeqe (f)
(2) itîfaq (f) (Min itîfaq gel te yê kirî, em biçîn parkê pêk ve. I *made an agreement with you to go to the park together.*)
agricultural zira'î
aides (HIV) êdz
aim (1) mereq (f)
(2) qest (f)
(3) meqsed (f)
air conditioner (1) moberîde (f) (Moberîde tamirandî çinko dinya sarr bî. *The air conditioner is off because the weather is cold.*)

(2) tebrît (Tebrît hil e. *The air conditioner is on.* Tebrît tamirî ye. *The air conditioner is off.*)
airplane (1) teyare (f) (Çend se'eta da ji Emrîke ḧeta Holende bi teyarê? *How many hours does it take to go by plane / to fly from America to Holland?*)
(2) balefir
(3) firuk
airport metar (m)
aisle refik (f) (refka pêncê *aisle five*)
Algeria Cezaîr (f)
alien card cinsîe (f)
alike (1) wek êk
(2) ştî êk
alive sax
all ḧemî (rojê ḧemîê *all day*) (Ḧemî rojê ez mam li malê. *I stayed home all day long.*)
all right tebî'î (Tebî'î tu bêî mala me. *It's all right for you to come to our house.*)
allergies ḧesasîa (Min ḧesasîa ji biharê hey. *I have allergies from spring.*)
alley kulan (f)
alligator tîmsaḧ
allow (v) (1) hêlan, bihêle
(2) hêlan, pêle (Pêlin her dû pêke ve şîn bibin. *Let them both grow together.*)
(3) ber dan, ber (bi)de (Pirrça xwe ber bide. *Allow your hair to grow.*)
almond (1) bahîv
(2) behîv
almost (1) dur (dur se'et pênc *almost 5:00*)
(2) piçekê maî (Piçekê maî ez xilas bîm. *I'm almost finished.*)
(3) hêş (Biraê min hêş ne bî ye çil salî. *My brother is almost 40 years old.*)
(4) hindek roja (Hindek roja ji ḧeftîê ez dewî vedixwim. *Almost every day I drink the yogurt drink.*)
alone (1) bi tinê
(2) tenha
alphabet pîtêt elîfbêtka
also jî
although welew
(2) her çende (U her çende 'Îsaî jêravkirin ne dikir … *Although Jesus did not baptize …*)
aluminum fafun
aluminum foil selîfun

always (1) her dem
(2) her car
(3) her u her
(4) her (Kesma u kadêt xwe her husa çeke. *Always make your cookies like this.*) (Ez çûme mala Adarê. Her wesa Şirîn gel min hate malê. *I went to Adar's house. Şirîn always came with me [like this – to Adar's house].*)
amazed (v) (*see* be amazed)
ambassador sefîr (m/f)
ambulance is'af (f)
America Emrîke (f)
American Emrîkî (m/f)
American Indian Hinduk
among (1) di nav … da (Ew di nav wan da bî? *Was he among them?*)
(2) li nav (Şivanê li nav pezê xwe. *The sheperd is among his sheep.*)
(3) li nav … da (Ez rîniştim li nav gula da. *I sat among the flowers.*)
(4) di … ra
amputate (v) birrîn, bibirre (Dixturî destê wî birrî. *The doctor amputated his arm.*)
ancestor babkalik (m)
ancestry 'esil (m)
and u
anesthesia benc (Dixturî ez benc kirim ji berî 'emelîatê. *The doctor gave me anesthesia before the surgery.*)
angel (1) melaîket
(2) firîşte (m/f)
(3) milyaket (m/f)
anger (1) ẍezeb (f)
(2) kerrib (f) (Xudan jî kerrbêt wî gelek ve bîn. *The anger of the master was great / he was very angry.*)
(3) bi kîn [very bitter] (Çend tu bi kîn î! *You're very bad / full of bitter anger.*)
anger (v) (*see* be angry *and* become angry)
angry (1) 'êciz (Min tu 'êciz kirî? *Did I make you angry?*)
(2) 'aciz
(3) qehir
(4) têkçû
(5)har
(6) [idiomatic] (Dilê te ji mi maî ye? *Did I make you angry? / Are you mad at me?*)
(7) [idiomatic] (Dilê te mînit? *Will you be unhappy?*)
(8) bi ẍezeb (Ew bi ẍezeb e. *He is very angry.*) (Ev mirove bi ẍezeb e. *The people are angry and fighting about something.*)

(9) ẍezeblî (Ew gelek miruvek ẍezeblî ye. *He is a very angry person (full of rage).*)
animal ḧeywan (m/f) (ḧeywanêt qewî *domestic animals*) (ḧeywanêt kîvî *wild animals*)
animal skin kevil (m)
animistic doctor ḧekîm
Ankara Enqere
ankle guzek (f)
ankle bracelet ḧicula
Anna Ḧenna
anniversary (1) 'îd zewac (m)
(2) cejina şîkirin (f) (Dihî cejina şîkirna deyk u babêt min bî. *Yesterday was my parents' anniversary.*)
(3) bîrhatin (f)
announce (v) (1) beyan kirin, beyan bike (Qaîdê Emrîkî beyan kir ew dê çin nav Kosovo da. *The American captain announced they would go to Kosovo.*) (Beyana yazdê Adarê ḧikmêzatî bu Kurdistanê beyan kir bu Kurda u bu alemê. *Announcement of March 11: Kurdistan's autonomy was announced by Kurds and for everyone.*)
(2) mijde kirin, mijde bike
anoint (v) (1) rûn kirin, rûn bike
(2) çewir kirin, çewir bike (Te bi zeytî ez çewir kirim. *You anointed me with oil.*)
anointed rûnkirî (Ez dizanim tê rûnkirî ewê dibêjinê mesîḧ dê êyn. *I know an anointed one called the Mesiah will come.*)
another dî (carek dî *another time*)
answer (1) cab (f) (Ew cabê wê dit. *She answers her.*) (Caba min bide. *Give me an answer.*) (Cabê bide min. *Answer me.*) (Duşembê ez dê cabekê dim te. *Monday I'll give you an answer.*) (Min cabek da wê. *I answered her.*)
(2) bersiv (f) (Wî bersiva wan da. *He answered them.*)
answer (v) (1) bersiva cab … dan, bersiva cab … bide (Wî bersiva caba min da. *He answered my message.*)
(2) qebîl kirin, qebîl bike (Xwedê di'aê min qebîl kir. *God answered my prayer.*) (Xwedê qebîl dikit. *May God answer [your prayers].*)
(3) rakirin, rake ([Telefonê] rake. *Answer [pick up] the phone.*) (Kesê telefon ne rakir. *No one answered [picked up] the phone.*)
answerable to hejî
answering machine mekîne (f) (Mekînê cab da. *The answering machine "answered" the phone.*)
ant mêrî (f)
Antarctica mincemîde cinubî

antler şax (m)
anxious şebrize
any nînin (pl) (Min nînin. *I don't have any.*)
anybody (1) kes
(2) kesek
anyone (1) kes
(2) kesek (Kesek pirsîara te dikit? *Does/has anyone ask(ed) you?*)
anything (1) çi tişt(î)
(2) karekî (Heker dû ji we pêk hatin di her karekî da dawxaza wan çi tişt bit... *If two of you agree about anything you ask for...*)
anytime hema kengî (Hema kengî tu bêî. *You can come any time*)
apart from cida (Kefçika ji çetala cida ke. *Separate the spoons apart from the forks.*)
apartment şiq (f)
apathetic bê xem
apparently ekîd (Ar) (Seyara wê de'mî, bes ekîd çi li wê ne hati ye. *She had a car accident, but apparently she wasn't hurt.*)
appear (v) dîar bîn, dîar bibe
appendix (1) rîvîka kure
(2) misran (Ar)
(3) misiran ile'wer (Ar)
apple sêv (f)
appointment mo'ed (Min mo'ed li gel dixturî yê hey. *I have a doctor's appointment.*)
appropriate minasib
approval qebîl (f)
approved (v) (*see* be approved)
approximately (1) tê heye
(2) teqirîben
(3) (*see* about [for sentences])
apricot mişmije (f)
April (1) Nîşan (f) (Drewa Nîsanê ye! *April fools!*)
(2) heyva çar (f)
apron melîtik
Arab (people) 'Ereb (m/f)
Arabic (language) 'Erebî (f)
Archelaus Erxîlaw
architect mihensis
area (1) meydank (m) [open place] (Dê dawetê deynin li meydankekî mezin. *They'll have the wedding in a large open area.*)
(2) menteqe (f)
arm dest (m) (Min destê xwe şikand. *I broke my arm.*)

Armenian (people, language) Armenî
around (1) li dur man dur (Gul li dur man dur medresê ne. *Flowers are all around the school.*)
(2) dur man durî
(3) li dur (Wî kir ẍar li dur medresê. *He ran around the school.*)
arrange (v) cihêt wana guharrtin, cihêt wana biguhurre
arrive (v) (1) gehan, bigehe
(2) geheştin, bigehe (Em geheştîn. *We've arrived. [Said when you get to where you're going.]*) (Em drengî geheştîne pasê. *We got to the bus too late.*)
arrow (1) sehem [arrow in a traffic light or painted on the street]
(2) tîr (Heker "Cupid" tîrêt xwe avêtin … *If Cupid shot his arrows …*)
art risim (m)
artery demar (m) (demarê mezin *large vein*)
artist resam
Asher Eşîr
ashes xulî (f)
Asia Asîa
ask (v) (1) xastin, bixaze (Min komedîn ji te xast. *I asked you for the bookshelf.*) (Wî ez xastim. *He asked me to marry him.*)
(2) pisîara … kirin, pisîara … bike (Ez dişêm pisîara te bikim? *Can I ask you [a question]?*) (Te pisîar kir ka xeste li kîve ye? *Did you ask where the hospital is?*) (Pisîara Sîlavê bike. *Ask Sîlav.*)
ask about (v) lê pirsîn, lê bipirse (Te li çentê Adarê pirsî? *Did you ask Adar about the pen [that was lost]?*)
Assyrian (language) Filhanî (f)
Assyrian (people) Sirîa
asthma tengenefes (Tengenefesê hey. *I have asthma.*)
astonished mendehuş
asylee (political refugee) muşextî (m/f)
at (1) li (Ew li mal e? *Is she at home?*)
(2) di … da (at the time of) (Di wextê Clintonî da em hatîn Emrîka. *At the time of Clinton we came to America.*)
(3) di … ra (Ez di meẍreb ra dê êm mala te. *At dusk I will come to your house.*)
(4) (Evroke ez di nav ḧefla Newrozê da bîm. *Today I was at the Newroz party.*)
(5) ber (Ez ber derrgehî me. *I'm at the door [e.g., said to your host through the apartment intercom system at the fron tdoor].*)
at once (1) nuke
(2) niho

(3) êk ser
(4) yek ser
attach (v) pê vekirin, pê veke (Min taî bi derzî vekir. *I threaded the needle.*) (Min gul bi singê te vekir. *I attached the flower to the front of your shirt.*) (Min tîp pê vekir. *I taped it together.*)
attack (v) hircîmî … kirin, hircîmî … ke (Şêrî hircîmî min kir. *The lion attacked me.*)
attention (*see* warning)
attic mezelka zêde li ser banî (f)
attractive (*see* beautiful *or* handsome)
August (1) Ab (f)
(2) heyva heşt (f)
aunt (1) xalet (f) [maternal]
(2) met (f) [paternal]
Australia Istralîe
author nivîser (m/f)
authority destur (m) (Desturê biserrmana Qur'an e. *The authority of the Muslims is the Koran.*)
autonomy ḧikmêzatî (m)
autumn paîz (f)
awake hişîar
ax bivir

b

B.A. / B.S. degree bekelurîe
babble (v) bê raman dubare kirin, bê raman dubare bike (Ew her tiştê bê raman dubare dikit. *She repeats everything without thinking / babbles.*)
baby (1) biçîk (m) (biçîkê sava *young baby*)
(2) zarûk (m)
(3) zikmak (unborn baby)
(4) têşik (m/f) [animal young] (têşkê pişîkê *(m) kitten / baby cat*)
babysit (v) biçîka bi xwe xudan kirin, biçîka bi xwe xudan bike
babysitter (1) dayîn (f) (Dê biçîkêt xwe deynin def dayînekê. *They will leave their children with a babysitter.*)
(2) mirebî (Ar)
bachelor zigurdî (m/f)
back (1) pişt (f) (pişta destî *back of hand*) (pişta serî *back of head*)
(2) çep (m) (the wrong side of fabric)
backache (*see* have pain)

backwards (1) pişt u ber [for clothing]
(2) kit u kit [for shoes]
bad (people, places) (1) ne xweş
(2) xirab (on the good and bad *li ser baş u xiraba*)
bad (things) (1) ne baş
(2) pîç (Ev gîze pîç e. *This walnut is bad / rotten.*)
(3) xirab (Gunneh xirab e. *Sin is bad.*)
(4) bela (f) (Mirin belaek mezin e. *Death is a big "bad thing."*)
bad luck beş (Reqem sêzde beş e. *The number 13 is bad luck.*)
bag (1) çente (m) [purse, duffle bag, etc.]
(2) turr (f) [saddle bag]
(3) kîsik (m) [plastic or paper grocery / trash bag] (Kîskê kaẍez bide min. *Give me the paper bag.*)
(4) zerif (m) [plastic or paper grocery / trash bag]
(5) 'elaqe (m) (Ar) [plastic or paper grocery / trash bag] (Ev 'elaqe neylon e. *This bag is plastic.*)
(6) tîrik (f) [cloth bag]
(7) telîs (telîsek şekirê *a [50 pound] bag of sugar*)
(8) parzîn (m) [large cloth bag village women use to carry babies, food, etc.]
Baghdad Beẍda
Bahdinani (language) Behdînî (f) (Kurdîa min Behdînî. *My Kurdish is Bahdinani.*)
Bahdinani (people) Behdînî (m/f) (Ez Behdînî me. *I'm a Bahdinani [Kurd].*)
bake (v) kirin di firnê da, bike di firnê da (Min kir difirnê da 30 deqêqa. *I baked it for 30 minutes.*)
bake flat Kurdish bread (v) peḧtin, bipêje (Evro min nan peḧt. *I made bread today.*)
baker (1) nanpêj (m/f)
(2) xebas (Ar) (m/f)
(3) firneçî (Ar) (m/f)
bakery firne
baklava beqlewa
balcony miḧecele (f)
bald esle'
ball (1) tepik (Ar) (f) (Min tepik havêt. *I threw the ball.*)
(2) bul (f) (Min bulekê hey. *I have a ball.*)
balloon pifdank (f) (Ew pifdanke peqî. *The balloon exploded.*)
banana muz (f)
bangs pirrçem (f)
bank (1) mesrref (f)
(2) banq

baptize (v) (1) jar av kirin, jar av ke (Yuḧenna 'Îsa jar av kir. *John baptized Jesus.*)
(2) 'emad kirin, 'emade bike
barbecue (v) biraştin, birêje
barber ḧelaq (m)
barber shop (1) sertiraş xane
(2) dikana ḧelaqî (Ar)
barefoot pê xas (Hana pê xas çû kulanê. *Hana went outside barefoot.*)
bargain (v) (1) dan u standin kirin, dan u standinê bike (Ez dê dan u standinê gel xudanê dikanê kim. *I'll bargain with the shop keeper.*)
(2) bazar kirin, bazarî bike (Min bazar li gel xudanê dikanê kir. Min ev qazane kirrî. *I bargained with the shop keeper; I bought this pot.*)
(3) te'amil kirin, te'amilê bike (Ar) (Ez dê te'amilê li gel xudanê dikanê kim. *I will bargain with the store keeper.*)
bark (used to make baskets) şivik (m)
barley (1) ceh (m)
(2) danqit (f) (Ez dê evroke danqitê çêkim. *I'll make barley today.*)
barn (1) guv (f) (Min deh pezêt di nav guvê da ye. *I have 10 sheep in the barn.*)
(2) kuar (f) (di kuara min da *in my barn*)
barren [idiomatic] (Çû biçîk ne bîn. *They had no children.*)
barren (v) (*see* be barren)
barter (v) bazar kirin, bazarî bike (Min bazar li gel xudanê dikanê kir. Min ev qazane kirrî. *I bartered with the shop keeper; I bought this pot.*)
baseball (1) bêsbal
(2) tepka destî
basement (1) serdav (f) (Ar)
(2) rehreh
basket (1) selik (f) [it keeps its shape] (selka sîkê *store /shopping basket*)
(2) zembîl (f) [it's big and soft and has two handles]
basketball (1) selle
(2) tepka sellê
bath mat (1) berka biçîk
(2) maḧfîrka ber pîa
bathe (v) serê xwe şîştin di banîuê da, serê xwe bişo di banîuê da
bathrobe robe (m)
bathroom (1) serşu (f) [shower room]
(2) edebxane (f) [toilet room]
(3) (*see also* go to the bathroom (v)

bathtub banîo
battery patrî (f)
battle (1) şer (m)
(2) ceng
bay xelîc (f)
be (v) (1) bîn, bibe (Ew dixtur bî. *He was a doctor.*)
(2) hebîn, hebe
be able to (can) (v) şîan, bişê (Ez ne şêm bêm. *I can't come.*)
be accepted (v) (*see* accept (v)
be afraid (v) (1) tirrsan, bitirrse
(2) tirsan, bitirse
be amazed (v) guhişîn, biguhişe (Ez guhişîm. *I was amazed.*)
be angry (v) (*see* sil, turr, 'aciz, *and* 'êciz)
be approved (v) (*see* accept (v)
be barren (v) xirşî bûn, xirşî bibe (Ew dê xirşî bit. *She'll be barren.*)
be bored (v) melel çê bîn, melel çê bibe (Bu min melel çê bî. *It was boring for me. / I was bored.*)
be born (v) Xwedê dan, Xwedê bide (Kengî tu Xwedê daî? *When were you born?*) (Min dîtin wextê biçîkêt pişîka min Xwedê daî. *I watched when my cat's kittens were born.*)
be careful (v) (1) haş xwe hebîn, haş xwe (he)be
(2) hişîara xwe bîn, hişîara xwe be (Leymîn hişîara xwe ne bî u ket. *Leymin wasn't careful and fell down.*)
be confused (v) mişeweş kirin, mişeweş bike
be developed (v) ava bîn, ava bibe (Kurdistan ava bî. *Kurdistan was developed.*)
be disappointed (v) guhişîn u qehirîn, biguhişe u biqehire (Wextê Şirînê şî kirî, ez guhişîm u piçekê qehirîm. *When Şirîn got married I was disappointed.*)
be embarrassed (v) şerim kirin, şerim bike (Ez şerim dikim. *I'm embarrassed / shy.*) (Min şerim kir. *I was embarrassed.*)
be enough (v) (1) li ber … ketin, li ber … bikeve (Ev kitêb li ber min ketin. *These books are enough.*)
(2) têra kirin, têra bike (Pareêt min dê têra kit. *My money will be enough. / I'll have enough money.*)
be established (v) aşkira bîn, aşkira bibe (da her duzek aşkirabît *so that every matter may be established*)
be exiled (v) nefî kirin, nefî bike (Ocalan nefî kirin. *Ocalan was exiled.*)
be faithful (v) qaîm kirin, qaîm bike (Em îmana xwe qaîm dikîn. *We are faithful in/to our beliefs.*)

be frightened (v) (1) tirrsan, bitirrse
(2) tirsan, bitirse
be harvested (hay, grain) (v) dirîtin, bidrîne (Genim dirîtin. *The wheat was harvested.*)
be important (v) (1) ḧewce bîn, ḧewce be (Em ḧewce bîn me mêze kirî. *It was important that we bought a table.*)
(2) kêr hatin, kêr bê (were) (Mekteb bu te pitir kêr hatî ji tu li pêş televizîunê ve bî. *School was more important for you than being in front of the TV.*) (Mekteb bu te pitir dêr dê êt … *School will be more important for you …*) (Clinton pitir kêr we têt ji cîrana. *Clinton is more important than the neighbors.*) (Ez ne gelek ji te kêr hatîtir im. *I'm not more important than you are.*)
be patient (v) bêhina xwe fireh kirin, bêhina xwe fireh bike (Bêhina xwi li min fireh ke. *Be patient with me.*)
be proud (v) xwe mezin kirin, xwe mezin bike (Şengê xwe mezin dikit. *Seng is proud.*)
be quiet (v) rîniştin xwarê, rîne xwarê
be ready (v) amade kirin, amade bike (Min mekteba xwe amade kir. *I finished school.*)
be sad (v) qehirîn, biqehire (Ez qehirîm. *I was sad.*) (Em gelek qehirîn u 'ecêb maî maîn. *We were very sad and shocked.*)
be seen (v) dîar bîn, dîar be (Tu buçî tu ne dîar bî? *Why didn't you visit?*)
be silent (v) (*see* silent)
be submissive (v) (*see* submit)
be suitable (v) kêr hatin, kêr bê (were) (Cilkêt min kêr tên ez pê biçime şulî. *My clothes are suitable for me to go to work.*)
be surprised (v) guhişîn, biguhişe (Ez guhişîm wextê Faris hat. *I was surprised when Faris came.*)
be taught (v) 'elimandin, bi'elimîne (Ez xwe di'elimînim Kurdî. *I'm teaching myself Kurmanji.*) (Deyka min ez 'elimandim neqşî. *My mother taught me to do cross-stitch.*)
be tired (v) westan, biweste (Ez westam. *I was tired.*)
be united (v) dan êk, bide êk (Bide êk. *Button it; sew it together.*) (Devê xwe bide êk. *Close your mouth [and stop fighting].*)
be useful (v) kêr hatin, kêr bê (were) (Ev çente biçîke kêr naêt. *This small bag isn't useful.*)
be wrong (v) xelet bîn, xelet bibe (Ez xelet bîm. *I was wrong.*)

beach berlêvê avê
beak nikil

beam (of wood) karîte (m)
beans (1) lubî(k) (f) [green]
(2) baqil (f) [large seed]
(3) fasolî (f) [white]
(4) fasolîa qodîka [refried]
bear hirç (m)
beard (1) reh (pl) (Rihêt wî spî bîn. *His beard was / is white.*)
(2) rih
beat (v) (1) derêxistin, derêxe
(2) deynan, deyne (Min deyna Hanaê. *I spanked Hana.*)
(3) qotan, biqote (Min Hana qota. *I spanked Hana.*)
beautiful (1) taze [babies and things]
(2) can [women and things]
beauty mark (1) xal (f)
(2) nîşan (f)
beauty salon (1) salun (Ar) (f)
(2) sertiraş xana jinka
because (1) çinko (Em çûîn dixturî çinko ez ne sax bîm. *We went to the doctor because I was sick.*)
(2) çînkî
(3) çunku
(4) jiber
(5) madem (Şirînahîê ne xwe madem bu te ne baş e. *Don't eat sweets because it's not good for you.*)
because of what jiber çî (Jiber çî tu çûî dixturî? *Why did you go to the doctor?*)
become (v) bîn, bibe (Ez dê bim dixtur. *I'll become a doctor.*)
become soft (for cooked food, pickles) (v) (1) nerim bîn, nerim bibe (heta nerim bitin *until it's soft*)
(2) mirin, bimre
bed (1) text (m) [bed frame] (Te text te divêt an duşek te divêt? *Do you want a bed frame or a mattress?*)
(2) binê textî [bed frame]
(3) cih (m)
bed rest (*see* get bed rest (v)
bedroom (1) mezel (Te çend mezel hene? *How many bedrooms do you have?*)
(2) oda nivistinê
bedspread (1) cudelîa ser textî [thin]
(2) ferişa ser textî [thin]
(3) futka ser textî [medium]
(4) liḧefka ser textî [thick]
(5) çerçef [thin-medium]

bee mêş (f) (mêşa hîngivînî *honeybee*)
beef goştê çêlê
beef rolls (spicey beef rolled up in thin bread and fried) burek
beer bîre (Ew bîre navexwit. *He doesn't drink beer.*)
beet şilindir (f)
before (1) jiberî (Roj jiberî Çiraê rabî. *Roj got up before Çira did.*)
(2) berî
beg (v) (1) xastin, bixaze (Jinik nan xast. *The woman begged for bread.*)
(2) sîal kirin, sîal bike (Jinik nan sîal kir. *The woman begged for bread.*)
(3) [idiomatic] (Ez bextê te me, "Hindek pare bide min!" *I'm in God's hands; "Give me some money!"*)
begin (v) dest pê kirin, dest pê bike (Demê dest bi hijmarê di gel wan kirî … *When he began the settlement with them…*) (Dîmahîkê 'adê dest pê bike bixwe. *Begin to take [the birth control pills] when your period is finished.*)
beginning (1) ewilî (Ewilî Xwedê edir çêkir. *In the beginning God created the earth.*)
(2) pêşî (f) (li pêşîê *in the beginning*)
behave (have good behavior) (v) 'aqil bîn, 'aqil be (Kurrê min, 'aqil be; tu yê mezin bî. *My son, behave, and you'll grow up.*)
behave shamefully (v) 'eyb kirin, 'eyb bike ('Eyb nakî! *You don't have any shame! [a major insult]*)
('Eyb ne ke! *Don't be ashamed / shy.*)
behead (v) jê vekirin, jê veke (Qesabî serê pezî jê vekir. *The butcher beheaded the sheep.*)
behind (1) li pişt (Ew li pişt hevalê xwe rînişt. *He sat behind his friend.*) (Qelem li pişt min e. *The pen is behind me.*)
(2) ji piş ve (Min Şirîn ji piş ve dît. *I saw Şirîn from behind her [in the crowd].*)
beige (1) bêcî (Ar) (m)
(2) teḧînî
Belgium Belcîke
belief (1) bawerî (f)
(2) îman (f) (îmana te *your belief*)
believe (v) (1) bawer kirin, bawer bike (Ez bawerîa 'Îsaî dikim. I *believe in Jesus.*) [idiomatic] (Ez bawer nakim. *I don't think so.* (*see also* say [idiomatic])
(2) bawerî bi … înan, bawerî bi … bîne (Wana bawerî bi Xwedê îna. *They believed in God.*)
(3) bawerî bi … hatin, bawerî bi … bê (were)

believe in (v) jê bawer kirin, jê bawer ke (Ji min bawer ke Şirînê şî kir. *Believe me! Şirîn got married!*)
believer (1) mu'imin (Ez mu'imina 'Îsaî im. *I'm a believer in Jesus.*)
(2) (*see also* believe (v)
bell (1) ceres (f)
(2) çeng(il) (f) (Çenga derê *church bell*)
below li bin (Kitêba min yê li bin mêzê ye. *My book is below the table.*)
belt (1) qaîş (f) (qaîşa lîra *belt of gold coins worn by brides at their wedding*)
(2) qawîş (f)
bench kerrewît (f)
bend over (v) (1) xwe çemandin, xwe biçemîne
(2) xwe tewandin, xwe bitewîne
beneath li bin (Heyvê li bin ewrî ye. *The moon is beneath the cloud.*)
benefit (1) başî
(2) feyde (f)
Berber berber
beside (1) bi rex … ve (Şirîn bi rex min ve rînişt. *Şirîn sat next to me.*)
(2) li def (Şirîn li def min rînişt. *Şirîn sat beside me.*)
best baştirîn (baştirîn cil *best clothes*) (Cilkêt Macy's baştirîn cilik in. *Macy's clothes are the best.*)
bet Sera çi? (*What are we playing / betting for? What will the prize be for the winner of this card game?*)
Bethlehem Beytleȟim
better (1) çêtir (Ew çêtir e. *He's better.*)
(2) baştir (Av baştir e ji Pepsîê. *Water is better than Pepsi.*)
(3) qenc [health] (Qenc bî? *Is she feeling better?*)
between (1) nîva (nîva şeş dular u heşta *between $6 and $8*)
(2) navbeyna (navbeyna se'et şeş u se'et ȟeft *between 6:00 and 7:00*)
(3) di nîva … de (Kitêba di nîva me de ye. *The book is between us.*)
(4) li nîva … da (Darê li nîva her dû xanîa da. *The tree is between the two houses.*)
(4) navbeyna … de (Ez navbeyna Amy u te de me. *I'm (sitting) between you and Amy.*) (Feriq navbeyna biçîka wê u kiça wê yazde heyv e. *There are 11 months [difference] between her baby and her daughter.*)
(5) navbeyna … da (Were navbeyna me da rîne. *Come sit between us.*)

beverages vexwarin
Bible Incîl (m)
bicycle peîsigil (f)
big (1) mezin (Ev xanîe mezin e. *This house is big.*)
(2) gir (Ev nukêt he gir in. *These chick peas are big.*)
(3) buş (Ev ave buş e. *This river is big.*)
(4) zorr (Ev xwarin e zorr e. *This food is big / There's lots of food here.*)
bill (of a bird) nikil
bind (v) girêdan, bigirêde (Her tiştekê hîn bi erdî ve girê didin, dê bi esmanî ve ête girêdan. *Whatever you bind on earth will be bound in heaven.*)
binder (loose-leaf, three-ring) kitêb (f)
biology eȟya (f)
bird (1) teyr (m) [general]
(2) çîçik (m) [small brown]
birth certificate beyana biçîk (Te beyana wê heye? *Do you have her birth certificate?*)
birth control pills (1) ȟabkê mane'
(2) (*see also* preventative)
birthday (1) 'îd mîlad (f) ('Îd mîlada te pîroz bit! *Happy birthday!*) (Kengî 'îd mîlada te ye? *When is your birthday?*)
(2) (Kîşk rojê Xwedê tu daî? *On which day were you born? / When were you born?*)
(3) tewalîd (f) (Tewalîda te çend e? *When is your birthday?*)
(4) mewalîd (f) (Mewalîda te çend e? *When is your birthday?*)
(5) (tarîxa deyk bîna te *your birthday/date*)
(6) (roja deyk bîna te *your birthday/date*)
birthplace cihê tu lê Xwedê daî
biscuit (1) piskêt
(2) piskuêt
bite (1) leq (f)
(2) dijwar [animals] (Pişîka min 'aqil e; ne dijwar e. *My cat is good; he doesn't bite.*) (Şer ȟeywanek gelek dijwar e. *Lions bite animals a lot.*)
(3) dijwar [spicey hot] (Ev filfilkê te gelek dijwar e. *Your pepper has a bite to it / is spicey hot.*)
bite (v) leq deynan, leqa deyne (Pişîka min 'aqil e; leqa nadeynit. *My cat is good; he doesn't bite.*)
bitter (1) teȟil [tea or coffee without sugar, medicine, green fruit]
(2) tax [coffee]

black reş (m)
black magic siḧr (f) (Ew siḧrê çêdikit. *He does [black] magic.*)
black pepper (1) bîber
(2) filfilêt reş (f)
(3) filfilkêt reş (f)
blackberry tîêt reş
blackboard (1) textê reş
(2) sebure (f)
blackhead zîwan (m)
blacksmith asinger (m)
bladder meθane (f)
blamelessly bê gaê
blanket betenî (f)
blasphemous kafir (Hindî kafir in çînku ‘îbadeta senema dikin. *Indians are blasphemous because they worship idols.*)
blasphemy kifir
bleach fast (f)
bleed (v) birrîn, bibirre (Tila min birrî. *My finger bled / is bleeding.*)
bleeding (1) birrî (Tila min birrî. *My finger is bleeding.*)
(2) xwîn jê têt (Tila min xwîn jê têt. *My finger is bleeding.*)
blender (1) mekîna şerbetê
bless (v) (1) pîroz kirin, pîroz bike (Xwedê, ez navê te yê pîroz kim. *God, I bless your name.*)
(2) kerem … kirin, kerem … bike (Xwedê keremê li gel min kirî. *God has blessed me.*)
blessed (1) pîroz
(2) pîruz
(3) [idiomatic] (‘Îda te pîroz bit! *Happy holiday!*) (‘Îd mîlada te pîroz bit! *Happy birthday!*) I
blessing xêr (f)
blind kure (Ew kure ye. *He’s blind.*)
blinds sleyd
blistered pivdank (Kefa destê wî yê bî pivdank ji ber şulî. *The palm of his hand is blistered from work.*)
blizzard befir gelek barî
blond zerr
blood xwîn (f) (feḧsa xwînê *blood test*)
blossom kulîlk (f)
blossom (v) peqîn, bipeqe (Darêt / gulêt me peqîn. *Our trees / flowers blossomed.*)

blouse (1) kumlik (m)
(2) kumlek (m)
(3) qemîs (m) (Ar)
blow (v) pif kirin, pif bike (Pif ke agirî. *Blow out the fire [the candles].*)
blow dryer sişwar (f)
blow your nose (v) kif kirin, kif ke
blue şîn (m) (şînê vekirî *light blue*) (Qemîsê min şîn e. *My shirt is blue.*)
blush buyax̌a rîa
boat (1) belem [small boat]
(2) kelek (f) [small boat]
(3) gemî (f) [big boat]
(4) sefîn (f) (Ar) [big boat] (sefîna Nuḧî *Noah’s boat*)
(5) qaîk (m) [small boat] (Ew biçîte di nav qaîkê da. *He got into the boat.*)
bobby pin sinceq (f)
body (1) leş (m) (Ez leş êş im. *I have pain in my body.*)
(2) gîan (m) (Gîanê min li erdekî çûl u hişik u bê av ẍerîbîa te diket. *my body longs for you,in a dry and weary land where there is no water.*)
bodyguard ḧeres (m)
boil (v) (1) kelandin, bikelîne (Herre avê bikelîne. *Go boil the water.*)
(2) kelandîn, bikele (Avê dikelit. *The water is being boiled.*)
boiled (vegetables) kelandî
boiling (temperature) kelandî (ava kelandî *boiling water*)
bomb qumbere (f) (Sedamî qumberek mezin li Kurdistanê da. *Saddam dropped a big bomb on Kurdistan.*)
bone hestî (m) (Hestîê destê min şikest. *My arm bone broke.*)
book kitêb (f) (in the book of the law *di kitêbêt desturî da*)
bookcase mektebe (f)
bookshelf komedîn (f)
boot pût
border (1) ḧidîd (m) (Ar)
(2) tuxîb (m) (Tuxîbê me u Tirkîe çîa ne. *The Turkey-Iraq border is mountainous.*)
bored (1) behina … teng (Behina min teng e. *I’m bored.*) (Behina te teng bî? *Are you bored*)
(2) betal
(3) melel (Bu te melel çê bî? *Are you bored?*)
bored (v) (*see* be bored)

boring (1) melel (Bu te melel çê bî? *Are you bored? / Is it boring to you?*)
(2) mumil (Ev kitêbe gelek mumil e. *This book is really boring.*)
(3) ne xweş (Ev kitêbe gelek ne xweş e. *This book is really boring.*)
born (*see* be born)
borrow (v) (1) deyn kirin, deyn bike (Nazdar deh dular ji min deyn kir. *Nazdar borrowed ten dollars from me.*) (Min pare ji banqê deyn kir. *Yesterday I borrowed money from the bank.*)
(2) qeriz kirin, qeriz bike (Wî pare ji banqê qeriz kir. *He borrowed money from the bank.*)
(3) (*see also* lend)
borrower deyndar (m/f) (Ez deyndar im. *I'm a borrower.*)
bossy zorr
both her dû (Her dû hatin def min. *They both came to my house.*)
bottle (1) betil (m)
(2) betle
bottom (1) bin (m) (binê pê *sole of the foot*) (binê pêlavê *shoe sole*) (binê textî *bed frame*)
(2) (Ji xwarê heta selal bixwîne. *Read from the bottom up.*)
boundary (1) ḧidîd (m) (Ar)
(2) tuxîb (m) (Tuxîbê me u Tirkîe çîa ne. *The Turkey-Iraq border is mountainous.*)
bow low in Muslim prayers (v) sicid kirin, sicid bike
bow tie (1) bîmbaẍ (f)
(2) buîmbaẍ (f)
bowl (1) tirar (m) [drinking] (tirarê mezin *large drinking bowl*)
(2) legen (f) [mixing]
box (1) kartun
(2) sinduq (f) (Min mektubê xwe havête sinduqa berîdê. *I put a letter in the mailbox.*)
box spring duşeka req
boxer shorts derpê
boy (1) kurr (m)
(2) kurrik (m)
bra (1) zexme (m)
(2) êlek (m)
bracelet (1) bazînk (m) (Te çend bazînk hene? *How many bracelets do you have?*)
(2) miferedat [gold bangles]
braid kezîk
braid (v) kirin kezî, bike kezî (Ez dişem bikim kezî. *I can braid.*) (Dihî min pirrça xwe kir kezî. *Yesterday I braided my hair.*)

brain mejî (m)
brain wave test textîta demaẍî
brake (f) stup
brake (v) stup girtin, stupê bigire (Min stup girt. *I pushed on the car brake until I stopped. / I braked. / "I stopped."*)
branch (1) çiqil (m) (çiqilê darê *the branch of the tree*)
(2) tay (di nav tayêt wê *in its branches*)
brave bi cir'et
bread (1) nan (m) [flat Kurdish bread; general term] (nanê sêlê *huge dry, round bread*) (nanê tenîrê *small round, ¼" thick bread*) (Nanî belave ke li ser hejara. *Give the bread to the poor.*)
(2) semun (f) [raised round or oval, 1" thick Kurdish bread] (semuna firnê *raised bread cooked in the oven*)
break (1) wextê bêhinvekirna me *our time to relax* (deh deqîqe dî wextê bêhin vekirna me ye. *Our break is ten minutes long.*)
(2) wextê betalîa me *our time of not working*
(3) wextê reḧetîa me *our time of rest*
(4) 'etle (f) [recess e.g., from school]
break (v) (1) şikandin, bişkêne (Kiça min sênîk şikand. *My daughter broke the plate.*)
(2) şikestin, bişkê (Sênîk şikest. *The plate broke / was broken.*) (Destê wî şikest. *His arm broke.*)
(3) peqanin, peqîne (Hêkê peqîne. *Break the egg.*)
break even (v) ser bi ser dan, ser bi ser bide (Min kitêbêt xwe ser bi ser dan. *I broke even (when I sold) my books.*)
breakfast têşt (f)
breast (1) memik (m) (Ha memkê min bixwe. *"Eat my breast." = Come nurse. [said by a mother to her baby]*)
(2) çiçik (m)
breath (1) bêhin (f)
(2) nefes (f)
breathe in (v) (1) bêhina xwe kêşan, bêhina xwe bikêşe (Min bêhina xwe kêşa. *I breathed in.*)
(2) nefes kêşan, nefesê bikêşe (Min nefesa xwe kêşa. *I breathed in.*)
brick ḧelan (m) (Xanîê min ji ḧelanî ye. *My house is made of bricks.*)
bricklayer (Ew biluka çêdikit. *He lays bricks / cement blocks.*)
bride bîk (f)
bridegroom zava (m)
bridegroom's wedding clothes which are wrapped up in a square cloth bixçik (f) (Mala zavaî sê çar bixçika yêt reng u reng dê kinit navda. *The groom's family will put three or four sets of colorful clothes in it [the cloth].*)

bridge pir (f) (pira delal *the beautiful bridge [also the name of a famous bridge in Zakho, Iraq]*)
briefs derpê cukî
bright runahî (Dinya runahî ye u tav e. *The weather is bright and sunny.*)
brighten (v) runahî kirin, runahî bike (Te runahî kir mala me. *You brightened our house [with your presence].*)
bring (v) (1) înan, bîne [said if the desired object is at a distance (Ez bu te avê bînim? *Shall I bring you some water?*)
(2) guhastin, biguhêze [for bringing brides to the wedding] (Em dê bîka xwe guhêzîn. *We'll bring our bride.*)
(3) (*see also* give)
broadcast (program) îza'ê (f)
broccoli qerrnabîrt (f)
broil (v) serê firnê hilkirin, serê firnê hilke
broken şikestî (Milê xesîa Dilnazê yê şikestî. *Dilnaz' mother-in-law's shoulder is broken.*)
broken hearted dil şikestî (Mala mamê min dil şikestî ne çinko kurrê wan yê hatî kuştinê. *My uncle's family is broken hearted because their son was killed.*)
broom (1) cerrîfik (m) (cerrîfkê kehrebê *vacuum cleaner*) (cerrîfkê zihakirnê *mop*) (cerrîfkê edebxanê *toilet brush*)
(2) gêsik (f) [villagers say this]
broth afik (f) (afka goştî *meat broth*)
brother bira (m)
brother-in-law (1) tî (m) [brother of my husband]
(2) mêrê xoşk [husband of my sister]
(3) hevlîng (m) [husband of my wife's sister]
brown qehweî (m)
brown (light) (1) 'eslî [eyes]
(2) kistinaî [hair]
bruised reş u şîn (Pê wî reş u şîn bî. *His leg is black and blue / bruised.*)
brush (1) firçe
(2) şeh (m)
brush hair (v) şeh kirin, şeh ke
brush teeth (v) (1) didanêt xwe paqij kirin, didanêt xwe paqij ke
(2) firçe kirin, firçe ke
bucket (1) menceluk (f) [small]
(2) sitil (f) [large]
buckle (v) girêdan, bigirêde (Min qaîşa sendelêt xwe girêda. I *buckled my sandals.)*

bud (v) bîn biskuşk, bibe biskuşk (Gulêt me bîne biskuşk. *My flowers budded.*)
bud [flower] kulîlk (f)
build (v) (1) çêkirin, çêke
(2) ava kirin, ava bike [buildings] (Me xanîa xwe ava kir. *We built our house.*)
building [tall] 'îmaret (Mekteba me li şiqa 'îmaret Ḧefkar. *Our office is the apartment building called Hafkar.*)
build up (v) (*see* be built up)
bulb (of a plant) (1) pîvaz (f)
(2) basal (f) (Ar)
bulgar (cracked wheat) (1) girar (f) (2) savar (m)
bull ga (m)
bullet fîşek (f) (Min fîşek kirne di debanca xwe da. *I put the bullet in my pistol.*)
bulletin board lewḧa i'lana
bunch (1) destik (m/f) [of flowers]
(2) îşî (m) [of grapes]
(3) gurz [of flowers; large]
bundle (1) bar (m) [large]
(2) bermil (m) [small]
bunk bed text ser êk u dû
bunny [baby rabbit] têşik (m/f) (têşkê mirîşkê *(m) baby bunny*)
burden bar (m) (Barê min giran bî. *I was burdened. / My burden was heavy.*)
bureau komedîn (f)
burn (v) sotin, bisoje (Cerimê min sot. *My skin got burned.*) (Gilopa min sutî ye. *My light's burned out.*)
burner çavik (m/f) (çavkê tebaxê *stove burner*) (Çavka tebaxê pîç bî. *The stove burner was damaged.*)
burp îsik
burp (v) îsik kirin, îsikê bike
bury (v) veşartin, veşêre (Wan mirî veşartin nav axê da. *They buried the dead person in the dirt.*) (Wî parêt xwe veşartin nav axê da. *He buried his money in the dirt.*)
bus (1) pas (f) [general] (Ez çûm bi pasê. *I went by bus.*) (sayiqê pasê *bus driver*) (qita pasê *bus stop*)
(2) kuster (f) [inter-city]
bus driver sayiqê pasê
busboy (in a restaurant) (1) şagird (m) (2) feraş (Ar)
bush (1) teraş (m) (Teraş yê li ber derrgehê me kesike e. *The bush in front of my door is green.*)
(2) as (Durman durî ḧedîqa xwe ya malê me as çandin. *There are bushes planted around our garden.*)

business (1) şul (m)

(2) kar (m)

business man tacir

busy (1) bi şul (Ez bi şul im. *I'm busy.*)

(2) mijîl (Telefon mijîl e. *The phone's busy.*)

(3) izdîḧem (Ewa li şari'ê izdîḧem e. *It's on a busy street.*) (Izdîḧema qayim bî. *It was full of people.*)

(4) betal [idiomatic] (Ez betal im. *I'm not busy.*)

but bes (bes ji rexek dî ve *but on the other hand*)

butcher qesab (m) (Qesabî serê pezî jê vekir. *The butcher beheaded the sheep.*)

butter nîvişk (m)

butter (v) nîvişk lê dan, nîvişkî lê bide (Nîvişkî gelekê li binê qazanê bide. *Butter the bottom of the pan well.*)

butterfly pelpelîtang (f)

buttocks qun

button (1) qopçe (f) [on clothes] (Qopça xwe veke. *Undo [open] your buttons.*)

(2) dugim (f) [mechanical] (Dugimê bidewsîne. *Push the button.*)

button (v) dan êk, bide êk (Bide êk. *Button it; sew it together.*)

buy (v) kirrîn, bikirre (Min erzaq kirrî. *I bought food.*)

by (means of) bi (bi teyarê *by airplane*) (Şirînê bi xurtî xwarin da min. *Şirîn by means of force gave me food = forced me to eat.*)

by oneself cida (Ez cida bîm. *I was by myself.*)

C

cabbage kelemî (f)

cabinet (*see* cupboard)

cactus hêjîra bîladî (f)

Caesar Augustus Uẍistus Qeyserî

cage qefesk (f) (Mi ji qefeskê teyr ber da. *I set the birds free from the cage.*)

Cain Qabîl

cake kêk (f) (kêka ḧazir *cake mix*)

calculate (v) ḧasîba xwe kirin, ḧasîba xwe bike (Min ḧasîba xwe kir li ser ḧasîbê. *I calculated (it) on the calculator.*)

calculator ḧasîbe (f) (Parêt min hijmêre ser ḧasîbê. *Count my money on the calculator.*)

calendar (1) rizname (f)

(2) teqwîm (f)

calf (1) gulkê dermala [fattened]

(2) binçuk (m) [of the leg]

call (v) (1) gazî kirin, gazî bike [someone's name] (Gazî deyka xwe ke. *Call your mother.*)

(2) telefon kirin, telefon bike [on the phone] (Telefona xoşka xwe bike. *Call your sister.*)

(3) bang dan, bang bide (Melaî bangê nîvro da. *The imam called out the afternoon prayer.*)

calloused req

calm reḧet

camel ḧêştir

camera kamîr (f) (Kamîra min berza bî. *My camera is lost. / I lost my camera.*) (Min li kamîrê gerra. *I looked for my camera.*)

cameraman kamêra

camp kemp (f) (Em çûîn kempê di Silopîa. *We went to the Silopi refugee camp.*) (Emê çîn kempê. *We're going to the (refugee) camp.*)

can qodîk (f)

can (v) (*see* be able to / can)

can opener (1) kilîla qodîka

(2) mekîna qodîk vekirnê

cancer (1) penceşêr

(2) seretan (Wî seretanê hey. *He has cancer.*) (Seretana hestîê hey. *He has bone cancer.*)

candle şemalk (f) (Min şemalk hilkirin jiber cejina Newrozê. *I lit some candles for the Newroz holiday.*)

candlestick şem'edan (m)

candy (1) şekirk (f) [unwrapped]

(2) çiklêt (f) [wrapped; bars]

cane gupal (m)

cantaloupe gindur (m)

canyon kendal

cap kulav (m)

capable (1) zîrek u çespan

(2) çelek u çespan (Leqman gelek çelek u çespan e bu şule xwe. *Leqman is very capable for doing his work.*)

(3) zîrek

capital (1) peytext (m) [e.g., Hewlêr]

(2)'asîme (f) (Ar) (Baẍda 'asîma 'Îraqê ye. *Baghdad is the capital of Iraq.*)

captain qaîd

car (1) timbêl (f)

(2) seyare (f) (Ar) (seyara min *my car*) (ma'rez ya seyare *car dealership*)

card (1) kaẍez (f)
(2) karte (f)
card game (Kurdish) (1) terqê (2) kukan
cardamon hêl (f) (Hêlê bike di nav çayê da. *Put cardamon in the tea.*)
(Min çayek bi hêl vexwar. *I drank tea flavored with cardamon.*)
cardigan sweater çakêt (m)
cardstock (thick paper) miqawe (f)
care (v) (*see* take care)
careful (v) (*see* be careful)
carefully taze (Taze bi rê ve herre. *Walk carefully.*)
cargo bar (m)
carpenter necar (Ar) (m)
carpet (1) berik (f) [wall to wall; pieces; area rugs; mat]
(Pê xwe dîf berka xwe drêj (bi)ke. *Stretch your legs out according to the size of your carpet. "Make do with what you have."*)
(2) (*see also* rug)
carpool (v) gel êk çûn, gel êk bice (herre) (Ez u tu li gel êk biçîn şulî. *Let's you and me carpool to work.*)
carport terim (f) (Ar) (Ezê li bin termê rînim. *I'm sitting under the carport.*)
carrot gêzer (f)
cart 'erabane (f)
carton qudîk
cartoon kartun
cash pareêt kaş
cashew gezu
cashier (1) kaşîr
(2) jinka ḧisêbê
(3) mêrkê ḧisêbê
cassette tape şelît (f)
cassette tape player misecil
cast (v) (*see* put a cast on a broken bone (v)
cast [for a broken bone] cipis (Cipis giran e. *The cast is heavy.*)
cast out (v) derêxistin, derxîne (Bi navê te me cin derêxistin. *We cast out demons in your name.*)
castle qesir (f)
cat (1) pişîk (f) (2) kitik (f)
catch (v) (1) xwe tê werkirin, xwe tê werke (Pişîkê xwe di teyrî werkir. *The cat caught the bird.*)
(2) girtin, bigire (Min dû masî girtin. *I caught two fish.*) (Min tepik (ve) girt. *I caught the ball.*) (Vê tepkê bigire. *Catch this ball.*)
category babet (f)

cattle çêl
cauliflower qerrnabîrt (f)
caution (*see* risk *and* warning)
cave şikeft (f)
ceiling (1) seqif (m) (Ar)
(2) kaşhank (f) (Kaşhanka me dilupa dikit. *Our ceiling is leaking.*)
celebrate (v) (1) keyf kirin, keyfê bike (Me keyf kir. *We celebrated.*)
(2) dawet kirin, dawetê bike
(3) me'tîfal kirin, me'tîfal bike
celery kerefis (f)
cement block bilûk
cement plaster lebix (f)
cemetary zîaret (m) (Piştî nivêja 'îdê ew diçin zîareta. *After the holiday prayers they go to the cemetaries.*)
census serjimêr (f)
cent sent (f)
centimeter santîmetir (f)
ceremonious walk around the *ke'be* in Mecca tewaf (f) (Em çûîn tewafa ḧecê. *We went on the pilgrim walk.*)
certainly (1) ekîd (Ar) (Ez ekîd evro dê fravînê xwim. *I will certainly each lunch today.*)
(2) temam
(3) rastî (Rastî ez dê evroke fravînê xwim. *I will certainly eat lunch today.*)
certificate (1) pêtivîe bawernamek [divorce]
(2) wereqê sitizen [naturalization]
chain (1) zincîr (f)
(2) ristik (f)
chair kursîk (f)
chalk tebeşîr (f)
chalkboard texta reş
chance bext (f) (Min bext nîne. *I don't have a chance.*)
change (coin money) (1) parêt hîr
(2) hîrde
change (money) (v) serif kirim, serif bike (Ez dê çim sîka para da ez pareêt xwe serif kim. *I'm going to go to the money changer's shop to change my money.*)
change (v) (1) bedil kirin, bedil (bi)ke (Ar) (Ezê xwe bedil dikim. *I'm changing clothes.*) (Dengê wî bedil dibit. *His voice is changing.*)
(2) guhurrîn, biguhurre (Ezê çim pêlava xwe guhurrim. *I'll go change my shoes.*)
(3) guharrtin, biguhurre (Min destikêt derrgehî guharrtin. I *changed*

the handles of the [refrigerator] door.)
(4) xwe lêk dan, xwe lêk bide [change of clothes in preparation for going out] (Ezê xwe lêk dim. *I'm changing / getting ready.*)

change colors (trees) (v) zer bîn, zer bibe (Belgêt dara zer bîn. *The leaves changed colors [at fall time].*)

channel (TV) qenat (m) (Herre qenatî biguhurre. *Go change the channel.*)

chapter pişik (f) (pişka bîst u dûê *chapter 22*)

chauffer şufer (m)

cheap erzan

cheat (v) ḧîle kirin, ḧîle bike (Dilnazê ḧîle li min kir wextê em çûîne sîkê. *Dilnaz cheated me when we went to the market.*)

cheater ḧîleker

check çek (f) (Şirînê bu min çekek nivîsî bi sed dulara. *Şirîn wrote me a check for $100.*)

check (v) feḧs kirin, feḧs bike

checkers (the game) damanê

check point mefireze (f) (Li mefirezê mirov teftîşt dikin. *At the check point the people (cards) are inspected.*)

cheek rî (m)

cheerful beşûş

cheese penîr (m) (sîrik u penîr *cheese and greens*) (Penîr dê ḧelit bite zerviçk. *The cheese will melt and become zerviçk [melted cheese].*)

chef (1) şef
(2) (Ew xwarinê çêdikit. *He makes food.*)

chemistry kîmîa (f)

cherry gêlaz (f)

chest (1) sîng (m) [human] (Singê wê kul e. *She has pneumonia.*)
(2) komedîn (f) [of drawers]

chestnut şebelut

chew (v) (1) mêjan, bimêje (Van ḧabka bimêje. *Chew these tablets.*)
(2)'elik cîtin, 'elkî bicî (Ar) (Sîarî 'elik cît. *Sîar chewed gum.*)
(3) benîşt cîtin, benîştî bicî (Dihî Hanaê benîşt cît. *Hana chewed gum yesterday.*) (Pez benîştê xwe yêt cî. *The sheep chewed their cud.*)

chick (1) çîçeluk (m/f)
(2) têşik (m/f) (têşkê mirîşkê *(m) baby chicken / bird*)

chick peas nuk (f)

chicken mirîşk (f)

chicken manure zilq (f)

chicken pox mêrhiçk (Eve mêrhiçk in. *These are chicken pox.*)

chief of a tribe (agha; feudal landowner) aẍa (Pale bu aẍaî şul dikin. *Peasants work for the chief.*)

child (1) biçîk (m)
(2) zarûk (m) [villagers say this]
(3) zarok (m)

childcare dayîn (Dayînek kiça me xudan dikit. *The childcare took care of my daughter.*)

childhood biçîkatî (f) (Biçîkatîa min xweş bî. *My childhood was wonderful.*)

chili pepper bîbera sorr

chills tasarr (Tasarr yê li min e. *I have chills.*)

chimney bixêrî (f)

(3) lêk dan, lêk bide (Tu çawa pare lêk didî? *How do you invest [your] money?*)
(4) bi xwe dan şulî, bi xwe bide şulî (Min bi xwe dan şulî. *I invested [the money].*)
invitation (1) 'ezîmet (f) (Me 'ezîmetê hey bu Amyê. *We invited Amy [for a party].*)
(2) kartê de'wê (kartê de'wa dawetê *wedding invitation*)

(3) mi'ezum (Şirîn nik me mi'ezum e. *Sirîn is invited to come [to our house].*)
invite (v) (1) mêhvan kirin, mêhvan bike (Ez kirim mêhvan. *I was invited.*) (Min mêhvan kir. *I invited [her].*) (Ez mêhvan kirim ser xwarinê. *I was invited for dinner.*)
(2) mi'ezum kirin, mi'ezum bike (Ar) (Ez mi'ezum kirim. *I was invited.*) (Tu dişêî Fatimaê mi'ezum bikî? *Can you invite Fatima?*)
inwardly ji nav da
Iran Îran (f)
Iranian (person) Îranî
Iraq Îraq (f)
Iraqi (person) Îraqî
Iraqi money (1) dînar (f) (Te çend dînarêt heyn? *How many dinars to you have?*)
(2) filis (f)
iron îte (f)
iron (v) îte kirin, îte bike (Min îte kir. *I ironed it.*)
ironed îtekirî
ironing room oda kewîê
Isaiah Es'îa
Islam Îslam (f)
island cezîre (f) (cezîrê Guam(ê) *the island of Guam*)
isolated veder (Xanîê min cihekî veder e. *My house is in an isolated place.*)
Israel Îsraîl
it (*see* he *and* she)
itch (v) xurîn, bixwire (Dixwirit. *It itches.*)
[izafe (feminine)] ya (Ya min e! *That's mine!*)
[izafe (masculine)] yê (Yê min e! *That's mine!*)
[izafe (plural)] yêt (Yêt min in! *Those are mine!*)

j

jack (playing card) kurrik
jackal (1) torî (m)
(2) wawî (Ar) (m)
jacket qemsele (m) (Qemselê xwe bike ber xwe. *Put your jacket on.*)
Jacob (1) Ye'qub
(2) Ya'qûb

jailer (1) derrgehvanê ḧepsîa
(2) celadê ḧepsîa
(3) xudanê qamçîa
jam mirebe (f) (Min mireba mişmije çêkirî. *I made apricot jam.*)
janitor feraş (m)
January (1) Kanîna dûê
(2) heyva êk (f)
Japan Yaban (f)
jar (1) cerr (f)
(2) cerrik (f)
(3) gusik (f)
(4) şîşe
jaw leẍavuk (m)
jealous (1) ḧesîdî (Tu çend ḧesîd î! *You're very jealous!*) (Muhammed ḧesîdîê bi hevalê xwe dibit. *Muhammed is envious of his friend [because he's rich].*)
(2) ẍîre (Şerzad ẍîrê hey ser jina xwe. *Şerzad is jealous for his wife [he doesn't want any man to talk to her].*)
jealousy (1) ḧesîdî (f)
jeans (1) cînz
(2) penterrunê kewboy
Jehovah's Witness Şihud Yehwe (Bawerîa min fereq e li gel bawerîa Şihud Yehwe. *My faith is different from the faith of Jehovah's Witnesses.*)
Jerusalem Urşelîm
Jesus 'Îsa
Jew (1) Cihî (m/f) ('Îsa Cihî bî. *Jesus was a Jew.*)
(2) Yehudî (m/f) (Ar)
jewelry (gold) zêrr (m) (Wextê min şî kir, bu min zêrr gelek înan. *When I got married [my husband] brought me a lot of [gold] jewelry.*)

job xizmet (Xizmetekê bu min bike, Hana. *Do [a job / something / a chore] for me, Hana.*)
job (professional) (1) şul (m) (Şulê te çi ye? Tu çi dikî? *What is your job? What do you do?*)
(2) wezîfe (m) (Ar)
(3) kar (m)
John (1) Yuḧenne (Yuḧenna 'Îsa jar av kir. *John baptized Jesus.*)
(2) Yeḧîa
(3) Yehîe
(4) Yuḧana
join the army (v) bîn esker, bibe esker

joke (1) yarî (f) (Yarîek keyf bu min bêje. *Tell me a funny joke.*)
(2) nukte (f) (Ar) (Nuktekê kenî bu min bêje. *Tell me a funny joke.*)
joking (1) ji qesta (Emê ji qesta bêjîne Adarê: emê çîn Giant. *Let's jokingly tell Adar we're going to Giant.*)
(2) ji qestî (Min ji qestî gote te. *I was joking when I told you that.*)
Jonah (1) Yunis (Ar)
(2) Înis
Joppa Yafa (f)
Joseph Yusiv
journalist siḧefî (m/f) (Siḧefî gelek zeḧf bîn li Kurdistanê. *There were a lot of journalists in Kurdistan.*)
journey rêk (f) (Rêka me drêj e. *Our journey takes a long time.*) (rêka drêj *the long journey*) (rêka dîr *the far journey*)
joyfully bi keyf u xweşî (Ez u tu bi keyf u xweşî çûîne seyranê. *You and I went joyfully to the picnic.*)
Judea Yehudî (f)
judge (1) ḧakim (m)
(2) dadwer (m)
judge (v) dad kirin, dad bike (Xelkî dad ne ken da hîn ne êne dad kirin. *Don't judge or you too will be judged.*
judgment sizadan (f) (Ew hate sizadan kirinê bi destê Tirka. *They were given judgment by the Turks.*)
jug (1) cerr (m) [large] (Cerrê min yê şikestî. *My jug is broken.*)
(2) cerrik (m) [medium] (Min bu xwe cerrik kirî. *I bought a jug for myself.*)
(3) gusik (f) [small] (Min gusik bire ser banî da bitezit. *I brought a jug [of water] up on the roof so that it would get cold.*) (Gusik nî ye, av tezî ye. *A new jug, nice cold water.*)
juice (1) şerbet (f)
(2) ava fêqî
July (1) Tîrmeh (f)
(2) heyva ḧeft (f)
jump (v) (1) xwe havêtin, xwe pavê [down, e.g., from a table]
(2) xwe hilavêtin, xwe bihilavêje [up and down]
jumper (1) 'ezî (m)
(2) kiras (m)
jumpsuit perdesun (m)
June (1) Tebax (f)
(2) heyva şeş (f)
junior high school (1) mekteba navincî
(2) mitewasîte (Ar)
junior/senior high school mekteba senawî (sefa 7-12 *grades 7 through 12*)

junk yard kavil (m)
just because (1) hema (Hema ez piçekê çûm sîkê. *I went shopping just because.*)
(2) ji xwe (Ez çûme sîkê … ji xwe. *I went shopping … just because.*)
just right (1) mize [not sweet, not sour] (Enenas mize ye. *The pineapple is just right.*)
(2) hîn [weather that is neither cold nor hot]
justify oneself (v) xwe dîar kirin, xwe dîar bike (Min divêt ez bu te xeletîa xwe dîar kim. *I want to justify [explain] my mistake to you.*)

k

kangaroo kenẍir (m)
kebab kebab (f)
keep (v) (1) hêlan, bihêle (Min mala xwe hêla ez hatim Emrîke. I *left my house when I came to America.*)
(2) hilgirtin, hilgire (Evî qelemî bu min hilgire. *Keep this pen for me.*) (Ewan zerra hilgire. *Leave the gold.*)
keep quiet (v) (*see* silent)
keeper ḧeres (Ar) (m) (Ma xwe ne ez ḧeresê biraê xwe me? *Am I my brother's keeper?*)
kerosene gaz (f)
key kilîl (f) (Kilîla derrgehê min hinda bî. *The key to my door is lost.*) (kilîla timbêla *car key*)
key chain silsîle (f)
kid (1) kar(ik) [baby / young goat]
(2) (*see also* child)
kidnap (v) revandin, birrevîne (Ew kiçke revandin. *The girl was kidnapped. [Someone kidnapped the girl.]*)
kidney (1) gulçîsk (f)
(2) kîla?? (Kîlaêt wî şul nakin. *His kidneys don't function.*)
kill (v) kuştin, bikuje (Ez kuştim! *(He) killed me [because he screamed so much and was disobedient].*) (Wî ew kuşt. *He killed him.*)
kilo kêlû (f) (kêlûekî şekirê / xîara *a kilo of sugar / cucumbers*)
kilometer kêlûmîter
kind (1) babet (f) (Wî li ser gelek babeta bi ẍuna bu wan axift. *He told them many kinds of parables.*) (Min bu Şirînê ser babeta ḧemî Kurdistandê axift. *I told Şirîn all kinds of things about Kurdistan.*)
(2) nîşan (f) (bu nîşan *according to its/their kind*)

(3) texlît (m) (Kîşk texlîtê cilka bikim ber xwe? *Which kind of clothes should I wear?*)
kindness qencî (f) (Şirînê qencî li min kir. Ez birim dixturî. *Sîrîn gave me kindness. She took me to the doctor.*)
king (1) melik (m) (Berê li Îraqê melik bî. *A long time ago there was a king in Iraq.*)
(2) melîk
(3) paşa(î) (m) (Paşaîekîe vîa hijmarê di gel kuîlêt xwi biket. *A king wanted to settle accounts with his servants.*)
(4) şahîp [playing card]
king (in the game of checkers) (v) bî bam
King Herod Hîrudês
kingdom (1) memleket (f) (Ar) (memleketa melikî paşaî *the kingdom of the king*) (2) paşatî (f) (paşatîa esmanî *the kingdom of heaven*)
(3) padişatetî (f)
kiss maç (m) (Maçî ke. *Give [me] a kiss.*)
kitchen metbex (f)
kite teyril hewe
kitten têşik (m/f) (têşkê pişîkê *(m) kitten / baby cat*)
kleenex (1) kilîniks (m)
(2) kilînis (m) (kilînisê desta *Kleenex*)
knead (v) hevîr kirin, hevîrê bike
knee çuk (f)
knife kerik (f)
knit (v) ji sufî çêkirin, ji sufî çêke (Min çakêtek bu Hanaê ji sufî çêkir. *I knit a jacket for Hana.*)
knitting needle (derzî) şîş(ik) (f)
knock (v) qotan, biqote (Derrgehê cîrana biqote. *Knock on the neighbor's door.*)
knot girêk (Girêkekê li sufê xwe çêke. *Make a knot in your yarn.*)
know (v) (1) nas kirin, nas ke [people] (Tu min nas dikî? *Do you know me [who I am]?*)
(2) nîasine, nîase [people] (Tu wê dinîasî? *Do you know her?*)
(3) zanîn, bizane [things] (Ez dizanim. *I know that.*) (Ez nizanim ez çi bêjim. *I don't know what I should say.*) (Çi tiştî nizanit. *He doesn't know anything.*) (Ew dizanit zelamê min ne li vêrê ye. *She knows my husban isn't here.*) (Ew bi xwe nizanit, bes wî ji ne xwe got. *He doesn't know [isn't sure] but he thinks so [e.g., that it is cancer].*)
(4) pêhesan, ?? [intuitive] (Xoşka min pêhesa ez ne sax im. Telefona min kir. *My sister knew I was sick; she phoned me.*)
(5) şehreza (Ez ne gelek şehreza li van rêka. *I don't know this road / way very well.*)

(6) [idiomatic] (Hêş çi tişt dîar ne bî ye. *They still don't know [the result of the medical exam] yet.*)
knuckle girêçk (f)
Koran (1) Quran
(2) Qur'an (f)
kosher ḧelal (Goştê mirîşkê ḧelal e. *Chicken meat is kosher [to eat].*)
Kurd Kurd (m/f)
Kurdish (language) Kurdî (f)
Kurdish flute zirrna
Kurdish men's head covering cemedanî (f)
Kurdish men's outfit (1) şel u şepik (m) [extra nice]
(2) şelwal (m) [everyday outfit]
Kurdish tea spoon kefçikê çayê
Kurdish women's house dress dijdaşe (m)
Kurdish women's party dress (1) kiras u fistan (m) [gathered waist]
(2) kiras u kurtek (m) [no waist marked]
Kurmanji (language) Kurdî (f)
Kuwait Kuwêt (f) (Ew çû di Kuwêtê da. *He went to Kuwait.*)

l

label wereqe (m)
laboratory muxteber (f)
laborer (1) 'amil (m) (Ar)
(2) rêncber (m)
(3) karker (m)
lack kêm (Çi ji min yê kêm e hêşta? *What do I still lack?*) (Çi jê kêm e? *What is lacking from this kotilk?*)
ladder pêstirk (f)
ladle (large) used for cooking for crowds muçik (m)
ladybug (1) xalxaluk
(2) xalxalk
laid back nerim
lake (1) derîya (f) (Mala me li ser derîyaekê ye. *Our house is on a lake.*)
(2) av (f) (Mala me li ser avekê ye. *Our house is on a lake.*)
(3) derîaç (f)
lamb (1) berx (m) [animal]
(2) berxik (m) [animal]
(3) goştê berxê [meat]

lamp (1) çira (f)
(2) lempe (f) (serê lempê *lamp shade*)
land 'edir (m) ('edrê vale *empty lot*)
land (v) deynan, deyne (Teyarê deyna metarî. *The airplane landed at the airport.*)
landlord (1) xudanê milkî (owner of many houses, restaurants, or land)
(2) xudanê melak (owner of many houses, restaurants, or land)
(3) xudanê xanî (owner of one house, i.e., my house)
language (1) ezman (m) (Ezmanê min Kurdî ye. *My language is Kurdish.*) (Ezmanê Kurdî baxive. *Speak Kurdish.*)
(2) ziman (m)
large (1) mezin (Ev xanîe mezin e. *This house is large.*)
(2) zorr (Ev ave zorr e. *This river is large.*)
larger meztir
laryngitis [idiomatic] (Dengê minê ketî. *I have laryngitis.*)
last (1) axir(îka) (Axirîka ez u tu geheştîn êk. *We arrived together last.*)
(2) dîmahîk (f) (Min navê xwe dîmahîka perrî nivîsî. (*I wrote my name on the last page.*)
(3) paşîê (Gelekêt pêşîê dê bine paşîê. *Many who are first will be last.*)
(4) dumahî (f) (Dumahîê dest pê bike. *Begin with the last ones.*)
last month heyva çûî
last name (grandfather's name) (1) leqeb (m) (Leqebê me El 'Îsa ye. *Our last name is El 'Îsa.*)
(2) navê bapîr (m)
last night şevê dî (Şevê dî ez u deyka xwe çûîne mala Dilnazê. *Last night my mother and I went to Dilnaz's house.*)
last week (1) ḧeftîa dî
(2) ḧeftîa çûî
last will and testament wesîet (f) (Min wesîet li deyka xwe kirin. *I told / wrote for my mother my last will and testament.*) (Jiberî babê min bimirit, wesîet kir bî ku çavê deyka min li biçîkêt wê bit. *Before my father died, he left a will which said that my mother would take care of her children.*)
last year (1) sala çûî
(2) par
late (1) dreng (Ez dreng ji xew rabîm.. *I got up late.*) (Ez dreng geheştim dersê. *I arrived late for the lesson.*)
(2) texîr
later (1) dîv da (Ez çûme mala Nîazê. Dîv da ez çûm mala Adarê. *I went to Nîaz's house. Later I went to Adar's house.*)
(2) paşî (Min erzaq ne maî ye. Paşî ezê çim sîkê kirrim. *I don't have any food left. I'll go to the store later and buy some.*)
(3) wextê min hebit (Ezê pare dim te wextê min hebit. *I'll give you the money later / when I have it.*)

(4) wextek dî (Wextek dî ez dê dim te. *I'll give it to you later.*)
(5) ḧeta min hebit (Ezê dim te heta min hebit. *I'll give it to you later / until I have it.*)
laugh (v) kenîn, bikene
laundry (1) balav (f) (Min balavê hey. *I have laundry [to do].*)
(2) (*see also* do laundry)
laundry basket selka cilkêt pîs
laundry detergent taîd (f)
laundry room (mezelka cilik şîştinê
law (1) destur (m) (Desturê vêrê dibêjit: lazim tu biçîka ne qotî. *The law here says you may not beat your child.*)
(2) distur
(3) qanûn (f)
lawyer (1) miḧamî (m) (Ar)
(2) parê zêrr
(3) abuqat (m)
lay down (and doze) (animals) (v) mexel hatin, mexel bê (were) (Çêl mexel hat. *The cow laid down.*)
lay eggs (v) hêk kirin, hêk bike (Mirîşk hêka dikit. *The chicken lays eggs.*)
lay eggs (v) hêk kirin, hêk bike (Mirîşk hêka dikit. *The chicken lays eggs.*)
layer rêz (f) (Min xanîê xwe pênc rêzêt qaẍeza jê vekirin. *I took five layers of wallpaper off my [walls].*) (Çend di rêz in? *How many layers are in it [the cake]?*)
lazy (1) tembel
(2) muhmil (Hevala min muhmil e. *My friend is lazy.*)
(3) bê xîret [not smart]
(4) kislan
leader rêber (m) (Ew zelam rêberek baş e. *That man is a good leader.*)
leaf belg (Belg ji dara dikevin. *The leaves are falling.*)
leafed out (v) kesik bîn, kesik bibe (Dar kesik dibit. *The trees are leafed out / in full leaves.*)
leak (v) dilup kirin, dilupa bike (Kaşhanê banî dilupa dikit. *The roof is leaking.*)
learn (v) (1) 'elimîn, bi'elime (Min divêt ez bi'elimim Kurdî. I *want to learn Kurdish.*)
(2) fêr bîn, fêr bibe (Bi xwe ji min fêr bibin. *Learn from me.*)
(3) fêr kirin, fêr bike (Min xwe fêr kir Kurdî. *I learned Kurdish.*)
learning (1) te'lîm (f) (Ar)
(2) zanîn (f) (Zanîna wê kêm bî. *She only had a little education.*)
(3) fêr (f)

lease (contract for rent) lista xanî
lease holder xudanê malê
leather çerim (m)
leave (v) (1) derketin, derkeve (Ez ji Kurdistanê derketim sala 96. *I left Kurdistan in 1996.*) (Ez evro se'et êk ji mal derketim. *I left the house at 1:00 today.*)
(2) derkeftin, derkeve
(3) çûn, biçe (herre) (Jinik çûn. *The women left.*)
(4) ber dan, ber bide (Alî jina xwe ber da. *Ali left his wife.*)
(5) dan rê, bide rê [for a long journey] (Wan dihî siḧarî dan rê. *They left yesterday morning.*) (Dihî da rê. *He left yesterday.*)
(6) burandin, biburîne [and go elsewhere] (Te dît? Bîk burandin. *Did you see? The bride left [her house and went to the groom's house].*)
(7) qest kirin, qest bike [someone or a specific place] (Jinka qesta medresê kirin. *The women went to the school.*)
(8) jê gerran, jê bigerre [leave alone] (Min ji kiça xwe gerra. *I left my daughter alone.*)
(9) hêlan, bihêle (Min hevala xwe hêla Shopper's. *I left my friend at Shopper's.*) (Bihêle. Paşî çêke. *Leave it; do it later.*)
(10) hêlan, bihêle [allow] (Bihêle her dû pêke ve şîn bibin. *Let them both grow together.*)
(11) hêlan, bihêle (Bu min axiftina xwe ser mekînê bihêle. *Leave me a message on the machine.*)
left çep (Herre qolaça he u bu alê çepê çep de. *Go to the corner here aned turn left.*)
leg (1) ling
(2) pê (m) (Pê min yê çepê gelek diêşit. *My left leg hurts a lot.*)
(Pê xwe dîf berka xwe drêj (bi)ke. *Stretch your legs out according to the size of your carpet. "Make do with what you have."*)
(3) pêpik (m) [furniture leg] (Pêpkê kursîka xwe mişar ke. *Saw your chair leg.*)
legal (1) ḧelal
(2) (Xoşka te bi qeçaẍî hat? Ne, temamî hat. *Did you sister come illegally? No, she came legally.*)
legal paper from the U.S. government hewîe
legend (1) hiravî (m)
(2) ("Mam u Zîn" çîrokekî kevin e ji kelepurê Kurdî. "*Mam u Zîn" is an ancient romantic Kurdish legend in Kurdish history*.)
leggings sitrêc (m)
lemon (1) leymîn (f)
(2) leymun (Ar) (f)
lemon salt leymîn diz (f)

lend (v) dan bi deyn, bi deyn bide (Te deh dular hene? Tu bi deyn bidî min? *Do you have ten dollars? Will you lend it to me?*) (Min deh dular dana Nazdarê bi deyn. *I lent ten dollars to Nazdar.*) (Ka deh dulara bi deyn bide min. *I want to borrow $10.*)
length (1) drêjahî (f)
(2) drêjî (f) (Drêjîa mêza te çend e? *How long is your table?*)
lengthen (v) drêj kirin, drêj bike (Strana xwe drêj bike. *Lengthen your song.*)
lens (eye, camera) 'edese (f) ('Edesa min şikest. *My lens broke.*)
lentils nîsk (f) (Min nîsik çêkir. *I made lentils.*)
less kêm (Televizîun kêm ke. *Turn the TV volume down.*) (Ders hebî bes talib kêm bîn. *We had class, but the students were few in number.*)
lesson ders (f) (Sê cara ħeftîê da ders heye. *The less is three times a week.*)
let (v) hêlan, bihêle (Pişîka min nahêlit ez şul bikim. *My cat won't let me do my work.*)
let go (v) ber dan, ber (bi)de (Min teyrê xwe ber da. *I let my bird go.*)
let loose (v) vekirin, veke (Her tiştekê li ser erdî veken, ew li esmanîe hatî ye vekirin. *Whatever you let loose on earth will be let loosed in heaven.*)
letter (1) mektub (f) [correspondence] (Xiludê bu min mektub virrêkir. *Xilud sent me a letter.*)
(2) name (f) [correspondence] (Ħeqê Leqmanîe namekê bu President Bush virrêkit. *Leqman has a right to send President Bush a letter [about this issue…].*)
(3) ħerif (f) (Ar) [script; alphabet]
(4) pît (f) [script; alphabet] (Çend pît in navê te? *How many letters are in your name?*) (Min pîtêt Inglîzî xwandin. *I read the English letters.*)
lettuce xes (f)
level [story; floor] (1) tebeq (f) (Xanîê te çend tebeq e? *How many levels does your house have?*) (tebeqa sîê third level / floor)
(2) tebeqî (f) (Tu li kîşk tebeqî? *Which level are you on?*)
Levite jilawîa
liar (1) direwker (Ev mirove direwker e. *That person is a liar.*)
(2) drewîn (Mala drewînî sut, kesê bawer ne kir. *The liar's house burned down; no one believed him. "Never cry wolf."*)
liberty (1) azadî (f)
(2) harîet (f) (Ar)
library (1) mektebe (f) (Mektebe girtî bî. *The library was closed.*)
(2) mektebe'am (f)
lice rişk u speh
lid qapaẍk (f)

lie (sin) drew (f) (Drew gunneh in. *Lies are sin.*)
lie down (v) (1) xwe drêj kirin, xwe drêj bike (Min xwe drêj kir. *I laid down.*) (Ezê xwe drêj kim. *I'm lying down.*)
(2) tewil dan, tewil bide (Min li çerwanêt kesik tewil didet. *He makes me lie down in green pastures.*)
life (1) jîan (f) (Heker te "food stamps" ne bit, dê jîana te çawa bit? *If you don't get food stamps, what will your life be like?*)
(2) ħeyat (m) (Ar) (Ħeyatê wan xweş bî. *Their life was wonderful.*)
(3) besî (Ez ħes ji jîana besî dikim. *I like the simple life.*)
(4) kumalgeh (f) [idiomatic] (Ew çûî ye kumalgehê ye. *He graduated from community school, i.e., from the school of hard knocks / life / experience.*)
lift up (v) rakirin, rake ('Elema Emrîke rakirin. *They lifted up the flag.*)
light (1) runahî (f) (Roj runahî ye siħarî. *The day is light in the morning.*)
(2) runak (f)
(3) gilop (f) [bulb or lamp] (Gilopa min sutî ye. *My light's burned out.*)
(4) sivik [weight]
(5) vekirî [for colors] (şînê vekirî *light blue*)
light (v) (1) hil kirin, hil (bi)ke (Vî agirî hil bike. *Light this fire.*)
(2) hel kirin, hel bike
light switch swîç (f)
lightning and thunder birrq u birîsî (f)
light-skinned (1) ħintî (Ar) [light brown] (Ez ħintî me. *I'm light-skinned.*)
(2) spî [white]
like (1) ħecku (Bêje ħecku ez şeş salê me. *Tell me (the story) like I'm six years old.*)
(2) wek (Ew wek xanîê min e. *It's like my house.*)
(3) weku (Weku durîa ne bin. *Don't be like the hypocrites.*)
(4) nêzîkî (Xwarina min nêzîkî ya deyka min? *Is my food like my mom's?*)
(5) [idiomatic] (bi keyfa te ye. *Do as you like.*)
like (v) (1) ħes kirin, ħes ke (Ez ħes jê dikim. *I like it.*)
(2) [idiomatic] (Bi dilê te ye, eve? *Do you like it?*) (Bi dilê te bî? *Did you like it?*) (Ne, bi dilê min nîne. *I don't like it.*) (Ez ħes jê nakim. *I don't like it.*)
like this (1) husa (Husa vexwe. Husa rîne. *Drink like this. Sit like this.*) (Kesma u kadêt xwe her husa çeke. *Always make your cookies like this.*)
(2) wesa (Ez çûme mala Adarê. Her wesa Şirîn gel min hate malê. *I went to Adar's house. Şirîn always came with me [like this – to Adar's house].*)
(3) ştî (Bu min gulekê ştî ve çêke. *Make a flower like this.*)
lilac [color] adarîê vekirî
lime leymîn (leymînêt kesik *green lemon / lime*)

line (1) sef (f) (*see* sira)
(2) sira (Talibêt medresê li sira sekinînin. *The school students waiting in line.*) (Bi sira bisekine. *Stop at the line.*) (Siraekê bigire. *Form a line.*) (Herre siraê da. *Go stand in line.*)
(3) rêz (Biçîka xwe rêz kir. *The children formed a line.*)
(4) xat (f) (Ar) (Li ser xatê binvîse ne li bin xatê. *Write (the letters) on the line, not below the line.*)
(5) xît (f) (*see* xat)
(6) xîç (f) (Xîçekê lê bike. *Draw a line.*)
lion şêr (m) (Şêr şêr çi jin (e) çi mêr e. *The lion is a lion, whether it's a male lion or a female lion. "Men and women are equal."*)
lips lêv (f) (Lêvêt wî şurr in. *He's pouting.*)
lipstick sorrava leyva
listen (v) (1) guhê xwe dan, guhê xwe bide (Guhê xwe bide min! *Listen to me!*) (Hevalê te piş derrgehî guhê xwe da te. *Your friend listened [to your conversation] behind the door.*) (Yê guhê xwe ne dite mezina, dê lê ên şaxêt bizina. *If someone doesn't listen to older people, it's foolish, like fighting with goats.*)
(2) (*see also* hear)
listener guhdar (m)
liter letir (f) (Ar)
literature edeb (f)
little (a little) (1) piçek (Min piçek xwarin xwar. *I ate a little food.*) (Min piçek şerbet heye. *I have a little juice.*)
(2) hindek
(3) kêm (Min kêm xwarin xwar. *I ate just a little food.*)
(4) biçîk
(6) [idiomatic] (piçipiç *little by little*)
live (as on TV) zindî
live (v) jîan, bijî (Ez u Amy pêk ve dijîn. *Amy and I live together.*)
liver (1) keseb
(2) mêlaka reş (f)
livestock ḧeywanêt ne kîvî
living sax
living room (1) hol (f) (Ar) [informal]
(2) cihê rîniştinê [informal]
(3) mezela mêhvana [formal]
(4) kuçka mêhvana [formal]
load (large) bar (m)
loan (1) qeriz (f)
(2) deyn (m)
lobster meqesuk

lock qifil (f) (Qifla wê derrgehî veke. *Open/unlock the lock on that door.*) (Qifla wê bigirre. *Lock it [the lock on it].*)
lock (v) (1) kilîl kirin, kilîl bike
(2) 'asê kirin, 'asê bike
(3) (*see also* lock *above*)
locksmith (Ew destikê derrgeha u kilîla çêdikit. *He does locksmith work.*)
lonely (1) behina … teng (Behina min teng e. *I'm lonely.*)
(2) bi tinê (Ez bi tinê me. *I'm lonely.*)
(3) bê kes
long (clothing, carpet, bread, etc.) drêj (Kirasê min drêj e. *My dress is too long.*)
long (v) [idiomatic] (Çend dilê wî diçûê. *He longed [to do something].*)
long time (1) hêş ka tu (Dê kengî çî Kurdistanê? Hêş, ka tu? *When will you go to Kurdistan? Oh, not for a long, long time!*) (Hêş ka tu ḧeta tu xilas bî. *It was a long time until you finished.*)
(2) gelekê (Ezê gelekê mînim li vêrê. *I'm staying here for a long time.*)
long-suffering bêhin fireh
look at (v) (1) berê xwe dan, berê xwe bide (Berê xwe bide min! *Look at me!*) (Berê xwe bidê! *Look!*)
(2) seḧ kirin, seḧ bike (Seḧ kê! *Look at this!*)
look for (v) lê gerran, lê bigerre (Ezê li Hanaê digerrim. *I'm looking for Hana.*) (Li deyka xwe bigerre! *Look for your mother!*)
loose fireh
Lord Xudan
lose (v) (1) hinda bîn, hinda bibe (Hinda bî. *It's lost.*)
(2) hinda kirin, hinda bike (Hinda ne ke! *Don't lose it!*)
(3) berze kirin, berze bike
loser xosaret (Ew xosaret bî. *He was the loser.*)
loss xosaret (f) (Ez xosaret bîm [bu van kitêba]. *I had a loss [on those books].*) (Xosareta min gelek bî. *My loss was great.*)
lost (1) hinda (Ez hinda bîm. Me nizanî rêkê. *I was lost. I didn't know the way.*)
(2) berze
lotion (body) duhinê leşî
lots (dice) remil (f)
lots of (1) zeḧf (Min xwarin zeḧfê hey. *I have lots of food.*) (Dawet gelek mirov lê zeḧf bî. *There were lots of people at the wedding.*)
(2) gelek (Min gelekêt hene. *I have lots of [them].*)
(3) izdîḧem (Dawet izdîḧem bî! *There were lots of people at the wedding.*)
(4) pitir
loud ḧêl

love diluvan (m) (Çakî u diluvanî li drêjîa jîana min dibine behira min. *Goodness and love will follw me all the days of my life.*)
love (v) ḧes kirin, ḧes bike (Ez ḧes te dikim. *I love you.*)
lover (1) evîndar (m/f) (Dilnaz u Şerzad bi evîndarî şî bi êk u dû kirin. *Dilnaz and Şerzad were sweethearts and got married.*)
(2) dildar (m/f)
low (1) nizim [to the ground]
(2) reḧet [heat] (Agirê wê reḧet bit. *The heat is low.*)
lubricate (v) rûn kirin, rûn bike
luck (1) bexit (f) (Min bexit nîne. *I don't have any luck.*)
(2) nesîb (m) [epsecially in regards to money and a spouse] (Nesîbê min e. *It's my luck.*)
lucky bexit (Tu bext î. *You're lucky.*)
lukewarm (for hot drinks or water) têhin şîr
lump kulik (Nazdar kulikê hey. *Nazdar has a lump [in her breast].*)
lunch fravîn (f)
lung (1) piş (f)
(2) qesebat
lustfully [idiomatic] (bi çavekê xirab *with a destroying eye*)
lymph node nîkaf (m) (Nîkafê ya girtî. *Her lymph node is swollen.*)

m

M.A. degree mesters
ma'am (1) ez benî [said by men to women]
(2) ez xudam [said by women to other women] (Bila ez xudam ezê şulê te hemîa kim. *Certainly, ma'am, I'll do all your work.*)
machine (1) mekîne (f) (Mekînê cab da. *The answering machine "answered" the phone.*)
(mekîna şerbetê *blender*)
(mekîna cilka dirî / mekîna xeyat *sewing machine*)
(mekîna dewî *mixer for making yogurt drink*)
(mekîna goştî *meat grinder*)
(mekîna deramet *food processor*)
(mekîna kêkê *electric mixer*)
(mekîna qodîk vekirnê *can opener*)
(mekîna riha *electric shaver*)
(2) ẍesale (f) (Min ẍesala cilka yê hey. *I have a clothes washing machine.*)
mad (angry) (*see* angry)

mad (insane) (1) dîn
(2) sefî [only a little crazy]
(3) mendehuş
(4) (*see also* angry)
magazine micele (f)
magic siḧr (f) (Ew siḧrê çêdikit. *He does [black] magic.*)
maid xudam (f) (Xudama me navê wê Fatima. *My maid's name is Fatima.*)
mail (1) mektub (m)
(2) berîd (f) (Min berîda xwe vekir u îna malê. *I sent my mail and brought it home.*)
mail (v) (1) hinartin, binhêre
(2) virrêkirin, virrêke
mailbox berîd (f) (Min mektubê xwe havête sinduqa berîdê. *I put a letter in the mailbox.*)
maintenance man karker
majority (1) aẍeleb (m) (Ar) (Mîsil aẍelebê wê Kurd in. *Mosul has a Kurdish majority.*)
(2) eẍeleb (m) (Ar)
(3) behira pitir (Mîsil behira pitir Kurd in. *Mosul has a Kurdish majority.*)
make (v) (1) çêkirin, çêke (Ez çi çêkim? *What shall I make?*)
(2) lênan, bilêne [food] (Xwarinê bilêne. *Make some food.*)
(3) çê bîn, çê bibe (Teḧîn ji kuncîê çê dibit. *Teḧîn is made from sesame seeds.*)
make a line [of people] (v) rêz girtin, rêz bigire (Rêzê bigire. *Make a line [to wait for something].*)
make a mistake (v) xelet bîn, xelet bibe (We ne ke! Tu dê xelet bî! *Don't do that. You'll make a mistake.*)
make a mistake (v) xelet kirin, xelet ke (Min navê te xelet kir. *I made a mistake in saying your name.*)
make an agreement (v) pêk hatin, pêk bê (were) (Yêketî u demukratî pêk hatin. *PUK and PDK came together / made an agreement.*)
make noise (v) dengî kirin, dengî bike (Hana, dengî ne ke da ez binvim. *Hana, don't make noise so that I can sleep.*)
make progress (v) pêş keftin, pêş bikeve (Tu pêş dikevî bi zimanê Kurdî. *You are making progress in the Kurdish language.*)
make ready (v) (1) çê bîn, çê be (Fravîn çê bî? *Is lunch ready?*)
(2) amade kirin, amade bike (Xwe amade bike da em 1:00 biçîn sîkê. *Get yourself ready so that we can go to the market at 1:00.*)
make the bed (v) (1) text şidanin, textî bişidîne
(2) text çêkirin, textî çêke

(3) text girêdan, textî bigirêde
(4) text lêk dan, textî lêk bide
make the sound of a donkey (v) zirran, bizirre (Suzan, ka wek kerî bizirre. *Suzan, make the donkey sound.*) (Ew wek kerî dizirrit. *He sounds like a donkey [because he's complaining and griping so much]. [very informal]*)
make up (after a fight with a friend) (v) (1) pêk hatin, pêk bê (were) (‘Îraq u ‘Îran pêk hatin sala 1988. *Iraq and Iran made up with each other in 1988.*)
(2) siliḧ kirin, silḧê bike (Ar)
makeup mikîac (Min mikîac deyna. *I put makeup on.*)
male (1) nêr (m)
(2) zelam
mammal ḧeywanêt şîrî
man (1) zelam (m)
(2) mêr(ik) (m)
(3) mirov (m/f)
(4) ḧecî [an older, well respected man who has perhaps gone to Mecca]
manager (1) midîr (m) (midîrê da’îrê *office manager*)
(2) midîra (f)
(3) karibedest (m/f)
(4) mamusta (m/f)
mane (of a lion) pirrça şêrî
manger afir (f)
mango mango
manual xerrîte (f)
many (1) gelek (Min gelekêt hene. *I have many [of them].*)
(2) izdîḧem (Dawet izdîḧem bî! *There were many people at the wedding.*)
map xerrîte (f) (Te xerrîta Virginia heye? *Do you have a map of Virginia?*)
marble (stone) (1) mermer
(2) ḧelan (Ar)
March (1) Adar (f)
(2) heyva sê (f)
March 21 holiday (Kurdish independence day) Newroz
margarine rûn (m)
marital unfaithfulness dehmen pîsî (f) (Dehmen pîşî gelek ne baş e. *Marital unfaithfulness.*)
mark (freckle, rash, mole) nîşan (f)
mark (v) nîşan kirin, nîşan bike
mark a box with an X (e.g., on an application) (v) fî kirin, fî ke

marked down (on sale) (v) hatin bîne xwarê, were bîne xwarê (Ez evroke çûme sîkê. Gelek tişt hat bîne xwarê. *I went to the store today. Many things were marked down.*)
marker (pen) qelemê renga
market (open; farmer's; fresh) sîka vekirî
marketplace (1) sîk (f) (Ar)
(2) bazar (m) (Ar)
marriage (1) navbeyn (f) (Navbeyna wan xweş e. *Their marriage is good.*)
(2) jin u mêr (Jin u mêr pêk nakin. *Their marriage is bad.*)
(3) şîkirin (f) (Şîkirna wan baş bî. *Their marriage is good.*)
(4) jinînan (f)
(5) zewac (m) (Ar) (Zewacekî wan (ne) reḧet e. *Their marriage is (not) good.*)
marriage license (1) ‘eqet zewac (Ar)
(2) kaẍezê mehrê
married (1) jin înaî [men] (Jin înaî ye. *He's married.*) (Te jin înaî ye? *Are you married?*)
(2) şî kirî [women] (Tu şî kirî? *Are you married?*) (Ez ne şî kirî me. *I'm not married.*)
married man zelam
married woman jin
marry (v) (1) jin înan, jinê bîne [men] (Ew dê bi xwe jinê înit. *He will get married / He will bring himself a wife.*)
(2) şî kirin, şî bike [women] (Ew dê şî kit. *She'll get married.*)
Mary Meryem
mascara firça mijîlanka
master xudan
mat (1) duşek (f) [foam mattress]
(2) berka biçîk [carpet]
match (clothes, furnishings) (v) jêk hatin, jêk bê (were) (Jêk naên. *(The clothes) don't match.* Jêk tên. *(They) match.*)
matchbox şixate (m)
matchstick zilik (m)
maternity dress kirasê yê bi tişt bînê
mathematics rîazîat (f) (Biraê min bi rîazîata zîrek e. *My brother is smart in math.*)
mattress duşek (f) (duşeka êk mêr e *single bed mattress*) (duşeka dû mêr e *double bed mattress*)
May (1) Xizîran (f)
(2) heyva pênc (f)
may (permission) destîrî heye (Destîrî heye ez pêt xwe drêj kim? *May I stretch out my legs?*)

maybe belkî
me (1) ez [direct] (Te ez dîtim? *Did you see me?*)
(2) min [oblique] (Bide min. *Give it to me.*) (Wê kêk da min. *She gave me the cake.*)
meadow deşt (f)
meal (1) paşîv (f) [midnight or early morning; eaten during Ramadan]
(2) ser u pê [of intestines, brains, stomachs, and lamb or goat forelegs]
(3) (*see also* breakfast, lunch, dinner, snack)
meaning (1) me'n (f) (Me'na 'boy' çi ye? *What is the meaning of 'boy'?*)
(2) ye'nî (Ne ye'nî ne. *No means no.*)
measles sorrik (Ev sorrik in. *These are measles.*)
measure (v) pîvan, bipîve (Qimaşî bipîve. *Measure the cloth.*) (Birincî bipîve u ji nîka çêke. *Measure the rice and make it.*)
meat goşt (m) (afka goştî *meat broth*) (mekîna goştî *meat grinder*)
meat patties (1) kotilk (f) (Kotilk xweş in. *The kotilk are good.*) (Kotilk dew xweş e. *The yogurt kotilk is good.*) (Bu te kotilkê qet kim wekî ya xwe? *Do you want me to cut your kotilk up like mine?*)
(2) kifte (f)
Mecca (city in Saudia Arabia) Mekeh (f) (Muhammed li Mekehê Xwedê daî. *Muhammed was born in Mecca.*)
mechanic fîter (m)
mediator li navbeyna … da (Çîmen li navbeyna me da bî. *Çîmen was our mediator [for the marriage arrangements].*)
medicine (1) derman (m) (Te derman evroke xwarî ye? *Did you take your medicine today?*) (sinduqa dermana *medicine cabinet*)
(2) şerab [liquid]
(3) (*see also* tablet)
Medina (city in Saudia Arabia) Medîn (f) (Muhammed mir li Medînê. *Muhammed died in Medina.*)
medium (1) qaîde [nose, clothes, weight, height]
(2) navincî [nose, clothes, weight, height, cooking pot]
(3) weset (Ar) [nose, clothes, weight, height]
(4) reḧet [heat]
meek (in spirit or soul) (1) reḧ … sivik (Reḧa wê sivik e. *She's meek.*)
(2) derun biçîk
meet (v) dîtin, bibîne (Min ji nî dît. *I just met him / her.*) (Min hevala xwe li sîkê dît. *I met my frient at the market.*)
meeting (1) kombîn (Min kombînekê li New Jersey hey. *I have a meeting in New Jersey.*)
(2) iştîma' (Ar) (f)

melon (cantaloupe, honeydew) gindur (m)
melt (v) ḧelan, biḧele (Befir ḧela. *The snow melted.*) (Penîr dê ḧelit bite zerviçk. *The cheese will melt and become zerviçk.*)
memorize (v) ji ber kirin, ji ber bike (Evê axiftinê ji ber bike. *Memorize this saying.*) (Reqemê telefuna xwe ji ber bike. *Memorize your telephone number.*)
memory bîr (f) (Min ji bîr kir gel te biaxivim. *[From my memory] I forgot to talk to you.*) (Bîne bîra xwe …! *Remember when …!*)
merchant (1) tacir (m)
(2) bazirgan (m)
merciful (1) diluvan
(2) bi reḧim
mercy (1) diluvan (m) (dê diluvanî hête rêka wan *they will be shown mercy*) (Çakî u diluvanî li drêjîa jîana min dibine behira min. *Goodness and love will follw me all the days of my life.*)
(2) reḧim (f)
message (1) axiftin (f) (Bu min axiftina xwe ser mekînê bihêle. *Leave me a message on the machine.*)
(2) cab (f) (Cabê bide min wextê Adar bêt. *Give me a message when Adar comes.*)
(3) bersiv (f) (Ezê bersivekê dime te wextê Naz bêt. *I'll give you a message when Naz comes.*)
Messiah Mesîḧ (m)
messy ne lêkdaî
metal asin
meter metir (f)
microwave oven mîkro
middle name (father's name) navê bab
middle school (1) mekteba navincî
(2) mitewasîte (Ar)
midnight nîva şevê
midwife dapîrk (f)
mile mîl (m)
milk şîr (m) (Min şîrê xwe kir mast. *I made my milk into yogurt.*)
milk (v) şîr duşan, şîrî biduşe (Berivan şîrî duşit. *The milkmaid milks.*)
milk sack guhan (f) (guhanêt pezî *sheep teats*)
milkmaid (girl who milks animals) berîvan (f) (Berivan şîrî duşit. *The milkmaid milks.*)
millimeter milîmetir (f)
mind (1) reî (f) (Min reîa xwe bedil kir. *I changed my mind.*)
(2) hizar (f) (with all your mind *ji ḧemî hizara xwe*)

mine [reflexive pronoun] (Bu te kotilkê qet kim wekî ya xwe? *Do you want me to cut your kotilk up like mine?*)
mini blinds sleyd
minister (political) wezîr (m)
minus (1) kêm [less] (Se'et çar kêm pênc e. *It's 3:55. / It's 4:00 minus 5 minutes.*)
(2) kêm [lacking] ('Emirê wê kêm e bu medresê. *Her age is lacking / She's too young for school.*) (Ava xwarinê kêm e. *The food is lacking in water / The food is dry.*)
minute deqîqe (f) (Deqîqek dî, ezê êm. *Wait a minute; I'm coming.*)
miracle (1) nîşana seyr (Eve nîşana seyr ya dûê bû 'Îsaî kirî piştî derkeftina wî ji Yehudîê. *This was the second miracle that Jesus did after he left Judea.*)
(2) tişta seyr
(3) (*see also* sign)
miracles (v) (*see* do miracles)
mirror (1) 'eyn (f)
(2) qudîk (Min qudîka berê xwe danê. *I looked at myself in the mirror.*)
miscarry (v) biçîk çûn, biçîk biçe (herre) (Biçîk ji ber Rêsanê çû. *Rêsan miscarried her baby.*)
miserable (person) hestî giran (Tu ne hestî giran î; tu hestî sivik î. *You're not miserable; you're wonderful!*)
misplace (v) hinda kirin, hinda bike (Hinda ne ke! *Don't lose it.*)
miss (v) (1) xerîb bîn, xerîb be (Ez ji te xerîb bîm. *I missed you.*)
(2) [idiomatic] (Ez hatim Holende ser xatra te. *I came to Holland to see you / because I miss you / because I like you.*)
missing (1) hinda
(2) berze (Derzîa min berze bî. *My needle was missing.*)
mistake (1) xeletî (f) (Min xeletîek kir. *I made a mistake.*)
(2) qebaḧet (m) (Wê qebaḧetek yêt kirî. *She has made a big mistake (e.g., she got pregnant before marriage.*)
misunderstand (v) xelet tê geheştin, xelet tê bigehe (Ez axiftina te xelet tê geheştim. *I misunderstood your words.*)
mitten dezgurk
mix (v) (1) şilqandin, bişilqîne
(2) têk ve dan, têk ve (bi)de
mixer (electric) (1) mekîna kêkê [electric]
(2) mekîna dewî [for making yogurt drink]
mobile home (1) xanî (m)
(2) kerevan

model (1) mudêla cilka
(2) arî∂e ezîa
modest bi sitar (Min divêt ez bi sitar bim. *I'm modest.*)
mole (on skin) (1) nîşan (f)
(2) xal (f) (Te xal heye? *Do you have a mole?*)
Monday duşemb (f) (Ez dê duşembê êm mala te. *I'll come to your house on Monday.*)
money (1) pare (f) (Te gelek pare hene? *Do you have a lot of money?*) (Min pareêt heyn. Te çi divêt ez bu te bikirim? *I have some money. What do you want me to buy for you?*)
(2) 'omle (Ar) (f)
(3) nexit (m) (Hîn dê şulêt kiçê pêk înin ji nextî. *You will fulfill the girl's desires for money.*)
money changer's shop (1) sîka para (Ez dê çim sîka para da ez pareêt xwe serif kim. *I'm going to go to the money changer's shop to exchange my money.*)
(2) dikana sarafî
(3) dikana 'omlê
monkey meymînk (f)
month heyv (f) (Heyva ḧeft ez Xwedê dam. *I was born in the seventh month [July].*)
moon heyv (f) (heyva dû sê rojêt main *crescent moon*) (heyva temam *full moon*) (heyv nî *new moon*) (nîva heyvê *quarter moon*) (Heyva me ye li çardê ye. *Our moon is full.*)
mop cerrîfkê zihakirnê
mop (v) cerrîfkê paqij kirin, cerrîfkê paqij bike
moral exlaq (m) (Ev miruve bi exlaq e. *This person is moral.*)
more (1) pitir (Tu pitir Inglîzî ji xoşka xwe dizanî. *You know more English than your sister.*)
(2) hêş (Hêş bixwe. *Eat some more.*) (Ka hêş bide min. *Give me some more.*)
morning (1) siḧar (f) (Siḧarî bi xêr! *Good morning!*)
(2) spêde (f) (Ez spêdê rabîm ji xew. *I woke up in the morning.*)
Morocco Meẍreb
mortgage deynê xanî
Moses Musa
mosque (1) cami' (f) [big] (Ew çû xwe diba Înîê cami' mezin. *He went himself to the big mosque on Friday.*)
(2) mizgeft (f) [small] (Leqman çû mizgeftê. *Leqman went to the mosque.*)
mosquito pêşî
most of (it) behira pitir (Behira pitir tu tê digehî. *You understand most (¾) of it.*)
moth xêrik

mother (1) deyk (f) (Deyka min gelek ḧes ji te dikit. *My mother really likes you.*)
(2) dayk (f)
(3) oda ["mom"]
(4) daê [informal]
Mother's Day 'îd li um
mother-in-law xesî (f) (Xesîa xwe bîne mala me. *Bring your mother-in-law to our house.*) (Milê xesîa Dilnazê yê şikestî. *Dilnaz' mother-in-law's shoulder is broken.*)
motivated bi mereq (Ez bê mereq im. *I'm not motivated.*)
motive mereq (f) (Mereqa min ez biçim Zaxo. *My motive is to go to Zakho.*)
motorcycle matûrsigil (f) (Bilind li ser matursigilê sîar bî. *Bilind rode the motorcycle.*)
mountain çîa (m) (Çîaêt Kurdistanê gelek xweş in. *The mountains of Kurdistan are beautiful.*) (Ez çîa, tu çîa, golik ma bê gîa. *I'm a mountain, you're a mountain, the calf goes without grass. "If I'm mad and you're mad, the poor calf won't have any grass to eat." "Being mad at each other doesn't get either of us anywhere and it hurts others in the process."*)
mourning tazî (Ew hatin tazî mala me. *They came to our house to mourn.*) (Min tazî hebî. *I was in mourning.*) (Ez tazî me. *I'm mourning.*)
mouse mişk (m) (Mişkekê li mala me. *There's a mouse in our house!*)
mouth dev (m) (Herre devê xwe bişo; devê te gelek pîs e. *Go wash your mouth off; it's dirty.*)
mouthwash ava ẍelẍerê ya didana
move (v) (1) xwe livandin, xwe bilivîne (Destê xwe bilivîne. *Move your hand.*)
(2) bizavtin, bizavê
(3) livîn, bilive (Ne live! *Don't move!*) (Tu çend dilivî. Dê bes xwe bilivîne. *You sure do move around a lot. Stop fidgeting!*)
(4) mala xwe bar kirin, mala xwe bar (bi)ke (Rêsanê mala xwe bar kir. *Rêsan moved to another house.*)
(5) mala xwe birin, mala xwe bibe (Mala xwe bir Texas. *(She) moved [her home] to Texas.*)
move in (v) vekirin, veke
mover ḧemalê barkirnê
movie film
movie theater sîneme
moving barkirin (f) (Barkirin ne xweş e. *Moving is no fun.*)
much (*see* lots of)
mud teqin (f)
muddy teqin (Kulan ḧemî teqin e çinko baran bî. *The yard is all muddy because it rained.*)

mudslide çîa herifî
mug perdaẍek mezin
Muhammed Muhammed
mulberry tî (f)
multiplication lêkdan (f)
multiply (v) lêk dan, lêk bide
mum mit (Ez mit bîm. *I was mum [I didn't tell anyone].*)
mumps nîkafe
murder kuştin (f)
murder (v) kuştin, bikuje (Wî ew kuşt. *He murdered him.*) (Biraê hevala min hate kuştinê li şerî. *My friend's brother was killed by a lion.*)
muscle ezelat (m)
museum metḧef (f)
mushroom (1) gumbabuk (f)
(2) serkilafkêt hajireşka
music (1) awaz (Awazêt kurdî gelek xweş in. *Kurdish songs are wonderful.*)
(2) stran (Stranêt niştîmanî yêt stran bi Şivan gelek xweş in. *National songs, especially those sung by Şivan, are wonderful.*)
musician (1) mitirb (m) [Kurdish flute / drum player]
(2) mutrip (m/f) [vocalist / singer]
(3) huzanvan [composer / singer]
(4) stranbêj [singer]
Muslim biserrman (m/f)
must (v) (1) lazim (Lazim e tu Inglîzî bi'elimî. *You must learn English.*)
(2) mecbur (Ez mecbur im. *Yes, I must.*) (Mecbur e. *It has to be done.*) (Ḧikmetê pare ne da min. Jiber hindê ez mecbur bîm min şul kir. *The government didn't give me any money. Therefore I had to work.*)
(3) icbarî (Ar) (Medrese icbarî ye li Holende. *Children must go to school in Holland.*)
(4) wel kirin, welê bike (Welê bike Hana biçit mektebê. *Hana must [wants to] go to the library.*)
mustache simbêl (pl) (Simbêlêt wî mezin in. *His mustache is big.*) (Ev zelame bi simbêl e. *This man has a mustache.*) (Ew zelame bê simbêl e. *That man doesn't have a mustache.*)
mustard xerdel (m) (tovê xerdel *mustard seed*)
mute lal
my min [oblique] (kitêba min. *my book*)
myrrh mur (f)

n

nail bizmar
nail polish buyax̆
naked rîz (Ew cilkêt rîz nawergirit. *She doesn't wear immodest clothing.*) (Destêt wê rîz in. *Her arms are naked. [Her clothes don't have sleeves.]*) (Hanaê xwe rîz kir u kete avê. *Hana took her clothes off and went swimming.*)
nakedness rîzatî (f) (Rîzatî ya zêde gelek şerim e. *Extra nakedness [immodesty] is very embarrassing [bad].*)
name (1) nav (m) (Navê te çi ye? *What's your name?*) (Navê min Scott e. *My name's Scott.*) (Navê xuxê çi ye bi Inglîzî? *What is the name of peach in English?*)
(2) deyka ____ (*name of oldest son*) [name for a female peer]
(3) babê ____ (*name of oldest son*) [name for a male peer]
(4) xala [name for an older man]
(5) xalet [name for an older woman]
name (first) nav (m)
name (middle) (father's name) navê bab
name (last) (grandfather's name) leqeb (m) (Leqebê me El 'Îsa ye. *Our last name is El 'Îsa.*)
(2) navê bapîr (m)
name (v) nav lê kirin, nav lê bike (Tu dê çi navê li biçîkê xwe kî? *What will you name your baby?*)
napkin (1) kilîniks (m)
(2) kilînis (m) (kilînisê ser mêza xwarinê *napkin*)
narrow teng (Mala me teng e. *Our house is narrow [small].*) (Rêka me gelek teng e. *Our path is really narrow.*)
nasal congestion [idiomatic] (Difna min diêşit. *My nose hurts.*) (Ez ne şêm nefesa xwe bikêşim. *I can't breathe.*)
nation (1) welat (m)
(2) dewlet (f) (Ar)
(3) weten (Ar) (m)
nation state sefare (Me sefare di welata da nîne. *We don't have a nation state in the country.*)
national niştîmanî (Stranêt niştîmanî yêt stran bi Şivan gelek xweş in. *National songs, especially those sung by Şivan, are wonderful.*)
natural tebî'î (Tebî'î ye heker kiçik u kurrik ḧes ji êk u dû bikin. *It's natural for girls and boys to like each other.*) (Gerdinê biçîkê xwe tebî'î bî. *Gerdin had her baby naturally [vaginally].*)
nature tabi'et (m) (Tabî'etê Nazdarê xweş e. *Nazdar's nature is gentle. / She's a nice person.*)

naughty har (Ev biçîkêt te çend har in! *Your children are so naughty!*)
nauseous (Dilê min xirab dibit; min divêt ez bihilavêjim. *I feel awful; I want to throw up.*)
Nazareth Nasire
near (1) def (Ez rîniştim def dîwarî. *I sat near the wall.*)
(2) li nik (Ew li nik min rînişt. *He sat near me.*)
(3) li dur (Li dur me malêt Evx̆anîa ne. *The Afghan's homes are near us.*)
(4) nêzîk (Mala me nêzîk mala Dilnazê ye. *Our house is near Dilnaz's.*)
(5) nêzîkî (Ez li ḧeflê nêzîkî te bîm. *I was near you at the party.*)
nearly dur
neat (1) lêkdaî (Mezela wê her dem lêkdaî ye. *Her room is always neat.*)
(2) mireteb
necessary zirrorî (Zirrorî ye tu dersê bixwînî. *It's necessary for you to study the lesson.*)
neck (back of) (also the place which is believed by Muslims to collect sins) stu (f)
necklace (1) qilêdîk (f) [beads]
(2) zincîr (f) [chain]
(3) dilik (m) [chain with something hanging on it]
(4) stivank (f) [short; with 2-3 charms]
(5) menteş (f) (menteşa lîra *gold necklace*) [covers the whole chest]
(6) ristik [really long]
nectarine teraqî (f)
need miḧtac (m) (Min miḧtacî heye. *I have a need.*) (Min miḧtacî heye. *I have a need.*) (Ez miḧtac im! *Help me!*) (Ez u tu miḧtacî êk u dû ne. *You and I need each other.*) (Ez miḧtacî para me. *I need our money.*) (Ez miḧtacî cilkek te me. *I need/want your clothes.*)
need (v) (1) vîan, bivê (Min kitêb divêt. *I need the book.*) (Te pişîk vîa. *You needed the cat.*)
(2) ḧewce bîn, ḧewce be (Em ḧewce bîn biçîn xestexanê. *We need to go to the hospital.*)
needle derzî (f) (Derzîa min berze bî. *My needle was missing.*)
negative (1) naqis [math, blood]
(2) salib [pole]
(3) cam [photo] (Te heye cam? *Do you have the negative [of this picture]?*)
negotiate (v) (1) bazar kirin, bazarî bike (Min bazar li gel xudanê dikanê kir. Min ev qazane kirrî. *I negotiated with the shop keeper; I bought this pot.*)
(2) te'amil kirin, te'amilê bike (Ar) (Ez dê te'amilê li gel xudanê dikanê kim. *I will negotiate with the store keeper.*)

negotiator li navbeyna … da (Çîmen li navbeyna me da bî. *Çîmen was our negotiator [for the marriage arrangements].*)
neighbor cîran (m/f)
neighborhood (1) cîran (pl) [neighbors]
(2) meḧil (f) [community] (Mala min yê li qolaça meḧilê ye. *My house is on the corner of the community.*)
nephew (1) kurrê bira [brother's son]
(2) kurrê xoşk [sister's son]
nerve 'esab (pl)
nervous (1) mirtebik
(2) 'esabî
nest hêlîn (f) (Teyr lîsîn ser hêlîna xwe. *The bird perched on his nest.*)
net turr(ik) (f) (turrkê pirrçê *hair net*)
neurologist dixturê a'saba (m)
never (1) çi ca (Çi ca şul ne kir li Kurdistanê. *She never worked in Kurdistan.*)
(2) çi cara (Çi cara min u te şerr ne kirî ye. *You and I have never fought.*)
(3) ebed (Ebed ez li gel te naaxivim. *I'll never talk to you.*) (Ebed ez ji te sil nabim. *I'll never be upset with you.*) (Ev şule ebed na çê bit. *This thing will never happen / It's impossible.*)
(4) qet (Qet ez naêm mala te. *I'll never go to your house.*)
(5) êdî (Qet êdî ez naçime Tirkîe. *I'll never go to Turkey.*) (Tube bit ez êdî drewê bikim. *I promise to never lie.*)
new nî (Kirasê min nî ye. *My dress is new.*)
news (1) exbar (Ar) (f) (Exbarêt Kurdistanê çi hene? *What's the news from Kurdistan?*)
(2) dengubas (pl) (Dengubasêt Kurdistanê evroke gelek xweş bî. *The news from Kurdistan was very good today.*) (Rojnama Xabatê beḧsa dengubasêt ji der ve kirin. *The Xabat newspaper talks about the news from the outside world.*)
(3) qese (f) (Ez bu te qesekê bêjim. *I have some news [something] to tell you.*)
newspaper (1) cerîde (m) (Ar)
(2) rojnam (f) (Rojnama Xabatê beḧsa dengubasêt ji der ve kirin. *The Xabat newspaper talks about the news from the outside world.*)
next (1) bêt (ḧeftîa bêt *next week*) (heyva bêt *next month*) (sala bêt *next year*)
(2) têt (ḧeftîa têt *next week*) (heyva têt *next month*) (sala têt *next year*)
(3) dî (roja dî *next day*) (ḧeftîek dî *next week*) (heyvek dî *next month*) (salek dî *next year*) (Hana dê çit sefek dî. *Hana will go to the next class.*)

next to (1) (bi) rex … ve (Mala me bi rex mala we ve ye. *Our house is next to your house.*)
(2) li rexê (Pîng li rexê dîwarî ye. *The peppermint is next to the fence.*)
nice (1) xweş [food, weather] (Evro dinya xweş e. *The weather is nice today.*)
(2) keşxe [people, things, houses]
(3) law [males] (Ev kurrike law e. *This boy is nice.*)
(4) delal [things, animals and females] (Ev kiçe delal e. *This girl is nice.*)
(5) taze [things, animals and females] (Şulê te taze ye. *Your work is nice.*)
nickel pênc (f)
niece (1) kiça bira [brother's daughter]
(2) kiça xoşk [sister's daughter]
night şev (f) (şevê dî *last night*) (şeva dî *two nights ago*) (şev tira dî *three nights ago*) (şeva bêt / şeva têt / şevek dî *tomorrow night*)
nightgown dijdaşê nivistinê
nine neh (f)
nineteen nozde (f)
ninety (1) not (f)
(2) nût (f)
Nineveh Mîsil (f)
nipple (1) memik (m) (Çira şirî navexwit jiber em memkî nadînîn. *Çira won't drink the milk because we don't give her a bottle with a nipple.*)
(2) (*see also* breast)
no (1) ne (Ne, rastî, ne! *No! [emphatically]*) (Êk carî ne! *Not one time! [it's impossible]*)
(2) [idiomatic] (Ma çi ye? [informal] *No problem!*)
no one kes (Kes pirsîara min nakit. *No one asks me.*) (Kes ne li mal e. *No one is home.*)
Noah Nuḧ (m)
nobody kes (Kes pirsîara min nakit. *Nobody asks me.*) (Kes ne li mal e. *Nobody is home.*)
noise (v) (*see* make noise)
nomad (shepherd) koçer (m)
none nîne (sng); nînin (pl) (Min nînin. *I have none.*)
noodles (1) ma'kerunî (f)
hîvîa … bîn, hîvîa … bibe (1) to wait for (Hîvîa min bibe. *Wait for me.*) (Ez hîvîa te me. *I'm waiting for you [to come over].*)
(2) to plead with (Min hîvî ji Dilnazê kir min bibit dixturî. *I pleaded with Dilnaz to take me to the doctor.*)
hîweyet (f) hobby (Hîweyeta min ez zadî çêkim. *My hobby is making food.*)
hol (f) (Ar) living room
Holende Holland (li Holende *in Holland*)
Holendî Dutch [people; language]
husa like this (Vê kêkê husa çêke. *Make this cake like this.*) (Husa vexwe. Husa rîne. *Drink like this. Sit like this.*) (Kesma u kadêt xwe her husa çeke. *Always make your cookies like this.*)
huz tribe (dwazde huzêt Israîlîa *12 tribes of Israel*)
huzan (f) poem (Wî huzanekê xweş got. *He said a nice poem.*)
huzanvan (m) (1) poet (Huzanvanî got. *The poet said it.*)
(2) music composer / singer

ḧ

ḧabik (m) pills (ḧabkê mane' *birth control pills*) (Min ḧabika ser êşê xwar. *I took a pill for my headache.*)

(2) marble [the stone]
(3) (*see also* bilûk)
ḧelan, biḧele to melt (Befir ḧela. *The snow melted.*) (Penîr dê ḧelit bite zerviçk. *The cheese will melt and become zerviçk.*)
ḧelaq (m) barber
ḧeleqe (f) wedding ring
ḧelqa soap opera
ḧemalê barkirnê mover
ḧemam (f) (Ar) (1) shower room (Ezê li ḧemamê me. Ezê paqij dikim. *I'm in the shower room; I'm cleaning it.*)
(2) small room for washing clothes by hand and for taking showers
ḧemî (1) all (Ḧemî rojê ez mam li malê. *I stayed home all day long.*)
(2) every (ḧemî tişt *all things / everything*) (Min ḧemî tişt kirin di seyarê da. *I bought everything in the car.*)
(3) whole
ḧemî pêk ve total [price]
ḧemîa everyone (Min av da ḧemîa. *I gave water to everyone.*)
ḧenefî (f) faucet
Ḧenna Anna
ḧenun sensitive
ḧeq (m) (1) price (Ḧeqê vî perdaẍî dullarek e. *The price of this glass is $1.*)
(2) fare (Ḧeqê te çend e? *How much is the [your] fare?*)
(3) fee
(4) cost
(5) truth
(6) right (Ḧeqê Leqmanîe namekê bu President Bush virrêkit. *Leqman has a right to send President Bush a note [about this issue…].*)
(7) consequences (Hemî tişt ji Nazdarê birîn, ḧeqê wê ye, çinkî naçite mektebê? *If Nazdar doesn't go to school, the consequences are that they'll take all of her things from her.*)
(8) desire (Ḧeqê min e ez biçim Kurdistanê. *My desire is to go to Kurdistan.*)
ḧeqî (1) truth
(2) right
ḧeram forbidden (Goştê xenzîrî ḧeram e. *Pork is forbidden.*)
ḧeram (f) sin
ḧeraret (1) fever (Ḧeraret bu te çê dibit? *Do you have a fever?*) (Miḧrarê bîne. Ḧerareta wî bigire. *Bring the thermometer and check his fever.*)
(2) temperature

ḧeres (m) (Ar) (1) guard
(2) bodyguard
(3) keeper (Ma xwe ne ez ḧeresê biraê xwe me? *Am I my brother's keeper?*)
ḧerif (f) (Ar) letters [script; alphabet]
ḧerîq (m) fire (seyara ḧerîqê *fire truck*) (merkê seyara ḧerîqê *fireman*) (Ḧerîq ber bî mala me. *Our house was on fire.*)
ḧerîqe (f) fire station
ḧes (f) feeling (Ew pê ḧesa tiştek çû xwar. *She had the feeling something went down.*)
ḧes kirin, ḧes ke (1) to like (Ez ḧes jê dikim. *I like it.*)
(2) [idiomatic] (Bi dilê te ye? *Do you like it?*
(3) to love (Ez ḧes te dikim. *I love you.*)
(4) to want intensely
(5) (*see also* dil)
ḧesaî [idiomatic] (Tu dihî biçit ḧesaî? *How did you feel yesterday?*)
ḧesar (f) (Ar) embargo (Eve heşt sala ḧesar li ser 'Îraqê ye. *There's been an embargo on Iraq for 8 years.*)
ḧesas sensitive (Rêsan gelek ḧesas e. *Rêsan is very sensitive.*)
ḧesasî (f) rash
ḧesasîa allergies (Min ḧesasîa ji biharê hey. *I have allergies from spring.*)
ḧesî [idiomatic] (Tu biçit ḧesî? *What's wrong? How do you feel?*)
ḧesîdî (1) envious (Muhammed ḧesîdîê bi hevalê xwe dibit. *Muhammed is envious of his friend [because he's rich].*)
(2) jealous (Tu çend ḧesîdî î! *You're very jealous!*)
ḧesîdî (f) (1) jealousy
(2) envy
ḧesîdîê … bîn, ḧesîdîê … bibe to envy (Ez ḧesîdîê bi te dibim. *I envy you.*)
ḧeta (1) until (Ḧeta ḧeft cara? *Up to seven times?*) (ḧeta piştî *even after*)
(2) later (ḧeta min hebit *later / when I have it*)
ḧeş (1) conscious
(2) aware (Min ḧeş te nîne. *I didn't hear you. Say it again.*)
ḧeşerat insect
Ḧewa Eve
ḧewale (m) wall around a roof
ḧewce bîn, ḧewce be (1) to need
(2) to be important (Em ḧewce bîn biçîn xestexanê. *We need to go to the hospital.*) (Em ḧewce bîn me mêze kirî. *It was important that we bought a table.*)

ḧewdik (f) yard [of a house]
ḧewş (f) (1) courtyard
(2) driveway
(3) deck (of a house)
ḧeyat (m) (Ar) life (Ḧeyatê wan xweş bî. *Their life was wonderful.*)
ḧeyrî frustrated
ḧeywan (m/f) animal (ḧeywanêt ne kîvî *domestic animals*)
(ḧeywanêt qewî *strong animals*) (ḧeywanêt edrî ve çin *reptiles*)
(ḧeywanêt kîvî / ḧeywanêt weḧşî / ḧeywanêt elîf *wild animals*)
(ḧeywan darî dixwit *termites*) (ḧeywanêt şîrî *mammals*)
ḧêcet (f) excuse (Min lazim e ḧêcetek hebit da ez ne çim evro medresê. *I must have an excuse to not go to school tomorrow.*)
ḧêl (1) quickly (Ḧêl biçîn! *Let's go quickly!*) (Ḧêl were! *Come here quickly!*)
(2) loud
(3) Wow! (Ḧêl! Çend gelek e! *Wow, that's a lot [of food].*) (Ḧêl! Çend biçîkêt heyn. *Wow, she has a lot of children!*)
ḧêştir camel
ḧibir ink
ḧicula ankle bracelet
ḧidîd (m) (Ar) (1) border
(2) boundary
ḧikme proverb
ḧikmet (f) government (Çi ḧikmet li Holende heye? *What kind of government does Holland have?*)
ḧikmêzatî (m) autonomy
ḧikmî … kirin, ḧikmî … bike (1) to govern (G.W. Bush sala têt dê ḧikmî li Emrîke kit. *G.W. Bush will govern America next year.*)
(2) to rule (Bush ḧikmî li Emrîke dikit. *Bush rules America.*)
ḧikumî public school
ḧilî smooth
ḧilîk (f) plum (Bu min ḧilîkekê qet ke. *Cut a plum up for me.*)
ḧilîka ḧişik prune
ḧintî light-skinned [light brown] (Ez ḧintî me. *I'm light-skinned.*)
ḧişik (1) dry [plants, air, weather, bread, river]
(2) dead [plants]
ḧişik (f) drought
ḧizib (f) political party
ḧîle li … kirin, ḧîle li … bike (1) to cheat (Dilnazê ḧîle li min kir wextê em çûîne sîkê. *Dilnaz cheated me when we went to the market.*)
(2) to trick

ḧîleker cheater
ḧît (m) (1) whale
(2) huge fish (e.g., Jonah's)

i

Iblîs (m) (1) Satan (Iblîs xirab e. *Satan is evil.*)
(2) evil one
icbarî (Ar) (1) (by) force
(2) must (Medrese icbarî ye li Holende. *Children must go to school in Holland.*)
iḧtîmal probably (Iḧtîmal ez bêm mala te. *I'll probably come to your house.*)
imtîḧan (f) (Ar) (1) academic examination
(2) academic test (Min imtîḧan hebî. *I had a test.*)
Incîl (m) (1) New Testament Gospel
(2) Bible
Incîlî (1) Christian (nominal or evangelical)
(2) (*see also* bawer kirin)
Inglîzî (f) (1) English language
(2) England
Inglîzî (m/f) English person
insanî (m/f) refugee [in Germany; less status and rights than in America]
intîxeba … kirin, intîxeba … bike vote (Ev sale emê intîxeba Clintonî dê kîn. *This year we'll vote for Clinton.*)
iptîdaî (Ar) elementary school (sefa êkê ḧeta sefa şeşê *first grade through sixth grade*)
iqtîsad (f) economics
is'af (f) ambulance
ismer dark-skinned
isti'elamat receptionist
istî'emal kirin, istî'emal bike to use
istînsax to copy (Ez evî rismî istînsax dikim. *I'm copying this picture.*)
istînsax kirin, istînsax bike to develop photos (Ezê risimî istînsax kim. *I will develop pictures.*)
istiqbal (f) happiness??
istiwane (f) tube
istîraḧetê xwe kirin, istîraḧetê xwe bike to get bed rest
Istralîe Australia

iştîma’ (Ar) (f) (1) meeting
(2) conference
itfa’e (f) fire station
itîfaq (f) agreement (Min itîfaq gel te yê kirî, em biçîn parkê pêk ve. *I made an agreement with you to go to the park together.*)
ixtîsas (m/f) (Ar) foreigner
izdîḧem (1) busy (Ewa li şari’ê izdîḧem e. *It’s on a busy street.*)
(2) many
(3) lots of (Dawet izdîḧem bî! *There were lots of people at the wedding!*)
(4) full of (Izdîḧema qayim bî. *It was full of people.*)
(5) traffic jam (Şare’ gelek izdîḧem bî. Izdîḧem sekinî. *The street was really busy / lots of traffic; it stopped.*)

î

î’ade kirin, î’ade bike to repeat
îcar (f) (Ar) (1) rent
(2) fee [taxes]
îcaza sîaqetê driver’s license (Ezê çim îcazê / îcaza sîaqetê înim der. *I’m going to go get my driver’s license.*)
îcaze (f) (1) weekend
(2) day off (Kîş rojê te îcaze heye? *Which day to you have off?*)
(3) sick days
(4) vacation (Ez îcaze me. *I’m on vacation.*) (Ez dû ḧeftîa çûm îcazê. *I went on vacation for two weeks.*)
îhana … kirin, îhana … bike to insult (Min îhana wê kir. *I insulted her.*)
Îlun (f) September
îmam (m) Muslim religious leader (in the mosque)
îman (f) belief (îmana te *your belief*)
îmza (f) signature
îmza kirin, îmza bike to write one’s signature
îna then [used in story telling]
înan der, bîne der to take out (Qelemê xwe bîne der. *Take out your pencil.*)
înan derê, bîne derê (1) to pull / gouge [something] out (Evro dikturî didanê min îna derê. *Today the doctor pulled out my tooth.*)
(2) to unload (Min tişt seyarê înan derê. *I unloaded the things in the car.*)
(3) to take [something] out (Min xoşka xwe ji avê îna derê. *I took my sister out of the water.*)

înan, bîne (1) to bring [said if the desired object is at a distance] (Ez bu te avê bînim? *Shall I bring you some water?*)
(2) to give
(3) to take (Ka wî qelemî ji def deyka xwe bîne. *Take that pen to your mother.*)
înc (f) inch (Ev qeleme çend înc e? *How many inches long is this pen?*)
înc (m) grass [livestock food]
înî (f) Friday (Ew çû xwe diba Înîê camî’ mezin. *He went himself to the big mosque on Friday.*)
Înis (m) Jonah
îprax (f) stuffed grape leaves
Îran (f) Iran
Îranî (1) Iranian (person)
(2) Farsi (Iranian language)
Îraq (f) Iraq
Îraqî Iraqi (person)
îsfenc sponge
îsik (1) burp
(2) hiccups (Wî îsik heye? *Does he have the hiccups?*)
îsik kirin, îsikê bike to burp
Îslam (f) Islam
Îsraîl Israel
îte (f) iron
îte kirin, îte bike to iron (Min îte kir. *I ironed it.*)
îtekirî ironed
îtêl (f) hotel
îşa’e (f) x-ray (îşa’a demaẍî *CAT scan [x-ray of brain]*)
îşa’e standin, îşa’ê bistîne to take an x-ray
îşî (m) bunch [i.e., of grapes]
îza’ê (f) (Ar) broadcast program

j

jar av kirin, jar av ke (1) to baptize (Yuḧenna ‘Îsa jar av kir. *John baptized Jesus.*)
(2) to rinse [in deep or running water] (Min cilik jar av kirin. *I rinsed the clothes.*) (Amanêt xwe jar av ke. *Rinse your dishes.*)
(3) to put under water and bring up

jebeş (m) watermelon
jengar rusty (Qazanê min jengar bî. *My pot was rusty.*)
jê ji + wî; ji + wê [contraction] (Jê bigerre. *Leave it.*)
jê bawer kirin, jê bawer ke to believe in (Ji min bawer ke Şirînê şî kir. *Believe me! Şirîn got married!*)
jê birin, jê bibe to cross out (Min jê bir. *I crossed it out.*)
jê der ketin, jê der bikeve to get off
jê gerran, jê bigerre to leave [alone] (Min ji kiça xwe gerra. *I left my daughter alone.*)
jê vekirin, jê veke to behead (Qesabî serê pezî jê vekir. *The butcher beheaded the sheep.*)
jêk from each other (Ez u mala xesîa xwe em jêk cida ne. *My mother-in-law's family and I are (living) separate from each other.*)
jêk dîar (1) separated from (Nîsk u nuk jêk dîar in. *The lentils and chick peas are separated from each other.*)
(2) opposite from (Şirîn u Şermîn jêk dîar in. *Şirîn and Şermîn are opposite from each other [in appearance].*)
jêk hatin, jêk bê (were) (1) to match [clothes, furnishings] (Jêk tên. *They match.*)
(2) to go together [clothes, furnishings] (Jêk naên. *(The clothes) don't match.*)
jêk vekirin, jêk veke (1) to take apart (e.g., furniture)
(2) to separate from itself
ji from (Ew ji gundî hat. *He came from the village.*)
ji … dîar kirin, ji … dîar ke separate (mental) ideas (Peyvêt Kurdî ji peyvêt 'Erebî dîar bike. *Separate the Kurdish words from the Arabic words.*)
ji … pê ve tir except for (ji min pê ve tir *except for me*)
ji … ve "I thought" (ya ji mi ve) [idiomatic] (Ez çûme mala wan. Min biraê wê dît, ya ji mi ve yê li gel wan e. *I went to their house and saw her brother. I thought he lived with them.*)
ji + wî; ji + wê [contraction] jê
ji ber [idiomatic] (Herre ji ber pêt min. *Go away! You're in the way / under foot.*)
ji ber kirin, ji ber bike to memorize (Evê axiftinê ji ber bike. *Memorize this saying.*)
ji berî [idiomatic (ji berî ḧeftîekê *week before last*)
ji bilî … except for (Ḧeft mirov hati bîn ḧeflê ji bilî min. *Seven people came to the party except for me.*) (Ji bilî Êkşemb e. *Except for Sunday.*)
ji bîr kirin, ji bîr bike to forget (Ji bîr ne ke! *Don't forget!*) (Min ji bîr ne ke çi cara. *Don't ever forget me.*)
ji def from (Eve ji def wî ye. *This is from him.*)

ji der ve outside (Herre ji der ve. *Go outside.*)
ji dil serious (Ez ji dil ḧes ji wê dikim. *I seriously / really like her.*)
ji mêj e a long time ago (Ez ji mêj e hatim vî xanî. *I came to [live in] this house a long time ago.*)
ji nav da (1) inwardly
(2) inside (Ji nav da diêşit. *It hurts inside.*) (Ji nav da min seḧkirê. *I looked inside [the house].*)
ji nişke kê ve suddenly
ji pakêta înane derê, ji pakêta bîne derê to unpack
ji piş ve behind (Min Şirîn ji piş ve dît. *I saw Şirîn from behind her [in the crowd].*)
ji qesta (1) teasing (Ne, ez naçim. Min ji qesta we got. *No, I'm not going. I told you that teasingly.*) (Buçî te we kir? Ji qesta. *Why did you do that? I was just teasing.*)
(2) joking (Emê ji qesta bêjîne Adarê: emê çîn Giant. *Let's jokingly tell Adar we're going to Giant.*)
(3) trick
ji qestî (1) teasing
(2) joking (Min ji qestî gote te. *I was joking when I told you that.*)
(3) pretending (Ji qestî dixwit. *She's pretending to eat.*)
ji sedê percent (95 (ji) sedê *95%*)
ji sufî çêkirin, ji sufî çêke to knit (Min çakêtek bu Hanaê ji sufî çêkir. *I knit a jacket for Hana.*)
ji xew rabîn, ji xew rabe to get up [after sleeping]
ji xew rakirin, ji xew rake to wake up [someone] (Min u deyka xwe qêrrqêrr kir. Me Hana ji xew rakir. *My mother and I shouted at [fought] each other and woke Hana up.*)
ji xêra Xwedê ra [idiomatic] (Ji xêra Xwedê ra ez zivirrî bam welatê xwe. *I wish I could go back to my country.*)
ji xwe just because (Ez çûme sîkê … ji xwe. *I went shopping … just because.*)
jiber (1) because
(2) because of
(3) for
jiber çî why [idiomatic] (Jiber çî tu çûî dixturî? *Why did you go to the doctor?*) (Jiber çî tu naxwînî? *Why don't you study?*) (Jiber çî tu ne dihatî mala me? *Why didn't you come to my house?*)
jiber hindê therefore
jiber vê çendê because of [these reasons]
jiber wê çendê because of [those reasons]
jiberî before (Roj jiberî Çiraê rabî. *Roj got up before Çira did.*)
jijî (m) porcupine
jilawîa Levite

jimare (f) number (jimara êk *number one*) (jimara mal *house number*) (jimara avahî *apartment building number*) (jimara derrgeh *apartment door number*)
jin female
jin hirub divorce
jin înaî married [men] (Jin înaî ye. *He's married.*) (Te jin înaî ye? *Are you married?*)
jin înan, jinê bîne to marry [men] (Ew dê bi xwe jinê înit. *He will get married / He will bring himself a wife.*)
jin u mêr marriage (Jin u mêr pêk nakin. *Their marriage is bad.*)
jin(ik) (f) (1) wife
(2) woman
(3) married woman
jina malê (f) housewife
jinbab (f) stepmother
jinbira sister-in-law [wife of my brother]
jinek dî înan, jinek dî bîne to remarry [for men]
jinînan (f) marriage
jinka ḧisêbê cashier
jintî sister-in-law [wife of my husband's brother
jî (1) also
(2) too
jîan (f) life (jîana her u her *eternal life*) (cihê jîanê *city*) (Heker te "food stamps" ne bit, dê jîana te çawa bit? *If you don't get food stamps, what will your life be like?*)
jîan, bijî to live (Ez u Amy pêk ve dijîn. *Amy and I live together.*)
jur (f) class
jur ve inside (Herre jur ve. *Go inside.*)
juro (m) north

k

ka [question particle] (Ka Hana? *Where is Hana?*) (Nazdar, ka tu? … Eve ez (im). *Nazdar, where are you? … I'm here.*) (Ka piçek avê bide min. *Bring me some water (please).*)
ka (f) (1) straw
(2) hay
kabik (f) hoof
kabîse (f) stapler
kade (f) cookies with filling
kade u kesme (f) cookies for the feast [with and without filling]

kafir (1) not practicing Islam
(2) blasphemous (Hindî kafir in çînku 'îbadeta senema dikin. *Indians are blasphemous because they worship idols.*)
(3) pagan
kamêra cameraman
kamîr (f) camera (Kamîra min berza bî. *My camera is lost.*)
kanê where (Kanê kiça te? *Where is your daughter?*)
kanî(k) (f) (1) pond
(2) spring (water)
(3) fountain
Kanîna duê January
Kanîna êkê December
kar (m) (1) job (Karê te çi ye? Tu çi dikî? *What is your job? What do you do?*)
(2) work
(3) action (Te çi kar kirî ye? *What [action] have you done?*)
(4) affairs
(5) business
(6) deeds
(7) kid [young goat]
kar pê kirin, karî pê bike to put (it) into practice (Karî pê bike da tu fêr bî. *Put it into practice so you learn it well.*)
kar u barê xwe kirin, kar u barê xwe bike to prepare oneself for something (Min kar u barê xwe kir bu dawetê. *I prepared for the wedding.*)
karbedest (1) official (Karbedestî xanîa min bu min bi rêk îna. *The official got my house in line for me.*)
(2) manager
karekî anything (heker dû ji we pêk hatin di her karekî da dawxaza wan çi tişt bit … *if two of you agree about anything you ask for …*)
karî (f) curry
karîte (m) beam (of wood)
karker (m) (1) laborer
(2) worker
(3) repair person
(4) maintenance man
karte (f) (1) card (kartê de'wê *invitation*) (kartê de'wa dawetê *wedding invitation*)
(2) postcard
kartun (1) box
(2) package
(3) cartoon
kaş u kanê hockey

kaşhanê banî roof
kaşhank (f) ceiling (Kaşhanka me dilupa dikit. *Our ceiling is leaking.*)
kaşî ferfîrî tile
kaşîr cashier
kavil (m) (1) dump [for trash]
(2) junk yard
kaẍez (m/f) (1) paper (Ev kîske kaẍez e. *This bag is paper.*) (Ka kaẍezekê bide min. *Give me the paper.*)
(kaẍeza neylon *plastic wrap*)
(kaẍezê dîwarî *wallpaper*)
(kaẍezê mehrê *marriage license*)
(kaẍezêt paqijkirnê *paper products*)
(2) card
ke’be black stone in Mecca
kebab (f) kebab
keçik queen (playing card)
kef (f) foam
kefa destî palm of hand
kefçik (f) spoon (kefçikê çayê *teaspoon*) (kefçikê xwarinê *tablespoon*)
kefîk (f) (Ar) hair scarf
kefîl sponsor for refugees in America
kehnî(k) (f) (1) spring (of water)
(2) pond
kehreb (f) (1) electricity (Kehreb çû. *The electricity went out.*)
(2) electrical power
kekew (f) (1) hot chocolate drink
(2) cocoa powder
kel hot [cooking temperature] (Ev ave kel e. *That water is hot.*)
kelandin, bikelîne to boil (Herre avê bikelîne. *Go boil the water.*)
kelandî (1) boiling (ava kelandî *boiling water*)
(2) hot [cooking temperature]
(3) cooked [vegetables]
kelandîn, bikele to boil (Avê dikelit. *The water is being boiled.*)
kelek (f) raft (Kelek çû hêdî hêdî heta çû ber lêva avê. *The raft slowly went to the edge of the water.*)
kelemî (f) cabbage
kelîm (Ar) word (Ez dişêm piçek kelîma bixwînim. *I can read a few words.*)
kelpik (m) peel (kelpikê muzê *banana peel*)
kemp(f) (refugee) camp (Em çûîn kempê di Silopîa. *We went to the Silopi refugee camp.*)
kemputer (f) computer

kendal canyon
kengî when (Kengî ez bêm def te? *When do I come to your house?*)
kenîn, bikene to laugh
kenîşte (1) house of worship
(2) temple
kentur (f) wardrobe
kenẍir (m) kangaroo
ker (m) donkey (kerê kîvî / kerê xîç xîçî *zebra*)
ker kirin, ker ke to cut cloth for sewing (Qimaşê xwe ker ke. *Cut your cloth.*)
kerefis (f) (1) celery
(2) parsley
kerem kirin, kerem ke (Kerem ke! *Welcome [to my home]! / Sit down! / Go ahead and say what you want to say.*) (Xwedê keremê li gel min kirî. *God has blessed me.*)
kerevan (1) mobile home
(2) trailer
kerib u kîn resentment (Bes kerib u kînê li gel cîranêt xwe bike. *Enough resentment toward your neighbor. Let it go!*)
kerik (f) knife (Vê kerkê tîj bike. *Sharpen this knife.*)
kerka spîkirnê peeler
kerr deaf
kerrbê … ji … ve bîn, kerrbê … ji … ve bibe to hate [someone] (Kerrbê min jê ve bit. *I hate you.*)
kerrbê xwe dan, kerrbê xwe bide to hold a grudge (Kerrbê xwe ne de kesê. *Don’t hold a grudge against anyone.*) (Min kerrbê xwe da te. *I held a grudge against you.*)
kerrewît (f) bench
kerrib (m) (1) anger (Xudan jî kerbêt wî gelek ve bîn. *The master was very angry.*)
(2) sadness
(3) sorrow
(4) hatred
(5) grudge (Tu çend bi kerrib u kîn î! *You’re so full of grudges!*)
kerwan (f) flock of sheep (Min kerwanek pezîê hey. *I have a flock of sheep.*)
kes (1) no one (Kes pirsîara min nakit. *No one asks me.*) (Kes ne li mal e. *No one is home.*)
(2) nobody
(3) anyone (bê kes *lonely [without anyone]*)
(4) anybody
keseb (f) liver

kesek (1) someone (*see also* êkê)
(2) somebody
(3) anyone (Kesek pirsîara te dikit? *Has anyone asked you?*)
(4) anybody
kesik not ripe
kesik (m) (1) green (keskê tarî *dark green*)
(2) bluegreen
kesik bîn, kesik bibe to be leafed out (Dar kesik dibit. *The trees are leafed out / in full leaves.*)
keskatî (1) vegetation
(2) plants [general: grass, flowers, vegetables]
keskî sorrî alaî rainbow (Keskî sorrî alaî derket li esmana. *The rainbow came out.*)
kesme (f) cookies without filling
keşxe (1) very nice [people, things, houses]
(2) wonderful
(3) fantastic
ketin av, bikeve avê to swim (Tu ḧes jê dikî bikevî avê? *Do you like to swim?*) (Tu dê çî ser avê kevî avê? *Will you go swim in the river?*) (Tu dê çî ser mezbeḧê kevî avê? *Will you swim in the swimming pool?*)
ketin, bikeve to fall (Ez ketim ji derinckê. *I fell down the stairs.*)
kevil (m) animal skin
kevilace crab
kevin old (things) (Ev xanîe kevin e. *This house is old.*)
kevir (m) stone [huge rock smaller than foothills] (li ser kevirî *on the rock*)
kew (f) partridge
kewenter (f) (1) counter
(2) cupboards
(3) storage locker
keyf (1) funny (Ew keyf e. *He's funny.*)
(2) (*see also* bi keyf)
keyf (f) (1) happiness (Keyfa wî hat. *His happiness came. / He's happy.*)
(2) pleasure
(3) [idiomatic] (bi keyfa te ye. *Do as you like.*)
keyf kirin, keyfê bike to celebrate (Me keyf kir. *We celebrated.*)
kezîk braid
kê (1) who [oblique] (Kê gote te? *Who told you?*)
(2) whom [oblique] (Te go kê? *You told whom?*)
kêk (f) cake (kêka ḧazir *cake mix*)

kêlan, bikêle to plow (Cutîar 'erdê xwe dikêlit. *The farmer plows his land.*) (Min kêla. *I plowed it.*)
kêlû (f) kilo (kêlûekî şekirê / xîara *a kilo of sugar / cucumbers*)
kêlûmîter kilometer
kêm (1) lack (Çi ji min yê kêm e hêşta? *What do I still lack?*)
(2) lacking ('Emirê wê kêm e bu medresê. *Her age is lacking / She's too young for school.*) (Ava xwarinê kêm e. *The food is lacking in water / The food is dry.*) (Çi jê kêm e? *What is lacking from this kotilk?*)
(3) minus (Se'et çar kêm pênc e. *It's 3:55. / It's 4:00 minus 5 minutes.*)
(4) a little (Min kêm xwarin xwar. *I ate just a little food.*)
(5) less
(6) a few (Min kêmêt heyn. *I have a few.*)
(7) few in number (Ders hebî bes talib kêm bîn. *We had class, but the students were few in number.*)
kêm kirin, kêm (bi)ke (1) to simmer (Agirê xwe kêm ke. *Turn down your fire.*)
(2) to subtract
(3) to turn [volume] down (Televizîun kêm ke. *Turn the TV down.*)
kêmkirin (f) subtraction
kêr (f) use (bi kêr çi nahêt *it has lost its usefulness*)
kêr hatin, kêr bê (were) (1) to be useful (Ev çente biçîke kêr naêt. *This small bag isn't very useful.*)
(2) to be suitable (Cilkêt min kêr tên ez pê biçime şulî. *My clothes are suitable for me to go to work.*)
(3) to be important (Mekteb bu te pitir kêr hatî ji tu li pêş televizîunê ve bî. *School was more important for you than being in front of the TV.*) (Mekteb bu te pitir dêr dê êt … *School will be more important for you …*) (Clinton pitir kêr we têt ji cîrana. *Clinton is more important than the neighbors.*) (Ez ne gelek ji te kêr hatîtir im. *I'm not more important than you are.*)
kêrê where (place) (Dihî siḧarê tu li kêrê bî? *Where were you yesterday morning?*)
kêşan, bikêşe (1) to pull (Min werîs kêşa. *I pulled the rope.*)
(2) to smoke (Min cixare kêşa. *I smoked a cigarrette.*)
(3) to take [length of time] (Sê se'eta rêk kêşa ḧeta ez geheştim Dohukê. *It took me three hours to get to Dohuk.*)
(4) to weigh
(5) to have [patience] (Sebirê xwe bikêşe ḧeta ew bêt. *Have patience until he comes.*)
kêvlaje crab

kêvrîşk (f) rabbit (Kêvrîşk xwe dihilavêt / dihilavêjit. *The rabbit hops.*)
kiç(ik) (f) (1) girl
(2) daughter
(kiça bira *niece [brother's daughter]*)
(kiça xoşk *niece [sister's daughter]*)
(kiça mam *cousin [father's brother's daughter]*)
(kiça met *cousin [father's sister's daughter]*)
(kiça xal *cousin [mother's brother's daughter]*)
(kiça xalet *cousin [mother's sister's daughter]*)
(kiça zirbab / jinbab *stepsister*)
(3) virgin (kiça kiçîn *virgin; Mary the mother of Jesus*)
(4) unmarried woman
kif kirin, kif ke to blow/wipe your nose
kifin (m) coffin
kifir blasphemy
kifte (f) (meat) patties (Kifte xweş in. *The meat patties are good.*)
kilêçe (f) (Ar) cookies for Kurdish feasts
kilîl (f) key (kilîla qodîka *can opener*) (Kilîla derrgehê min hinda bî. *The key to my door is lost.*)
kilîl kirin, kilîl bike to lock
kilîniks (m) (*see* kilînis)
kilînis (m) (1) napkin (kilînisê ser mêza xwarinê *napkin*)
(2) kleenex (kilînisê desta *Kleenex*)
(3) toilet paper (kilînisê edepxanê / lefe *toilet paper*)
(4) tissue (kilînisê desta *tissue*)
(5) paper towel (kilînisê metbexê *paper towel*)
kinîşt street
kiras (m) (1) dress (kirasê yê bi tişt bînê *maternity dress*)
(2) jumper
(3) tunic
kiras u fistan (m) Kurdish women's party dress (dress and jacket) [has a gathered waist]
kiras u kurtek (m) Kurdish women's party dress (dress and jacket) [has no waist marked]
kirê (f) (1) rent (Ez şiqa xwe didim bi kirê. *I rent my apartment.*) (Ez şiqa xwe didim bi kirê. *I rent my apartment.*) (Ev xanîe bi kirê ye? *Is this house for rent?*) (Kirêa vî xanî çend e? *How much is the rent for this house?*)
(2) fee
kirêdar (1) renter
(2) tenant
kirêt ugly [people and things]
kirêt kirin, kirêt bike to insult

kirim (m) worm
kirin, bike (1) to do [often used with nouns as a compound verb] (Ewan biçîka çi kir? *What did those kids do?*) (Vî şulî bike. *Do this work.*)
(2) to make
(3) to put on (Pêlavêt xwe bike pê xwe. *Put your shoes on [your feet].*)
(4) [innumerable compound verb usages, e.g., to pick] ji darê kirin, ji darê bike (Hirmîkê ji darê bike. *Pick the pear [off the tree].*)
kirin ber xwe, bike ber xwe (1) to dress oneself (Bike ber xwe. *Dress yourself.*)
(2) to put on (Biluzê bike ber xwe. *Put on the sweater.*)
kirin di … da, bike di … da to put in [something] (Bike tê da. *Put it in [the bag].*) (Şerbetê bike di selacê da. *Put it in the refrigerator.*)
kirin di firnê da, bike di firnê da (1) to bake (Min kir difirnê da 30 deqêqa. *I baked it for 30 minutes.*)
(2) to roast (Ez dê xwarina xwe kim di firnê da. *I'll roast my food.*)
kirin di nav da, bike di nav da to put together (Serkê qelemê xwe bike di nav da. *Put the caps (?) on the pens.*)
kirin di nav şulî da, bike di nav şulî da to invest (Parê xwe minê kirî di nav şulî da. *I invested my money.*)
kirin kezî, bike kezî to braid (Ez dişem bikim kezî. *I can braid.*) (Dihî min pirrça xwe kir kezî. *Yesterday I braided my hair.*)
kirin sernîvî, bike sernîvî to simmer (Agirî bike sernîvî. *Turn the fire down halfway.*)
kirin şulî ra, bike şulî ra to invest (Min $100 hebîn. Min kirin şulî ra. Min feydek jê kir. *I had $100. I invested it and gained more money.*)
kirin xêr, bike xêr to praise (Wan bu wî kirin xêr. *They praised him.*)
kirin ẍar, bike ẍar to run (Ne ke ẍar. *Don't run.*) (Ḧêl bike ẍar! *Run fast!*)
kirî (f) (1) wages (Kirîa wan bidê. *Give them their wages.*)
(2) pay (Kirîa xwe wergire. *Take your pay.*)
(3) fee [rent] [villagers say this]
kirnî fleas
kirrîn, bikirre to buy (Min erzaq kirrî. *I bought food.*)
kislan lazy
kistinaî light brown (hair)
kit (f) one of a pair (Ka kita ni'ala min? *Where is my one matching slipper?*)
kit u kit backwards {shoes)

kitêb (f) (1) book (kitêbêt desturî *books of the law*) (kitêba renga *coloring book*)
(2) binder (loose-leaf, three-ring)
(3) textbook
kitik (f) cat
kitqirin to cry out (Kitqir li min. *It cries out to me.*)
kî (1) who [direct] (Ew kî ye? *Who is it?*)
(2) whom [direct] (Te kî bi xwe xasti ye? *Whom have you asked?*)
kîla (Ar) kidney?? (Kîlaêt wî şul nakin. *His kidneys don't function.*)
kîmîa (f) chemistry
kîn girtin, kîn bigire to hold a grudge
kîsik (m) plastic or paper grocery / trash bag (Kîskê kaẍez bide min. *Give me the paper bag.*)
kîr (1) depth
(2) deep (Nîva beḧirê kîr e. *The middle of the ocean is deep.*) (Ez nivistinekî kîr nivisti bîm. *I slept soundly / like a rock.*)
kîrahî (f) depth
kîratî (f) depth (Kîratîa avê sed metir e. *The depth of the water is 100 meters.*)
kîrê (*see* kêrê)
kîş(ik) (1) which
(2) which one (Kîşk ji wan Hana ye? *Which one of them is Hana?*)
kîve where [place] (Tu kîve çûî dihî? *Where did you go yesterday?*)
kîvî (1) shy
(2) scared
(3) wild [animals]
koçer (m) nomad (shepherd)
kolind (m) (1) squash
(2) zucchini
kolindê zer pumpkin (Min kolindê zer kir di nav nîskê da. *I made a dish of pumpkin and lentils.*)
kombîn (f) meeting (Min kombînekê li New Jersey hey. *I have a meeting in New Jersey.*)
komedîn (f) (1) chest of drawers
(2) bookshelf
(3) dresser
(4) bureau
(5) entertainment center
korik (f) ditch (Ez ketim di korikê da. *I fell into the ditch.*)

kort short [people, animals] (Pêt pişîka min kort in. *My cat's legs are short.*) (Deyka min kort e; babê min drêj e. *My mother is short; my father is tall.*)
kortbîn (f) summary (U bu kortbîn … *And in summary …*)
(U kortbîna vê çîroke … *And the summary of this story is …*)
kotilk (f) (meat) patties (Kotilk xweş in. *The kotilk are good.*) (Kotilk dew xweş e. *The yogurt kotilk is good.*) (Min kotilkêt pitata çêkirin. *I made potato kotilk.*) (Bu te kotilkê qet kim wekî ya xwe? *Do you want me to cut your kotilk up like mine?*)
Krînîus Quirinius
ku (1) who
(2) that
kuar (f) barn (di kuara min da *in my barn*)
kuçik (m) (1) small stone
(2) fireplace (made from stones)
kuçka mêhvana living room [formal]
kuîl servant
kuîlê bibin, kuîlê bibe to serve
kujî (m) corner (Hana serê xwe kujîê mêzê da. *Hana bumped her head on the corner of the table.*)
kuk Coke
kukan Kurdish card game [When playing Kukan, the challenger may ask, "Sera çi?" which means, "*What are we playing / betting for? What will the prize be for the winner of this card game?"*]
kul (1) inflamed
(2) infected (Singê wê kul e. *She has pneumonia. / Her chest is infected.*)
kulan (f) (1) alley
(2) side street
kulan, bikule to dig
kulanê outside (Hana pê xas çû kulanê. *Hana went outside barefoot.*)
kulatî infection (Heker tu paqij nakî dê kulatî êt ve. *If you don't wash it, it will get an infection again.*) (Kulatîekê li destê min e. *My hand has an infection.*)
kulav (m) (1) ski hat
(2) stocking hat
(3) Kurdish man's head wrap
kulêre fatally ill people (Êşa kulêre kete di nav milletê. *The pain of the fatally ill was felt by the people.*)
kulik (m) (1) lump (Nazdar kulikê hey. *Nazdar has a lump [in her breast].*)
(2) coop (kulkê mirîşka *chicken coop*)
kulî (m/f) grasshopper

kulîlk (f) (1) flower (bud)
(2) wild flower
(3) blossom
kum bîn, kum bibe to come together (her çi cihekê dû yan sê bi navê min kum bûn *for where two or three come together in my name*) (Em kum dibîn ser xweşîa. *We were together for the nice thing [the celebration].*)
kum kirin, kum bike (1) to store up
(2) to collect (Min bi xwe hindek ḧeywanê biçîk kum kirin. *I collected some small animals.*)
(3) to put together (L'abika kum bike. *Put the toys together.*)
(4) to pull out/up (Zîwanê kum bike! *Pull out the weeds!*)
(5) to root up
kumbîn (f) (1) meeting
(2) conference
kumlek (m) (*see* kumlik)
kumlik (m) (1) blouse
(2) shirt (Kumlikê min sorr e. *My shirt is red.*)
kuncî (f/pl) sesame seed(s) (Teḧîn ji kuncîê çê dibit. *Teḧîn is made from sesame seeds.*)
kuncîluk (f) sesame seed candy
kunik (f) hole
kup (f) (1) tea cup
(2) coffee cup
kupe heart (playing card)
Kurd (m/f) Kurd
Kurdî (f) (1) Kurmanji
(2) Kurdish (language)
kure blind
kurik (m) cloak
kurmatîx (f) hip
kurr(ik) (m) (1) boy
(2) son (kurrê bira *nephew [brother's son]*)
(kurrê xoşk *nephew [sister's son]*)
(kurrê mam *cousin [father's brother's son]*)
(kurrê met *cousin [father's sister's son]*)
(kurrê xal *cousin [mother's brother's son]*)
(kurrê xalet *cousin mother's sister's son]*)
(kurrê zirbab / jinbab *stepbrother*)
(Kurrê Miruvî *Son of Man*)
(3) unmarried man
(4) jack (playing card)
kursîk (f) (1) chair (kursîka şelel *wheelchair*)
(2) seat

kuster (f) inter-city bus
kuşe couch pillow
kuştin (f) murder
kuştin, bikuje (1) to kill (Ez kuştim! *(He) killed me [because he screamed so much and was disobedient].*)
(2) to murder (Wî ew kuşt. *He murdered him.*) (Biraê hevala min hate kuştinê li şerî. *My friend's brother was killed by a lion.*)
kutir (f) dove
Kuwêt (f) Kuwait (f) (Ew çû di Kuwêtê da. *He went to Kuwait.*)
kuxik (f) cough (Kuxikê li Hanaê ye. *Hana has a cough.*)
kuxik (m) shelter / pen (kuxkê peza *sheep pen*)
kuxîn, bikuxe to cough (Nazdar dikuxit. *Nazdar's coughing.*)
kûllîe (f) college (Kûllîa 'Ilumê *College of Science*) (Kûllîa Adabê *College of Arts*)
kwar kirin, kwar bike to store (something) away??
kwarter (f) quarter (25 cents) (Kwarterekê bide min. *Give me a quarter.*)

l

l'abe (f) toy (l'abê biçîka *doll house*)
laît flashlight
lal (1) silent
(2) dumb
(3) mute
lalîk (f) plate [said by villagers]
lalingî (f) tangerine
landik (f) cradle
lastîk (m) condom (Jiberî bêt def te lastîkî kit ber xwe. *Before you have sex, put on a condom.*)
law (1) handsome [males]
(2) nice [males (Ev kurrike law e. *This boy is nice.*)
lazim (1) should
(2) must (Lazim e tu Inglîzî bi'elimî. *You must learn English.*)
(3) ought to
le'ne (f) curse
le'ne, le'ne bike to curse
lebix (f) cement plaster
lefe (f) (Ar) sandwich (lefa penîrî *cheese sandwich*)
legen (f) (1) washtub [medium, small]
(2) mixing bowl
lehendik (f) cradle (Kurdish)

leḧimb'acîn Kurdish-style pizza (Tu ḧes ji leḧimb'acîn dikî? *Do you like Kurdish pizza?*)
lempe (f) lamp
lepik (f) glove (lepikêt neylun *rubber gloves*)
leq (f) bite
leq deynan, leqa deyne to bite (Pişîka min 'aqil e; leqa nadeynit. *My cat is good; he doesn't bite.*)
leqeb (m) last name (grandfather's name) (Leqebê me El 'Îsa ye. *Our last name is El 'Îsa.*)
leqep (m) initial
lesqe (scotch) tape (Min lesqeê hey. *I have some scotch tape.*) (Min lesqe lê daî bî. *I taped it.*)
leş (m) body (Ez leş êş im. *I have pain in my body.*)
leşker (m) troop of soldiers (Leşkerê Kurdî bi hêz e. *Kurdish soldiers are strong.*)
letir (f) (Ar) liter
lewenta riha aftershave
lewente (1) perfume (Bêhina lewenta te xweş e. *The scent of your perfume is nice.*)
(2) cologne
lewḧa i'lana bulletin board
leẍavuk (m) jaw
leymîn (f) (1) lemon (leymîn diz *lemon salt*)
(2) lime (leymînêt kesik *green lemon / lime*)
leymun (Ar) (f) lemon
lez quickly (Lezê bike da biçîn mektebê! *Do it quickly so we can go to school!*) (Min bi lez u bez xwe lêk da çinko dreng bî. *I got ready quickly because it was late.*)
lez (f) swiftness
leza earnestly (leza ez ji te dixwazim *earnestly I seek you*)
lezê kirin, lezê bike to hurry up (Lezê bike da biçîn sîkê. *Hurry up so we can go to the store.*)
lê li + wî; li + wê [contraction] (Min lê gerra. *I looked for it.*)
lê dan, lê bide (1) to play [an instrument] (Pîanu lê ne de. *Don't play the piano.*)
(2) to put on or up
(3) to send [a fax] (Bu min birîskekê lê bide. *Send a fax for me.*)
(4) to push (Tila xwe lê bide. *Push it [the elevator button].*) (Tila xwe li reqema êk bide. *Push number one [on the phone].*)
lê gerran, lê bigerre (1) to look for (Ezê li Hanaê digerrim. *I'm looking for Hana.*) (Li deyka xwe bigerre! *Look for your mother!*)
(2) to search for (Min deftera xwe hinda kir. Ez dê lê gerrim. *I lost my notebook. I'll search for it.*)
(3) to seek for
lê kum bîn, lê kum bibe to gather together (Biçîk ḧemî li elwana kum bîn. *The kids gathered together all the crayons.*)
lê pirsîn, lê bipirse (1) to ask about (Te li çentê Adarê pirsî? *Did you ask Adar about the pen [that was lost]?*)
(2) to interview
(3) to interrogate
(4) to interview
lêburîn (f) salvation (Lêburîna me ji 'Îsaî Mesîḧ e. *Our salvation is from Jesus Christ.*)
lêk dan, lêk bide (1) to collect
(2) to organize (Mêza xwe lêk bide. *Organize your desk.*)
(3) to go and bring together
(4) to pick up [organize] (Mala xwe lêk de. *Pick up your house.*)
(5) to rearrange (Min serdava xwe lêk da. *I rearranged [the furniture in] my basement.*)
(6) to put away
(7) to multiply
(8) to invest (Tu çawa pare lêk didî? *How do you invest [your] money?*)
(9) to have an accident (Timbêla min lêk da li gel timbêlek dî. *My car had an accident with another car.*)
lêk vekirin, lêk veke (1) to divide (Ez dê van piskuêta lêk vekim. *I'll divide these cookies.*)
(2) to distribute
(3) to sharpen (Vê kerkê lêk veke. *Sharpen this knife.*)
lêkdaî (1) organized (Mala Adarê lêkdaî ye. *Adar's house is organized.*)
(2) neat (Mezela wê her dem lêkdaî ye. *Her room is always neat.*)
lêkdan (f) multiplication
lênan, bilêne to cook (Xwarinê bilêne. *Cook some food.*) (Te xwarina xwe lêna? *Did you cook your own food?*)
lêv (f) (1) edge (lêva dîwarî / mêzê / pencerkê / avê *the edge of the wall / table / window / water*)
(2) shore (Ew li ser lêva derîaê rînişt. *He sat by the shore of the lake.*)
li (1) at (Ew li mal e? *Is she at home?*)
(2) in (Ewa li metbexê ye. *She's in the kitchen.*) (Ezê li ḧemamê me. Ezê paqij dikim. *I'm in the shower room; I'm cleaning it.*)
(3) on (Xanîê min li rukinî ye. *My house is on the corner.*)
li + wî; li + wê [contraction] lê

li ber (1) in front of (Ew nivist li ber hîtera min. *She slept in front of my heater.*)
(2) with
(3) under (Em li ber lempê rîniştîn. *We sat under the lamp.*)
(4) in (Ez li ber sihê rîniştim. *I sat in the shade.*)
(5) [idiomatic] (Biçîk li ber pêt min e. *The child is under foot / in the way.*)
li ber … ketin, li ber … bikeve to be enough (Ev kitêb li ber min ketin. *These books are enough [for me].*)
li ber xwe bi tinê selfish (Ew li ber xwe bi tinê ye. *He is selfish.*)
li berahîê first of all
li beramberî across from (Ez li beramberî te me. *I'm across from you.*)
li bin (1) under (Wereqe li bin meqesê ye. *The paper is under the scissors.*)
(2) below (Kitêba min yê li bin mêzê ye. *My book is below the table.*)
(3) beneath (Heyvê li bin ewrî ye. *The moon is beneath the cloud.*)
li def with (Hevala te li def te niviste? *Did your friend spend the night with you?*)
li dîv (follow) after (Li dîv min were. *Come follow me.*)
li dur (1) near (Li dur me malêt Evẍanîa ne. *The Afghan's homes are near us.*)
(2) around (Wî kir ẍar li dur medresê. *He ran around the school.*)
li dur man dur all around (Gul li dur man dur medresê ne. *Flowers are all around the school.*)
li ewilî (Ar) first of all
li gel with (Ez li gel Susanê şul dikim. *I work with Susan.*)
li gel êk together (Em li gel êk dixwînîn. *We study together.*)
li hana … help (Li hana min were! *Help me!*) (Ez li hana te hatim. *I helped you.*)
li hindav (1) over (Teyare li hindav avê bî. *The plane was over the water.*)
(2) above (Tavê li hindav me ye. *The sun is above us.*)
li hîvîê bîn, li hîvîê bibe to hope (Ezê li hîvîê me ez biçim Kurdistanê. *I'm hoping to go to Kurdistan.*)
li kêrê where (place) (Dihî siḧarê tu li kêrê bî? *Where were you yesterday morning?*)
li nav (1) with
(2) among (Şivanê li nav pezê xwe. *The sheperd is among his sheep.*)

li nav … da (1) among
(2) in (Ez bi rê ve çûm li nav befirê da. *I walked in the snow.*) (Gul yê li nav ḧedîqê da. *The flowers in the garden.*)
li nav … ra (1) through (Qîtar li nav çî ra diçit. *The train goes through the mountains.*)
(2) in
li navbeyna … da negotiator / mediator (Çîmen li navbeyna me da bî. *Çîmen was our negotiator [for the marriage arrangements].*)
li nik (1) to
(2) with (Rêsanê li nik me ye. *Rêsan is with us.*)
(3) near (Ew li nik min rîniştl. *He sat near me.*)
li nîva … da (1) between (Darê li nîva her dû xanîa da. *The tree is between the two houses.*)
(2) among (Ez rîniştim li nav gula da. *I sat among the flowers.*)
li pêş … ve (1) across from (Ez li pêş televizîûnê ve rîniştim. *I sat across from the TV.*)
(2) in front of (Mala me li pêş mala we ve ye. *Our house is in front of your house.*)
li pêşîa (1) in front of (Ew li pêşîa hevalê xwe rînişt. Ew li pêşîa min diçû. *He walked in front of me.*) (Kî li pêşîa min e? *Who is in front of me?*)
(2) before
li pişt behind (Ew li pişt hevalê xwe rînişt. *He sat behind his friend.*) (Qelem li pişt min e. *The pen is behind me.*)
li rexê next to (Pîng li rexê dîwarî ye. *The peppermint is next to the fence.*)
li ser (1) on (Kêrik li ser mêzê ye. *The knife is on the table.*)
(2) over (Teyar firrî li ser bajêrrî. *The plane flew over the city.*)
(3) above (Risim li ser 'eynê ye. *The picture is above the mirror.*)
liḧafe (f) decorative scarf (Ez liḧafê dê êxim ḧefka xwe. *I'll take off the scarf from my neck.*)
liḧefka ser textî (1) bedspread [thick]
(2) quilt
(3) comforter
ling leg
lista xanî lease (contract for rent)
livîn, bilive (1) to move (Ne live! *Don't move!*)
(2) to fidget (Tu çend dilivî. Dê bes xwe bilivîne. *You sure do fidget a lot. Stop fidgeting!*)
(3) to work
lîfik (m) (1) sponge (lîfkê îsfenc *sponge*)
(2) washcloth
lîra coin

lîsîn, bilîse (1) to perch (Teyr lîsîn ser hêlîna xwe. *The bird perched on his nest.*)
(2) to roost (Mirîşka me lîsî li cihê xwe. *Our chicken roosted in her place.*)
lubî(k) (f) green bean
lulu (f) pearl
lûqinte (f) restaurant (Em çûîn lûqintê. *We went to the restaurant.*)
lûrî (f) truck

m

ma [question particle] (Mat tu nizanî evroke me xwandinê hey? *Don't you know we have a lesson today?*) (Ma çi ye? *What is it? / What of it? / No problem.*)
ma'kerunî (f) noodles
ma'rez (f) store [large] (ma'rez ya seyare *car dealership*) (ma'rez ya qenepa firoşin *a store that sells couches*)
maç (m) kiss (Maçî ke. *Give [me] a kiss.*)
maçe spade (playing card)
madem because (Şirînahîê ne xwe madem bu te ne baş e. *Don't eat sweets because it's not good for you.*)
maf right (Me çi maf nîne em kesê bikujîn. *We don't have the right to put anyone to death.*)
maḧfîr (f) rug [put on top of other rugs or wall-to-wall carpet]
maḧfîrka ber pîa bath mat
maîu swimming suit
mal (f) (1) family (Mala te çawan e? *How's your family?*)
(2) house [home] (mala pîra *nursing home*)
(3) descendant (ji bine mala Harunî *a descendant of Aaron*)
mala xwe bar kirin, mala xwe bar (bi)ke to move (Rêsanê mala xwe bar kir. *Rêsan moved to another house.*)
mala xwe birin, mala xwe bibe to move (Mala xwe bir Texas. *(She) moved [her home] to Texas.*)
maliştin, bimale to sweep
mam (m) uncle [paternal]
Mam u Zîn ancient romantic Kurdish legend
mamik (f) riddle (Min mamkekê hey. *I have a riddle [to tell you].*) (Babê min gelek mamkêt xweş bu me digotin. *My father told us a lot of great riddles.*)
mamosta (m/f) (*see* mamusta)

mamusta (m/f) (1) teacher (mamustaêt desturî *teachers of the (Jewish) law*)
(2) expert
(3) manager
(4) supervisor
man (f) stay (Dumahîka mana min … *At the end of my stay …*)
man bi … ve, bimîne bi … ve to take pity on [someone or something] (Dilê xudanî ma bi wî kuîleî ve. *The master took pity on that servant.*)
man, bimîne (1) to remain
(2) to stay (Ez dişêm bes piçîskekê bimînim. *I can only stay/sit for a short time.*)
(3) to dwell
mandî weary
mane' (Ar) preventative (e.g., birth control) (Nîaz mane'î dikit. *Nîaz uses preventatives.*)
mango mango
man (li) hîvîa …, bimîne (li) hîvîa … to wait (Ez mînim hîvîa te. *I [can] wait for you.*) (Ew dê mînin li hîvîa min. *They will wait / are waiting for me.*)
mar (m) snake
masî (f) (1) fish (masîa qodîka *tuna*)
(2) tuna
masî girtin, masîa bigire (1) to catch fish (Min dû masî girtin. *I caught two fish.*)
(2) to go fishing (Min masî girt. *I went fishing.*)
masîgir (m) fisherman
masîḧe (f) squeegee
mast (m) yogurt (mastê tîrkî *yogurt cheese*) (Min zilata mastî çêkir. *I made yogurt salad.*)
Maşalla! (Ar) (1) Oh, my goodness!
(2) "what God has willed" [said when complimenting someone to avoid being jealous and to avoid the evil eye; also said when amazed (e.g., at seeing a woman with 13 children)]
(3) (*see also* ḧêl)
matursigil (f) motorcycle (Bilind li ser matursigilê sîar bî. *Bilind rode the motorcycle.*)
mav right?? (Ma min mav nîne ewê bikem ewa min divêt di malê xwi da? *Don't I have the right to do what I want with my own money?*)
me (1) we [oblique]
(2) us [oblique]
(3) our [oblique]

meθane (f) bladder
meθel (Ar) parable
me'cîn (f) paste (me'cîna didana *toothpaste*) (me'cîna riha *shaving cream*)
me'îde (m) stomach
me'mil (f) factory (me'mila penîrî *cheese factory*) (Li me'mil şul dikit. *He works in a factory.*)
me'n (f) meaning (Me'na 'boy' çi ye? *What is the meaning of 'boy'?*)
me'sîat (f) disobedience (… çinko ewana me'sîate Xwedê kirin *… because they disobeyed God*)
me'tîfal kirin, me'tîfal bike to celebrate
mebileẍ (m) (Ar) expense (Mebileẍê vî qemîsî kêm e. *My expense for this shirt was only a little.*)
mebîrθ ovary
meca'e (f) famine (Li Efrîqîe meca'e ye. *Africa has a famine.*)
mecbur (1) forced to
(2) have to (Mecbur e. *It has to be done.*) (Ḧikmetê pare ne da min. Jiber hindê ez mecbur bîm min şul kir. *The government didn't give me any money. Therefore I had to work.*)
(3) must (Lazim e tu Inglîzî bi'elimî. *You must learn English.* Ez mecbur im. *Yes, I must.*) (Mecbur e. *It has to be done.*)
(4) obliged to
(5) should
(6) ought to
Medîn (f) Medina [city in Saudia Arabia] (Muhammed mir li Medînê. *Muhammed died in Medina.*)
medîr naḧîe (m) governor [of a big village]
medrese (Ar) (f) school (Bilind nubedar e li medresa Hanaê. *Bilind is a guard at Hana's school.*) (Te çend sala li medresê xwandî ye? *How many years have you studied in school?*)
mefireze (f) check point (Li mefirezê mirov teftîşt dikin. *At the check point the people (cards) are inspected.*)
mehkeme courthouse
meḧil (m) (1) community / neighborhood (Tu li kîş meḧlê bî? Aşê Çemî bî. *Which neighborhood were you from? Aşê çemî.*) (Mala min yê li qolaça meḧlê ye. *My house is on the corner of the community.*)
(2) (*see also* menteqe)
meî wine ??
mejî (m) brain
mejî ḧişik (1) unintelligent
(2) stubborn
(3) stupid

Mekeh (f) Mecca [city in Saudia Arabia] (Muhammed li Mekehê Xwedê daî. *Muhammed was born in Mecca.*)
mekîne (f) machine (Te mekîna diryarê heye? *Do you have a sewing machine?*)
(Mekînê cab da. *The answering machine "answered" the phone.*)
(mekîna şerbetê *blender*)
(mekîna diryarê / cilka dirî / mekîna xeyatîe *sewing machine*)
(mekîna dewî *mixer for making yogurt drink*)
(mekîna goştî *meat grinder*)
(mekîna deramet *food processor*)
(mekîna kêkê *electric mixer*)
(mekîna qodîk vekirnê *can opener*)
(mekîna riha *electric shaver*)
mektebe (f) (1) office
(2) school
(mekteba e'dadî *high school*)
(mekteba ewilî *elementary school* (sefa êkê ḧeta sefa şeşê *first grade through sixth grade*)
(mekteba mîhenî *adult school*)
(mekteba navincî
(a) *middle school*
(b) *junior high school*
(mekteba senawî *junior/senior high school* (sefa 7-12 *7th through 12th grades*)
(mekteba şevê *adult school*)
(3) bookcase
(4) library (mektebe'am *general library*) (Mektebe girtî bî. *The library was closed.*)
mektub (m) (1) letter [correspondence] (Xiludê bu min mektub virrêkir. *Xilud sent me a letter.*)
(2) mail
mel'în devilish
melaîket angel [preferred for Zaxo Kurds]
melaq kirin, melaqî bike to flatter (Melaqî dikit şulek ji te divêt. *She's flattering you because she wants something.*)
melel çê bîn, melel çê bibe to be bored [people] (Bu min melel çê bî. *It was boring for me. / I was bored.*)
melik (m) king (Berê li Îraqê melik bî. *A long time ago there was a king in Iraq.*)
melîk (m) king
melîka (f) queen

melîl (1) sad / depressed (Jiber babê Sîarî em melîl în. *We're sad because of Sîar's dad [who has cancer].*)
(2) low-spirited
melîtik apron
memer hallway
memik (m) (1) nipple (Çira şirî navexwit jiber em memkî nadînîn. *Çira won't drink the milk because we don't give her a bottle with a nipple.*)
(2) breast (Ha memkê min bixwe. *"Eat my breast." = Come nurse. [said by a mother to her baby])*
memleket (f) (Ar) kingdom (memleketa melikî paşaî *the kingdom of the king*)
memnun (1) thank you (gelek memnun *thank you very much*)
(2) thankful
mena'e (Ar) immunity (Wê mena'e yê hey ew dermanî bixwit. *She has an immunity [to the germs] so she doesn't have to take the medicine.*)
menceluk (f) small bucket
mendehuş (1) astonished
(2) excited (afraid)
(3) crazy / insane / mentally off
menteqe (f) (Ar) (1) city [region / area] (Hevala te li kîş menteqe ye? Yê li Springfield. *Which city is your friend from? From Springfield.*)
(2) (*see also* meḧil)
menteş (f) gold necklace [covers the whole chest] (menteşa lîra *gold necklace*)
meqabile opposite from (Ez u tu meqabile êk în. *You and I are opposite from each other.*)
meqabilî (1) across from (Ew meqabilî min rînişt. *He sat across from me.*) (Mala me meqabilî avê ye. *Our house is across from the water.*)
(2) opposite from
meqadîr (Ar) ingredients (Çi ye meqadîr kêke? *What are the ingredients in cake?*)
meqere (f) fort [army] (Meqerê peşmergê li mifireqa Maltaê. *The peshmerge fort is in the region of Malta [and looks out for it].*)
meqes scissors
meqesuk lobster
meqlub (f) vegetables with tomato rice
meqsed (f) (1) aim
(2) desire (wish) (Meqseda min ez siḧa te bikim. *My desire is to see how you're doing.*)
merd generous

merdane generous
mereq (1) neither happy nor sad
(2) motivated (Ez bê mereq im. *I'm not motivated.*)
mereq (f) (1) hope (Mereqa min e: ez Inglîzî bizanim. *My hope is this: that I know English.*)
(2) aim
(3) motive (Mereqa min ez biçim Zaxo. *My motive is to go to Zakho.*)
mereqçî curious
mereqdar nosey
merg valley
merkezê şertê police station / center
mermer marble [the stone]
merr (f) trowel
merrbêl (f) trowel
Merrḧeba! Hello!
Meryem Mary
mes'et elevator
mes'ul (m) director
meseluk (f) parable
Mesîḧ (m) Messiah
Mesîḧî (1) Christian (nominal or evangelical)
(2) (*see also* bawer kirin)
mesrref (f) bank
mestere (f) ruler (Te mestere heye? *Do you have a ruler?*)
mesters M.A. degree
met (f) aunt [paternal]
met'em (f) restaurant (Em çûîn met'emê. *We went to the restaurant.*)
metar (m) (1) airport
(2) rubber
metat stretchy (Kirasê min metat e. *My dress is stretchy.*)
metbex (f) kitchen
metfînî (f) (1) stew (Min birinc u metfînîê çêkirî. *I made rice and stew.*) (metfînîa fasolîa *white beans in tomato soup*)
(2) soup that is made with a tomato soup base
meşhur famous
metir (f) meter
metḧef (f) museum
mewalîd (f) birthday (Mewalîda te çend e? *When is your birthday?*)
mewzu' (m) (1) topic (Mewzu'ê me ser telefonê bî. *Our topic was "on the telephone."*)

(2) subject (Mewzu'ê evro zimanê Inglîzî bî. *The subject for today was English.*)
mexel hatin, mexel bê (were) to lay down and doze [animals] (Çêl mexel hat. *The cow laid down.*)
mexelele (f) red pickles: radishes, cabbage, beets
mexzen (f) (Ar) (1) closet
(2) storage place
Meẍreb Morocco
meẍreb (f) dusk (evro meẍreb *today at dusk*)
meẍsel (f) sink (Meẍwel xetimî. *The sink is stopped up.*)
meydank (m) open area (Dê dawetê deynin li meydankekî mezin. *They'll have the wedding in a large open place.*)
meymînk (f) monkey
mezaxitî spent??
mezbeḧ swimming pool (Tu dê çî ser mezbeḧê kevî avê? *Will you swim in the swimming pool?*)
mezbît reliable (Fatima mezbît e. *Fatima is reliable.*)**qowet** strong
mezel(ik) (f) room (Te çend mezel hene? *How many bedrooms do you have?*) (mezelka zêde li ser banî *attic*) (mezelka qîtî *storage place*) (mezelka cilik şîştinê *laundry room*) (mezela mêhvana *living room [formal]*) (Herre mezelka xwe. *Go to your room.*)
mezherî (f) vase
mezin (1) old/elderly (Deyka min mezin e. *My mother is elderly.*)
(2) large (Ev xanîe mezin e. *This house is big.*)
(3) great
(4) important (zelamekî mezin *an important man*)
(5) wide
(6) adult
mezin bîn, mezin bibe to grow up (Wextê tu mezin bî … *When you grow up …*) (Ez li Texas mezin bîm. *I grew up in Texas.*)
mezinatî (f) (1) greatness
(2) importance
(3) seniority
(4) pride (Fatimaê mezinatî yê li nik heye. *Fatima has pride / is proud [in a bad way].*)
(5) old age (Çend mezinatî ne xweş e! *Old age is awful!*)
(6) size
meztir (1) older (Xoşka min meztir e ji min. *My sister is older than I am.*)
(2) larger
(3) greater
mê (f) female

mêhvan (m/f) guest
mêhvan kirin, mêhvan bike to invite (Ez kirim mêhvan. *I was invited.*) (Min mêhvan kir. *I invited [her].*) (Ez mêhvan kirim ser xwarinê. *I was invited for dinner.*)
mêjan, bimêje to chew (Van ḧabka bimêje. *Chew these tablets.*)
mêju (f) history (mêjua Kurda *the history of the Kurds*)
mêlaka reş (f) liver
mêr(ik) (m) (1) husband (mêrê min *my husband*) (jin u mêr *husband and wife*)
(2) man (mêrkê befirê *snowman*) (mêrkê ḧisêbê *cashier*)
mêrê xoşk brother-in-law [husband of my sister]
mêrg (f) farm
mêrhiçk chicken pox (Eve mêrhiçk in. *These are chicken pox.*)
mêrî (f) ant
mêş (f) (1) highlights in hair (Pirrça min mêş kirî ye. *My hair has [bleached] highlights.*)
(2) fly
(3) bee (mêşa hîngivînî *honeybee*)
mêwîj (f) raisin (Te mêwîj hene? *Do you have any raisins?*)
mêze (f) (1) table (mêza xwarinê *dining table*)
(2) desk
(3) coffee table
mi'amilet (f) contract (Min erdek kirî; ezê êm mi'amileta wê çêkim. *I bought a piece of land; I'm writing up the contract.*)
mi'awinê midîrî administrative assistant
mi'elim (m/f) (1) teacher [primary; general]
(2) rabbi
mi'ezum invited (Şirîn nik me mi'ezum e. *Sirîn is invited to come [to our house].*)
mi'ezum kirin, mi'ezum bike to invite (Tu dişêî Fatimaê mi'ezum bikî? *Can you invite Fatima?*) (Ez mi'ezum kirim. *I was invited.*)
mi'temer (f) (1) meeting
(2) conference (Ez dû roja çûm mi'temer hebîn. *I went to conferences two days.*)
mi'yene (f) (Ar) medical examination (Dixtur mi'yena mi kir. *The doctor gave me a medical exam.*)
micamîde (f) (Ar) freezer
micele (f) magazine
mideris (m) teacher [high school]
miderîse (f) teacher [high school]
midîra (f) (*same as* midîr)
midîre (m) (1) manager (midîrê da'îrê *office manager*)
(2) headmaster

(3) supervisor
(4) principal
(5) director
mifaci' (f) surprise (Amy bu min ḧeflek mifaci' çêkir. *Amy threw a surprise party for me.*)
mifaci' kirin, mifaci' bike to surprise (Pêḧesîna wî ez mifaci' kirim. *His reaction surprised me.*)
miferedat gold bracelet bangles
mifireq (f) region [city] (Meqerê peşmergê li mifireqa Maltaê. *The peshmerge fort is in the region of Malta [and looks out for it].*)
mih (f) ewe
mihaθe city hall (of a big city)
mihendis (m) engineer
mihensis (m) architect
miḧacir bîn, miḧacir bibe to immigrate
miḧafeze (f) (Ar) (1) state (Miḧafeza Dihukê gelek mezin bî. *The state of Dohuk was really big.*)
(2) prefecture
(3) province (Miḧafeza Dihukê mezin e. *The province of Dohuk is big.*)
(4) governate
miḧafiz (f) governor [of a province]
miḧamî (m) lawyer
miḧasib (m) accountant
miḧate qîtarê train station
miḧecele (f) balcony
miḧrar (f) thermometer (for checking a fever) (Miḧrarê bîne. Ḧerareta wî bigire. *Bring the thermometer and check his fever.*) (Reqemê miḧrarê wî çend e? *What's his temperature?*)
miḧtac (m) (Ar) need (Min miḧtacî heye. *I have a need.*) (Min miḧtacî heye. *I have a need.*) (Ez miḧtac im! *Help me!*) (Ez u tu miḧtacî êk u dû ne. *You and I need each other.*) (Ez miḧtacî para me. *I need our money.*) (Ez miḧtacî cilkek te me. *I need your clothes.*)
miḧterem (Ar) gentle (Ew miḧterem e. *She's gentle.*)
mij foggy (Evroke dinya mij e; ez taze nabînim. *It's foggy today; I can't see very well.*)
mij (m) fog
mijîl busy (Telefon mijîl e. *The phone's busy.*)
mijîlank (f) eyelashes
mikader disaster
mike'eb (Ar) (f) (1) cube
(2) cubicle
mikeyif conditioner (for hair)
mikîac makeup (Min mikîac deyna. *I put makeup on.*)

mil (m) (1) shoulder (Milê xesîa Dilnazê yê şikestî. *Dilnaz' mother-in-law's shoulder is broken.*) (Milê wê betal bî. *Her shoulder didn't work.*)
(2) side (Em hatîne milê Tirka. *We got to the Turkish side of the border.*)
milewin (Ar) colorful
milîmetir (f) millimeter
millet (m/f) (1) people (Ew ji milletê Kurda ye. *He is of the Kurdish people.*)
(2) ethnic group
milyaket angel
milyon (f) one million
min (1) I [oblique] (Min tu dîtî. *I saw you.*)
(2) me [oblique] (Bu min bîne. *Bring it to me.*) (Wê kêk da min. *She gave me the cake.*)
(3) my [oblique] (biraê min *my brother*)
minasebe (f) occasion (Ji ber minaseba Cejina Newrozê, emê çîne seyranê. *Because of the occasion of Newroz, we will go on a picnic.*)
minasib (1) suitable
(2) appropriate
Mincemîde Cinubî Antarctica
minewim (m) drugs that make you drowsy [they contain *muxedir*]
mine∂ame (f) (Ar) relief organization (Tu li kîş mine∂emê bî? *Which relief organization did you work for?*)
miqabilî face to face (Ez miqabilî te rînîştî me. *I was sitting face to face with you.*)
miqawe (f) cardstock (thick paper)
miraheq adolescent (Heriş kurrkeki miraheq e. *Heriş is an adolescent.*)
mirarî (f) opal (?)
mirebe (f) jam (Min mireba mişmije çêkirî. *I made apricot jam.*)
mirebe' (f) (Ar) square
mirebî (Ar) babysitter
mireteb (1) neat
(2) tidy
mirin, bimre (1) to die (Hevalê min mir. *My friend died.*) (Heker ew çû ba dixturî, ne dimir. *If she had gone to the doctor, she wouldn't have died.*)
(2) to become soft [cooked food, pickles]
mirî dead [people, animals] (mirovê mirî *dead person*)
mirîşk (f) (1) chicken
(2) hen

mirov (m/f) (1) man
(2) person (Ev mirove baş e. *This person is nice.*)
(3) human
(4) relative (Ew mirovê me ye. *He's our relative.*)
mirrahiq (m/f) teenager
mirtaḧ (Ar) (1) relaxed
(2) refreshed
(3) not worried
(4) comfortable
(5) restful [people, situations]
mirtebik nervous
miruv (m/f) (*see* mirov)
misa'edê midîrî administrative assistant
misaḧe (f) eraser (for a pencil or blackboard)
misaḧe kirin, misaḧe bike to erase
misawir photographer
misecil cassette tape player
miseles (Ar) triangular
miseles (Ar) (f) triangle
miselsel TV series (Ev miselsele li Misrê êkirîne. *This TV series is made in Egypt.*)
Misir (f) Egypt (Ev miselsele li Misrê êkirîne. *This TV series is made in Egypt.*)
misiran ile'wer (Ar) appendix
misran appendix
mistaf tourist
miste'mire (Ar) (m) colony
mistetîl (Ar) rectangular
mistetîl (Ar) (f) rectangle
mit mum; not talking (Ez mit bîm. *I was mum [I didn't tell anyone].*)
mit bîn, mit bibe (1) to be quiet
(2) to keep silent (Demê ez mit bîim … *When I kept silent…*)
mitewasîte (Ar) (1) middle school
(2) junior high school
mişar (f) saw (Te mişar heye? *Do you have a saw?*)
mişar kirin, mişar bike (1) to sharpen (Kerika xwe mişar ke. *Sharpen your knife.*)
(2) to saw (Pêpkê kursîka xwe mişar ke. *Saw your chair leg.*)
mişeḧ flowing (xwîneka mişeḧ *flowing blood*)
mişekel ?? (Fatima xwarina mişekel çêkir bî. *Fatima made Middle Eastern foods.*) (Emrîke mişekel mirovêt lê ne. *America has people from everywhere.*)

mişeweş kirin, mişeweş bike to be confused
mişin orange soft drink
mişk (m) mouse (Mişkekê li mala me. *There's a mouse in our house!*)
mişkîle (f) problem (Te mişkîlekê hey? Ne, min çi mişkîle nînin. *Do you have a problem? No, I don't have any problems.*)
mişmije (f) apricot
mitirb (m) musician [Kurdish flute / drum player]
mize just right (not sweet, not sour) (Enenas mize ye. *The pineapple is just right.*)
mizemid (m) nurse [male]
mizgeft (f) mosque [small] (Leqman çû mizgeftê. *Leqman went to the mosque.*)
mizgînî (f) [good] news (mizgînîa xweş *good news*) (mizgînîa ne xweş *bad news*) (Min mizgînî da babê xwe. *I told my father the good news.*) (Mizgînîa mil te! Xoşka te şî kir! *Good news for you! Your sister got married.*)
mî hair [when talking about just one or two hairs] (Mîek dî hirve were. *Come a hair closer.*)
mîkro microwave oven
mîl (m) mile
mîrat (m) inheritance [things which belonged to people who have died; the things are given to the poor or to relatives] (behira min ji mîratî *my share of the inheritance*) (Ev tişte mîratê mala pismamê min e. *These things belonged to my cousin's family.*) (Bapîrê min wextê mirî, mîratê xwe ser me lêk vekir. *When my grandfather died, his things were given to us.*) ($4000 ji mîratê bapîrê min geheştin min. *$4000 was given to me as an inheritance from my grandfather.*)
Mîsil (f) Nineveh
mîtro subway
mîz (f) urine (Mîza min têt. *I have to go to the bathroom.*)
mîz kirin, mîz bike to go to the bathroom (Te mîz kir? *Did you go to the bathroom?*)
mîzanîa kehrebê fuse box
mîzanîa ẍazê gas meter
mo'ed appointment (Min mo'ed li gel dixturî yê hey. *I have a doctor's appointment.*)
moberîde (f) (1) swamp cooler
(2) air conditioner (Moberîde tamirandî çinko dinya sarr bî. *The air conditioner is off because the weather is cold.*)
mohîm important (Ev derse gelek mohîm e. *This lesson is really important.*)

moxel kirin, moxel bike to sift (Ezê arî li moxelê dikim. *I'm sifting wheat.*)
mu'îd (m/f) teacher [college]
mu'imin believer (Ez mu'imina 'Îsaî im. *I'm a believer in Jesus.*)
muafeqe (f) agreement
muceb positive [pole]
muçik (m) ladle (large) used for cooking for crowds
mudêla cilka model
muhacir (m/f) refugee (Ez muhacira sîasî me li Emrîka dijîm. *I'm a political refugee living in America.*)
Muhammed Muhammed
muhmil lazy (Hevala min muhmil e. *My friend is lazy.*)
mumeθil actor
mumil (1) boring (Ev kitêbe gelek mumil e. *This book is really boring.*)
(2) unpleasant
mur (f) myrrh
murik (f) costume jewelry
murted convert (Ew murted e. *He's a convert [to our religion].*)
Musa Moses
mutedeyin faithful to God (Ev mirove mutedeyin e: ew bîre navexwit, cilkêt rîz nawergirit. *This person is faithful to God: he doesn't drink beer and doesn't wear immodest clothing.*)
muşextî (m/f) asylee [political refugee]
mutî' (Ar) (1) obedient
(2) submissive
mutrip musician [vocalist / singer]
muwelîde (f) generator
muxedir (m) illegal drugs
muxtar (m) governor [of a small village]
muxteber (f) laboratory
muẍenî singer
muz (f) banana

n

naciḧ successful (Tu naciḧ î di jîana xwe da. *You're successful in your life.*) (Ez naciḧ ne bîm di imtîhanê da. *I wasn't successful in the test.*)

nadîe (1) gym
(2) health club
naf … ra through (Qîtar diçit naf çîaî ra. *The train goes through the mountain.*)
naḧîe (f) big village (e.g., Betufe)
name (f) (1) envelope (Pîlekê li nama xwe bide. *Put a stamp on your envelope.*)
(2) letter / note (Ḧeqê Leqmanîe namekê bu President Bush virrêkit. *Leqman has a right to send President Bush a letter [about this issue…].*)
nan (m) flat Kurdish bread [general term] (nanê sêlê *huge dry, round bread*) (nanê tenîrê *small round, ¼" thick bread*) (Nanî belave ke li ser hejara. *Give the bread to the poor.*)
Nanê Şikeva Passover
nanpêj (m/f) baker
naqis negative [math, blood]
nas kirin, nas ke (1) to know (people) (Tu min nas dikî? *Do you know me [who I am]?*)
(2) to recognize (Min ne nas kir. *I didn't recognize him.*)
Nasire Nazareth
nav (m) (1) name (Navê te çi ye? *What's your name?*) (Navê min Scott e. *My name's Scott.*) (Navê xuxê çi ye bi Inglîzî? *What is the name of peach in English?*)
(navê bab *middle name [father's name]*)
(navê bapîr *last name [grandfather's name]*)
(bi navê Xwedê mezin u mehreban *in the name of God who is great and merciful [said to begin something like a lesson or formal discussion]*)
(2) first name
(3) noun
(4) (*see also* deyk, bab, xala, *and* xalet)
nav duhinî da qelandin, nav duhinî da biqelîne to fry (Mirîşkê nav duhinî da diqelînit. *She's frying the chicken.*)
nav lê kirin, nav lê bike to name (Tu dê çi navê li biçîkê xwe kî? *What will you name your baby?*)
navbeyn (f) marriage (Navbeyna wan xweş e. *Their marriage is good.*)
navbeyna between (navbeyna se'et şeş u se'et ḧeft *between 6:00 and 7:00*) (Feriq navbeyna biçîka wê u kiça wê yazde heyv e. *There are 11 months [difference] between her baby and her daughter.*)
navbeyna … da / de between (Were navbeyna me da rîne. *Come sit between us.*) (Ez navbeyna Amy u te de me. *I'm [sitting] between you and Amy.*) (Xanê ferqo cidahî dikit navbeyna bîkêt xwe da. *Xanê favors some of her daughters-in-law over the others.*)

navçav (m) face (Herre navçavê xwe bişo. *Go wash your face.*)
navincî medium [weight, height, cooking pot, nose, clothes]
navî second child (Navîê Adarê kî ye? Heval e. *What's the name of Adar's second child? Heval.*)
navteng (f) waist
ne no (Ne, rastî, ne! *No! [emphatically]*)
ne baş bad [things]
ne baştir worse [things]
ne bê xem (1) concerned
(2) thoughtful
ne çêkirî raw [meat]
ne delal ugly [people and things]
ne edeb impolite
ne geheştî not ripe
ne jin înaî not married [men]
ne kîvî pet / domestic (Pişîkêt min ne kîvî ne. *My cats aren't wild; they're pets.*)
ne lêkdaî (1) disorganized
(2) messy
ne liber xwe bi tinê thoughtful
ne mir eternal (Bes Xwedê ne mir e. *Only God is eternal.*)
ne mirtaḧ uncomfortable [people, situations]
ne paqij smoggy
ne rastî false (beta ne rastî ne *false [wooden; not live] ducks]*)
ne reḧet uncomfortable [people, situations]
ne sax sick
ne taze ugly [people and things]
ne tebitî (1) devilish
(2) wily
(3) deceitful
ne temam incomplete
ne şî kirî not married [women]
ne ştî different from (Tu ne ştî wê î. *You are different from her.*)
ne wek different from (Şirîn ne wek Dilnazê ye. *Şirîn is different from Dilnaz.*)
ne xeter safe
ne xêr it's not true
ne xilas incomplete (Qamusê min ne xilas bî. *My dictionary was incomplete.*)
ne xweş (1) bad [person, place]
(2) uncomfortable [things]

(3) boring [things] (Ev kitêbe gelek ne xweş e. *This book is really boring.*)
ne xweştir worse [person, place]
ne'na (f) a kind of spice
necar (m) (Ar) carpenter
necde emergency office (Min telefuna necdê kir wextê agir ber bî mala me. *I phoned 911 when our house was on fire.*)
nefer (m/f) passenger (Neferêt min gelek in. *I have a lot of passengers.*)
nefes (f) (Ar) (1) breath
(2) soul
nefes înan der, nefesa xwe bîne derê to exhale (Ez nefesa xwe înim derê. *I exhale.*)
nefesa xwe kêşan, nefesa xwe bikêşe to inhale (Min nefesa xwe kêşa. *I breathed in.*)
nefî kirin, nefî bike to be exiled (Ocalan nefî kirin. *Ocalan was exiled.*)
neh (f) nine
neheng crocodile
nekte nekte spots
nepenî secret (bi nepenî *in secret*) (ewê dibînît nepenîa *who sees what is done in secret*)
neqil time? (ḧeftîê neqlekê *[only] once a week*) (ḧeftîê dû neqla *twice a week*)
neqiş (m) (1) embroidery (Ew neqişî dizanit. *She knows how to embroider.*)
(2) etching
neqiş kirin, neqişî bike to embroider (Ez neqişî dikim. *I'm embroidering.*)
nerim (1) soft
(2) slow (laid back)
nerim bîn, nerim bibe to become soft (for cooked food, pickles, etc.) (heta nerim bitin *until it's soft*)
nesaxî (f) (1) illness / sickness (nesaxîa dilê *heart disease* - Wê nesaxîa dilê da hey. *She has heart disease.*) (nesaxîa şekirê *diabetes*)
(2) fatally ill people (Êşa nesaxîa kete di nav milletê. *The pain of the fatally ill was felt by the people.*)
nesîb (m) (Ar) fate [especially in regards to money and a spouse] (Nizar nesîbê min bî. *Nizar was my fate [for a husband].*)
nesîḧet (f) advice
neskafê coffee [instant]

nestele (f) chocolate bar / candies
netewe pagan
neşle (m) flu (Neşle li min e. *I have the flu.*) (Neşle ji min çû. *I don't have the flu any longer.*)
netîce (f) result (Evro min netîca imtîḧana xwe stand. *Today I got the result of my [academic] test.*)
nevî (m/f) grandchild (nevî çîçirk *great grandchild*)
new (m) noun
Newroz (m) March 21 holiday [Kurdish independence]
nexirî first child
nexit (m) money (Hîn dê şulêt kiçê pêk înin ji nextî. *You will fulfill the girl's desires for money.*)
nexweşî (f) trouble (Ew ji hemî nexweşîêt wan qurtal diket. *He saves them from all their troubles.*)
neylon plastic (neylonê mêzê *tablecloth*) (lepikêt neylon *rubber gloves*)
neylun (*see* neylon)
neynuk (f) (1) fingernail
(2) toenail
neynukêt xwe buyaẍ kirin, neynukêt xwe buyaẍê bike
to polish one's nails
nezan (1) ignorant (Ew mirov nezan e. Çi tiştî nizanit. *That person is ignorant; he doesn't know anything.*)
(2) uneducated
(3) inexperienced (Ey nezan! *You ignoramous!*)
nezer (f) eyesight (Nezara wî kêm e. *His eyesight is poor.*)
nêçîr (f) hunting (Ez çûm nêçîrê. *I went hunting.)*
nêçîrvan (m) hunter
nêr (m) male
nêzîk near (Mala me nêzîk mala Dilnazê ye. *Our house is near Dilnaz's.*)
nêzîkî (1) near (Ez li ḧeflê nêzîkî te bîm. *I was near you at the party.*)
(2) like (Xwarina min nêzîkî ya deyka min? *Is my food like my mom's?*)
ni'al (f) (1) (house)slipper
(2) flip flops
nifir(în) (f) curse (Nifirîna min bi cih hat. *My curse happened.*)
nifir(în) lê kirin, nifir(în) lê bike to curse (someone) (Min nifirîn li Sedami kirin. *I cursed Saddam.*)
niha now
nihal (f) valley

niho (1) now
(2) at once
nik (1) with
(2) to (Tu buçî naçî nik meta xwe? *Why won't you go to [visit] your aunt?*) (Ew hat nik me. *He came to us / our house.*)
nimire degree (Te çi nimire heye? *Which degree (from college) do you have?*)
nişîv kirin, nişîv bike (1) to throw up
(2) to vomit
niştîmanî national/ethnic (Stranêt niştîmanî yêt stran bi Şivan gelek xweş in. *National songs, especially those sung by Şivan, are wonderful.*)
nivandin, binvîne to put to sleep / to bed (Min nivand. *I put her to bed / to sleep.*)
nivêj (f) prayer (Nivêja 'îda feriq e ji nivêjêt me yêt her roj em dikîn. *The holiday prayer is different from the everyday prayer.*
nivêj kirin, nivêjê bike to pray (Deyka min çû nivêjê bikit. *My mother went to say her prayers.*)
nivêjker (m/f) person who prays (Ez nivêjker im. *I'm a pray-er.*)
nivistin, binve to sleep (Deyka te nivistî ye? *Is your mother sleeping?*) (Ez nivistinekî kîr nivisti bîm. *I slept soundly / like a rock.*)
nivîser (m/f) (1) writer
(2) author
nivîsîn, binvîse (1) to write
(2) to print
nivîsîngeh (f) office (Ez çûm nivîsîngeha Gare. Min hindek şulêt xwe çêkirin. *I went to the Gare office and did some work.*)
nixaftin, binxêve to cover (Min nixaft. *I covered it [e.g., the yogurt].*)
nizim (1) low [to the ground]
(2) short [things] (Banê me nizim e; dara he bilind e. *Our roof is short/low; the tree [out there] is tall.*)
nîkaf (m) lymph node (Nîkafê ya girtî. *Her lymph node is swollen.*)
nîkafe mumps
nikil (1) beak
(2) bill (of a bird)
nî new (Kirasê min nî ye. *My dress is new.*)
nî hatî fresh [seafood]
nîasîn, nîase (1) to know [people] (Tu wê dinîasî? *Do you know her?*)
(2) to recognize (Ez dê çawa te nîasim? *How will I recognize you?*)
nîjên kirin (f) renewal

nîne (1) none (Min nîne. *I have none.*)
(2) one [negative] (Min nîne. *I don't have one.*)
(3) (*see also* hebîn, hebe)
nînin (1) none (Min nînin. *I have none.*)
(2) any [negative] (Min nînin. *I don't have any.*)
(3) (*see also* hebîn, hebe)
nîro noon
Nîsan (f) April
nîsk (f) lentils (Min nîsik çêkir. *I made lentils.*)
nîşa … dan, nîşa … bide (1) to show (Neqşî nîşa min bide. *Show me how to embroider.*) (Rêka mala wê nîşa min bide. *Show me the way to her house.*)
(2) to teach (Dersa nîşa min bide. *Teach me the lesson.*)
(3) to disciple ('Îsaî nîşa wan da. *Jesus discipled them.*)
nîşan (f) (1) kind (bu nîşan *according to its/their kind*)
(2) symbol
(3) mark [freckle, rash, mole]
(4) beauty mark
nîşan dan nav … da, nîşan bide nav … da to tour (Nîşa mi bide nav White House da. *Give me a tour of the White House.*)
nîşan kirin, nîşan bike (1) to mark
(2) to point (Nîşan min bike. *Point to it for me.*)
nîşana birînê scar (Nîşana birînê li destê Şirînê. *Şirîn has a scar on her hand.*)
nîşana seyr miracle (Eve nîşana seyr ya dûê bû 'Îsaî kirî piştî derkeftina wî ji Yehudîê. *This was the second miracle that Jesus did after he left Judea.*)
nîşanî engagement party where the groom's relatives present part of the bridewealth to the bride
nîv (m) (1) half (nîv nîv *half-empty/full*) (nîva şevê *midnight*)
(2) one-half
nîva between (nîva şeş dular u heşta *between $6 and $8*)
nîvişk (m) butter
nîvişk lê dan, nîvişkî lê bide to butter (Nîvişkî gelekê li binê qazanê bide. *Butter the bottom of the pan well.*)
nîvro afternoon (Se'et duzde heta sê nîvro ye. *12:00 - 3:00 is afternoon.*) (Emê nîvro fravînê xwîn. *We'll eat in the afternoon.*)
nîvroj noon
not (f) ninety
nozde (f) nineteen
nubedar (m) guard (Bilind nubedar e li medresa Hanaê. *Bilind is a guard at Hana's school.*)

Nuḧ (m) Noah
nujdar doctor
nuk (f) chick peas
nuke (1) now
(2) at once
nukte (f) (Ar) joke (Nuktekê kenî bu min bêje. *Tell me a funny joke.*)
numune (f) parable
nuqî (1) deep (Min nuqî di avê da ve da. *I dove deep in the water.*)
(2) under water (Min Hana nuqî avê kir. *I put Hana under water.*)
nûqte point (in playing a game) (Te çend nûqte hene? *How many points do you have?*)
nût ninety

o

oda Mom
ode (f) room (oda kewîê *ironing room*) (oda nivistinê *bedroom*) (oda xwarinê *dining room*)
oksicin hydrogen peroxide
orênî (f) howl (orênîa gurga *the wolf's howl*)

p

pa [question particle] (Pa tu zanî cîranek bu me hat? *Do you know a neighbor (from Zakho) came (here)?*)
padişatetî (f) kingdom
paîz (f) (1) autumn
(2) fall
pal dan, pal bide to recline
pale (m) (1) peasant (in feudal societies) (Pale bu aẍaî şul dikin. *Peasants work for the agha.*)
(2) worker (palêt durînê *harvesters*)
panke (f) fan
paqij clean
paqij kirin, paqij bike (1) to clean
(2) to dust
(3) to polish

(4) to scrub
(5) to wipe off
(6) to wash (Amanêt xwe paqij ke. *Wash your dishes.*)
par (1) last year
(2) a year ago
parasî (f) rib (Parasîa Leymînê şikest. *Leymin's rib is broken.*) (Parasîa wê derizî wextê timbela wê di'emî. *Her rib cracked when her car crashed.*)
parçe (f) (1) verse (parça pênc *verse 5*)
(2) piece [of something: land, cloth, meat, etc.] (Kurdistan parçe parçe kirin nav çar welata da. *Kurdistan is divided between four countries.*)
pare (f) (1) money (parêt hîr *change [money]*) (pareêt kaş *cash*) (Te gelek pare hene? *Do you have a lot of money?*) (Min pareêt heyn. Te çi divêt ez bu te bikirim? *I have some money. What do you want me to buy for you?*)
(2) income (Pareêt we di heyvê da çend e? *How much income do you have every month?*)
pare serif kirin, pare serif bike to spend money (Tu çawa pare serif dikî? *How do you spend [your] money?*) (Min dihî pare serif kir. *I spent money yesterday.*)
parê zêrr (m) lawyer
parêz (f) (1) diet (Dê tu parêzê bigirî. *You will change your diet.*)
(2) doctor's orders (Parêz ez çayê navexwim. *The doctor's orders are that I can't drink tea.*) (Ez ne şêm şekirê bixwim. Ez parêzê digirim. *I can't eat sugar; doctor's orders.*) (Tu parêzê ji çi digirî? Ez parêzê ji duhinî. *What can't you eat? I can't eat oil.*)
parîek sandwich (parîek goştî *meat sandwich*)
partî (f) political party (Ez ḧes ji partî demokratî dikim. *I like the democratic party.*)
parzîn (m) large cloth carry-all village women use for babies, food, etc.
pas (f) bus (Ez çûm bi pasê. *I went by bus.*)
paşa king
paşatî (f) kingdom (paşatîa esmanî *the kingdom of heaven*)
paşî (1) then
(2) later (Min erzaq ne maî ye. Paşî ezê çim sîkê kirrim. *I don't have any food left. I'll go to the store later and buy some.*)
(3) after that (Ê, paşî çi lê hat? *So what happened after that?*)
(Paşî ezê te bînim. *After that I'll see you.*)
paşîê last (gelekêt pêşîê dê bine paşîê *many who are first will be last*)
paşîv (f) midnight / early morning meal eaten during Ramadan
pate (m) (1) cloth (patê mêzê *tablecloth*) (patê paqijkirnê *rag*)
(2) sling

patrî (f) battery
pazde (f) fifteen
peḧnîa pê (1) sole [foot]
(2) heel [foot]
peḧtin, bipêje to bake (flat Kurdish bread)
peîsigil (f) bicycle
pelpelîtang (f) butterfly
pembî (m) cotton
pemp (f) pump (pempa edebxanê *plunger*)
penc claw
pencer(ik) (f) window
penceruk claw
penceşêr cancer (Wî penceşêrê hey. *He has cancer.*)
penîr (m) cheese (Penîr dê ḧelit bite zerviçk. *The cheese will melt and become zerviçk.*)
penkrîes (f) pancreas
penterrun (m) pants (penterrunê esqî *overalls*) (penterrunê kewboy *jeans*)
penzîn gas [for vehicles]
penzînxane gas station
peqanin, peqîne to break (Hêkê peqîne. *Break the egg.*)
peqîn, bipeqe (1) to blossom
(2) to explode (Ew pifdanke peqî. *The balloon exploded.*)
perdaẍ (m) drinking glass (perdaẍek mezin *mug*)
perde (f) (1) curtain
(2) drape
(3) hiding place [idiomatic] (Tu perde î bu min. *You are my hiding place / curtain.*)
perde pelav (f) rice with vegetables and meat
perdesun (m) jumpsuit
perestin, biperêse to worship (Dê ew dem êt hîn Babî ne li vî çîaî biperêsin. *A time will come when you will not worship the Father on this mountain.*)
peristgeh (f) (1) temple
(2) synagogue
peristkar worshiper
perr (m) (1) paper
(2) page (Perrê bîst u dûê veke. *Open to page 22.*) (Bizivirrîne perrê sîê. *Turn back to page 3.*) (Min navê xwe dîmahîka perrî nivîsî. (*I wrote my name on the last page.*)
(3) feather (Min evro teyrek tewuz dît; perrêt wî şîn bîn. *I saw a peacock today; his feathers were blue.*)

peruk (f) new fabric / cloth for sewing
perzik pimple (Perzik li ser u çavêt min tên. *I have pimples on my face.*)
peseport (f) passport (Peseporta Hanaê Emrîkî ye. *Hana's passport is American.*) (Wextê peseporta min xilas bî. *My passport is expired.*)
peşêman bîn, peşêman bibe (1) to regret (Ez pêşeman bîm min welatê xwe hêla. *I regret I left my home country.*)
(2) to repent (Bi peşêmanîê nebît. *He does not need to repent.*)
Petrus Peter
pewnd pound [weight measurement]
peykerperês pagan (Ew li dev te bit weku peykerperês u bacgir bit. *Treat him as you would a pagan or a tax collector.*)
peyman (f) covenant
peytext (m) capital (Ar) (f) (Hewlêr peîtextê Kurdistanê ye. *Erbil is the capital of Kurdistan.*)
peyv (f) (1) word (Peyvêt Kurdî ji peyvêt 'Erebî dîar bike. *Separate the Kurdish words from the Arabic words.*)
(2) speech
(3) sermon (Wî peyv xwand. *He read the sermon.*)
pez (f) flock [sheep, goats] (kuxkê peza *sheep pen*)
pez (m) sheep (Pezê me aviz e. *My sheep is pregnant.*) (Min dû pez hebîn. *I had two sheep.*)
pê bi + wî; bi + wê [contraction] (da ez şî pê bikim *in order to marry [with] him.*)
pê (m) (1) leg (Pê min yê çepê gelek diêşit. *My left leg hurts a lot.*) (Pê xwe dîf berka xwe drêj (bi)ke. *Stretch your legs out according to the size of your carpet. "Make do with what you have."*)
(2) foot
(3) paw
pê bawer bîn, pê bawer bibe to trust
pê ḧesîn, pê ḧese to react (Dê çi pê ḧesî heker ew mir? *How will you react if he dies?*) (Wextê dinya sarr, ez pê diḧesim ezê recifim. *When it's cold [my reaction is] I shiver.*)
pê ji … ve instead of
pê ji keftin, pê ji bikeve (1) to progress (Tu pê ji dikevî bi zimanê Kurdî. *You are progressing in the Kurdish language.*)
(2) to develop (Ḧeta dû salê dî Sentera Kurdî dê pê ji kevit. *The Kurdish Center will develop well in a couple of years.*)
pê kirin, pê bike to use (Vê tepkê pê bike. *Use this ball = play with the ball.*)
pê ve with it (touching it)
pê ve girêdan, pê ve bigirêde to clip [with a paper clip]

pê vekirin, pê veke to attach (Min taî bi derzî vekir. *I threaded the needle.*) (Min gul bi singê te vekir. *I attached the flower to the front of your shirt.*) (Min tîp pê vekir. *I taped it together.*)
pê xas barefoot
pêda kirin u pêçan to pour on ??
pêhesa(n) (f) (1) perception
(2) feeling (Piştî wan fêqî xwarî, ew pêhesan rîz bîn; wan şerim kir. *After they ate the fruit, they felt naked and ashamed.*)
(3) know [intuitive] (Xoşka min pêhesa ez ne sax im. Telefona min kir. *My sister knew I was sick; she phoned me.*)
pêḧesîn (f) reaction (Pêḧesîna wî ez mifaci' kirim. *His reaction surprised me.*)
pêk hatin, pêk bê (were) (1) to agree (Yêketî u demukratî pêk hatin. *PUK and PDK came together / made an agreement.*) (Heker dû ji we pêk hatin di her karekî da dawxaza wan çi tişt bit … *if two of you agree about anything you ask for …*) (Li gel wan pêk hat dînarekê bidetê *He agreed to give them a denarius.*) (Ma ez u tu pêk ne hat bûîn ser dînarekê? *Didn't you and I agree that you would work for a denarius?*)
(2) to put together
(3) to make up (with a friend after a fight) ('Îraq u 'Îran pêk hatin sala 1988. *Iraq and Iran made up with each other in 1988.*)
pêk ve together (Em pêk ve çûîn seyranê. *We went to the picnic together.*)
pêlav (f) shoe (Pêlavêt xwe bike pê xwe. *Put your shoes on [your feet].*)
pêle (*see* hêlan, bihêle)
pênc (f) (1) five
(2) nickel
pêncî (f) fifty
pêncşemb (f) Thursday
pêngav foot [measurement]
pêpik (m) leg of furniture (Pêpkê kursîka xwe mişar ke. *Saw your chair leg.*)
pêr day before yesterday
pêstirk (f) (1) fire escape
(2) exit
(3) ladder
pêşî in front of
pêşî (f) (1) beginning (li pêşîê *in the beginning*)
(2) mosquito
pêşîê first (Gelekêt pêşîê dê bine paşîê. *Many who are first will be last.*)

pêşkeftin (f) (1) development (Milletê Kurd pêt di vî pêşkeftinê ye. *The Kurds need development.*)
(2) progress
pêşkêş kirin, pêşkêş bike to offer (Me Şirîn pêşkêş kir. *We offered Şirîn [to Abdulẍenî for marriage].*)
pêşmerge (m) Kurdish guerilla [in the mountains]
pêtivîe bawernamek certificate of divorce
pêẍember (m) prophet (pêẍemberêt drewîn *false prophets*) (Musa pêẍember bî. *Moses was a prophet.*)
pêẍemberatî (f) prophecy (Pêẍemberatîa Îbrahîmî got: Kesek dê êt, dê miruva xilas kit ji gunneha. *The prophecy of Abraham said: Someone will come who will save people from sin.*)
pêẍemberatî kirin, pêẍemberatî bike to prophesy (Bi navê te pêẍemberatî dikir. *We prophesied in your name.*)
pêẍimber (m) prophet
pêzanîn information (Eve pêzanîn sîka Roz. *This is the information from the Ross store.*) (Eve pêzanînêt dixturî ne. *This is the information from the doctor.*)
piçek (1) a little bit (piçek grrovirr *slightly circular / curved*)
(2) a few [amount] (Min piçekêt heyn. *I have a few.*)
(3) a little / some [amount] (Min piçek şerbet heye. *I have some juice.*) (Min piçek xwarin xwar. *I ate a little food.*)
piçek dî after a short time (minutes)
piçipiç little by little
piçîskek a very short time (piçîskek dî *after a very short time [minutes]*) (piçîskekê *for a very short time*) (Ez dişêm bes piçîskekê rînim. *I can only stay/sit for a short time.*)
pidî (pl) gums (mouth)
pif kirin, pif bike to blow (Pif ke agirî. *Blow out the fire (the candles).*)
pifdank (f) balloon
pilak (f) outlet
pilês pliers
piling (f) tiger
pipsî (f) Pepsie
pir (1) full [e.g., a net full of fish] (demê pir buî … *when it was full …*)
(2) (*see also* tijî)
pir (f) bridge (pira delal *the beautiful bridge [also the name of a famous bridge in Zakho, Iraq]*)
pirrç (f) hair (Ew pirrça diqosînit. *She cuts hair.*) (pirrça şêrî *mane [of a lion]*) (Pirrça wê drêj e. *Her hair is long.*)
pirrçem (f) bangs

pirrtir (*see* pitir)
pirteqal (f) orange [fruit]
pirteqalî (m) orange [color] (Kumlekê min pirteqalî ye. *My shirt is orange.*)
pisîar (f) question (Ez tê nagehim pisîara te. *I don't understand your question.*)
pisîara … kirin, pisîara … bike (1) to ask a question (Ez dişêm pisîara te bikim? *Can I ask you a question?*) (Te pisîar kir ka xeste li kîve ye? *Did you ask where the hospital is?*) (Pisîara Sîlavê bike. *Ask Sîlav.*)
(2) to inquire
(3) to interrogate
pisk(u)êt (1) cookie
(2) biscuit
pismam (m) cousin [father's brother's son]
pispis (f) whisper
pispis kirin, pispisê bike to whisper
pitat (f) potato (pitatê sorr *sweet potato / yam*) (Min kotilkêt pitata çêkirin. *I made potato kotilk.*)
pişik (f) chapter (pişka bîst u dûê *chapter 22*)
pişîk (f) cat
pişt (f) back (pişta destî *back of hand*) (pişta serî *back of head*) (pişt u ber *backwards [clothing]*)
piştî after (piştî ḧeftîekê *after a week*)
piştî hîngê (1) then
(2) later (Emê çîn şulî. Piştî hîngê dê çîn sîkê. *We're going to work. We'll go shopping later.*)
(3) after that (Ez çûm mala Canê. Piştî hîngê ezê êm mala we. *I went to Canê's house. After that I'm coming to your house.*)
pitir more (Tu pitir Inglîîzî ji xoşka xwe dizanî. *You know more English than your sister.*) (pitir pitir *most important*)
pitir kirin, pitir (bi)ke to increase
piş (f) lung
pivdank blistered (Kefa destê wî yê bî pivdank ji ber şulî. *The palm of his hand is blistered from work.*)
pîa on foot (Ez pîa çûme malê. *I went home by foot.*)
pîa … kirin, pîa … bike (1) to obey (Roj pîa min ne kir. *Roj didn't obey me.*)
(2) to be submissive (Ez pîa wî dikim. *I'm submissive to him.*)
pîale (f) tea glass
pîanu (f) piano (Pîanu lê bide. *Play the piano.*) (Deyka min pîanuê lê dit. *My mother plays the piano.*)

pîase kirin, pîasê bike to walk (Her roj ez u Amy pîasê dikî. *Amy and I walk every morning.*)
pîç (1) bad
(2) not good
(3) rotten (Ev gîze pîç e. *This walnut is rotten.*)
(4) damaged (Çavka tebaxê pîç bî. *The stove coil was damaged.*)
pîç bîn, pîç bibe to destroy (Seyarê min pîç bî. *My car was wrecked.*)
pîç kirin, pîc bike (1) to abolish (‘Îsaî got, “Ez ne hatîme da ez disturî pîç bikim.” *Jesus said, “I haven’t come to abolish the law.”*)
(2) to damage (Wextê baî u babelîsk hatî, mala me pîç kir. *My house was damaged by the hurricane.*)
pîl stamp (postage) (Pîlekê li nama xwe bide. *Put a stamp on your envelope.*)
pîng (m) peppermint (Min pîng kir di nav kotilkê xwe da. *I put peppermint in the kotilk.*)
pîr (1) old
(2) senior citizen
pîr (f) grandmother (pîra bab *great grandmother [paternal]*)
(pîra deyk *great grandmother [maternal]*)
pîroz (1) sacred (Incîl pîroz e. *The Bible is sacred.*)
(2) holy (Xwedê pîroz e. *God is holy.*)
(3) blessed
pîroz kirin, pîroz bike to bless
pîrt (m) fur (Pirrça xwe bibirre. *Shear your hair.*) (Min pîrtê pezê xwe birrî. *I sheared my sheep’s fur.*)
pîs dirty (Destê min pîs e. *My hand is dirty.*)
pît (f) letters [script; alphabet] (pîta ewilî *initial*) (pîtêt elîfbêtka *alphabet*) (Çend pît in navê te? *How many letters are in your name?*)
(Min pîtêt Inglîzî xwandin. *I read the English letters.*)
pît kirin, pît ke to spell (Bu min navê xwe pît ke. *Spell your name for me.*)
pîta lê dan, pîta lê bide to dial (Min tila xwe pîtêt telefunê da. *I dialed (pushed) the buttons on the telephone.*)
pîte (m) worry (Pîteî bi leşê xwi ne ke. *Don’t worry about your body.*)
pîte kirin, pîte bike to worry
pîtekirin (f) worrying (bi pîtekirinê *by worrying*)
pîvan, bipîve to measure (Qimaşî bipîve. *Measure the cloth.*) (Birincî bipîve u ji nîka çêke. *Measure the rice and make it.*)
pîvaz (f) (1) onion (pîvaz terik *green onions*) (Me dolma u pîvazî çêkirîn. *We made dolma and onions.*)
(2) bulb (of a plant)

pîvazî (m) pink
pîze pizza
pleg outlet
pleygrewnd playground
polîs police
popî pope
program (1) program
(2) computer programmer (Ew programî çêdikit. *He does programming*)
(3) reporter (zelamê programê dibêjit *the man who speaks on the TV program*)
putîn tennis shoes
putir powder
pût boot

q

Qabîl Cain
qaîde (1) medium [nose, clothes, weight, height]
(2) just right [nose, clothes, weight, height]
qaîk (m) boat (Ew biçîte di nav qaîkê da. *He got into the boat.*)
qaîm kirin, qaîm bike to be faithful in / to (something) (Em îmana xwe qaîm dikîn. *We are faithful in/to our beliefs.*)
qaîş (m/f) (1) belt
(2) *qaîşa lîra* belt of gold coins worn by brides at their wedding
(3) seat belt (Qaîşê xwe bigirêde. *Fasten your seat belt.*)
qam (1) shallow (Av qam e. *The water is shallow.*)
(2) boundary [size, authority, roles]
qamus (m) (Ar) dictionary
qane’ satisfied (Ez qane’ im bi şulê xwe. *I’m satisfied with my work.*)
qanûn (f) (1) law
(2) statute
qapaẍk (f) lid
qapît coat (qapîtê baranê / mişema *raincoat*)
qare (f) continent (qara Emrîka jêrî *continent of North America*) (qara Emrîka jurî *continent of South America*)
qarisî icy (Ava tankî yê qarisî. *The water tank is icy.*)
qarîsûk ice [on the streets] (Şari’ qarîsukê girtî. *There’s ice on the street.*)

qarîsûk icy (Şari' qarîsûk e. *The street is icy.*) (Evro dinya qarîsûk e. *It's icy today.*)
qat (m) (1) men's suit
(2) sports jacket (men's)
qawîş (f) belt
qayim strong (i.e., difficult to cut, tear, break, etc.)
qaz (f) goose
qazan (f) (1) pot (qazana sefuk *steamer*) (Min derametê xwe deland di qazana sefuk da. *I boiled my vegetable in a steamer.*) (Min birinca xwe di qazana mezin da çêkirin. *I made my rice in a big pot.*)
(2) pan (Piçek duhinî bike binê qazanê da u rijdêt xwe biqelîne. *Put some shortening in the pan and fry the tiny noodles.*)
qebaḧet (m) big mistake(Wê qebaḧetek yêt kirî. *She has made a big mistake (e.g., she got pregnant before marriage.*)
qebir (m) grave
qebîl (1) satisfied (Xwedê qebîl dikit. *God be satisfied with it [e.g., your prayers].*)
(2) approval
qebîl kirin, qebîl bike (1) to accept (Min qebîl kir ew dîarîe ji te. *I accepted that gift from you.*)
(2) to answer (Xwedê di'aê min qebîl kir. *God answered my prayer.*)
qeçaẍ illegal (alien) (Heker tu qeçaẍ (î), tu ne şêî şul bikî. *If you are an illegal alien, you can't work.*) (Xoşka te bi qeçaẍî hat? Ne, temamî hat. *Did you sister come illegally? No, she came legally.*)
qedem soccer
qeder (f) (Ar) fate (Nizar qedera min bî. *Nizar was my fate [that I would marry him].*)
qedir (m) (1) respect (Min qedirê wê ne girt. *I didn't hold her respect / I insulted her.*)
(2) honor (Qedirê wê bigire. *Honor her.*)
qedir girtin, qedir bigire (1) to respect (Malêt Kurda gelek qedirê min digirin. *The Kurdish families respect me a lot.*)
(2) to show respect (Gelek qedirê wê bigire. *Show her a lot of respect.*)
qedna impossible (Eve qedna bît li def miruva. *This is impossible for / with man.*)
qefesk (f) cage (Mi ji qefeskê teyr ber da. *I set the birds free from the cage.*)
qehir angry/sad
qehirî (1) sad
(2) upset

qehirîn, biqehire to be sad (Ez qehirîm. *I was sad.*) (Em gelek qehirîn u 'ecêb maî maîn. *We were very sad and shocked.*)
qehwe (f) coffee (Qehwe tax e. *Coffee is bitter.*)
qehweî (m) brown
qeḧfik (f) (1) flower pot
(2) vase
qeîmeqam (m) governor [of a small city]
qelandin nav duhinî da, biqelîne nav duhinî da (1) to fry (Hêkê biqelîne nav duhinî da. *Fry the eggs.*)
(2) to sauté
qelem (m) (1) pen (qelemê ḧibire *ink pen*) (Qelemî bu min bîne. *Bring me the pen.*)
(2) pencil (qelemê risase *lead pencil*) (qelem elwan *crayon*) (qelemêt reng u reng *crayons*) (qelemê renga *marker [for white board or overhead projector]*)
qeleq (1) worried
(2) worry
qelew (1) fat
(2) heavyset
qeliq (1) worried
(2) worry
qemîs (m) (Ar) (1) shirt (Qemîsê min şîn e. *My shirt is blue.*)
(2) blouse
qemsele (m) jacket (Qemselê xwe bike ber xwe. *Put your jacket on.*)
qenat (m) channel (TV) (Herre qenatî biguhurre. *Go change the channel.*)
qenc (1) good (Te qenc kir! *You did a good job!*) (Miruvekî qenc e. *He's a good person.*)
(2) better [health] (Naîla qenc bî? *Is Naîla better?*)
qencî (f) (1) good deeds (Em çi car qencîa Şirînê ji bîr nakîn. *We'll never forget Şirîn's helpfulness / good deeds.*)
(2) kindness (Şirînê qencî li min kir. Ez birim dixturî. *Şîrîn gave me kindness. She took me to the doctor.*)
qenepe (f) (1) couch
(2) sofa
qensur (f) wardrobe [cabinet for clothes] (Min parêt xwe veşartin di qensurê da. *I hid my money in the cabinet.*)
qerar dan, qerarê bide to decide (Mi qerar da gel te bixwînim. *I decided to study with you.*)
qereboleẍ traffic jam
qereç gypsy
qerisî frozen

qeriz (m) (1) debt (Wî qerzê hey. *He has a debt.*) (çi ne bu qerî wî bidet *since he was not able to pay the debt*)
(2) loan

qernebît (1) cauliflower
(2) broccoli

qerrdunekê dumetir gold chains given a bride when she accepts a proposal of marriage

qerrebaliẍ (f) crowded

qerrimî tired

qesab (m) butcher (Qesabî serê pezî jê vekir. *The butcher beheaded the sheep.*)

qese (f) (1) word (Cumlekê gel vê qesê bu min bêje. *Tell me a sentence with this word.*) (Were, da ez bu te qesekê bêjim. *Come here so that I can tell you something [have a word with you].*)
(2) news (Ez bu te qesekê bêjim. *I have some news (something) to tell you.*)

qese gotin, qese bêje to grumble / complain (Rêzanê qese gotin wextê Suzan çûî nik hevala xwe. *Rêzan complained when Suzan went to her friend's house.*) (Demê ewan dînar wergirtî qese goti ne xudanê xanî. *When they received the denarius, they grumbled against the landowner.*)

qesebat lung

qesêt mezin proverb

qesir (f) castle

qesp (f) date [fruit]

qest (f) (1) aim
(2) desire /wish (Qesta min ez siḧa te bikim. *My desire is to see how you're doing.*)

qesta … kirin, qesta … bike to leave and go [to someone or some specific place] (Jinka qesta medresê kirin. *The women went to the school.*) (Ewan qesta ḧecê kirin. *They went on the pilgrimage.*)

qestele (f) drain

qet never (Qet ez naêm mala te. *I'll never go to your house.*) (Qet êdî ez naçime Tirkîe. *I'll never go to Turkey.*)

qet (f) (1) piece (Eve qeta te ye. *This is your piece.*) (qetek ji vê kêkê *a piece of this cake*)
(2) part

qet kirin, qet ke (1) to cut [into big pieces with a knife] (Goştî qet ke. *Cut the meat.*)
(2) to slice (Herre gêzera qet ke. *Go slice the carrots.*)

qet'e sharpener (qet'a qelemî *pencil sharpener)*

qetan, biqetîne (1) to tear apart [wire, elastic, string] (Werîsî biqetîne. *Tear the rope apart.*) (Werîs qeta. *He tore the rope apart.*)
(2) to tear [paper]

qeşayet (m) priest (karê qeşayetêî *serving as priest*)

qeş(et) (m) (1) priest
(2) pastor

qetqet several pieces or parts

qeviz constipated (Ez qevis im. *I am constipated.*)

qewa'd (f) grammar (Qewa'da ezmanê Kurdî ne zeḧmet e. *Kurdish grammar isn't difficult.*)

qewî strong

qewmîn, biqewme to happen (Çi qewmî ye? Şerr e. *What happened? It's a fight!*)

qewqe' clam

qews u qizeḧ (f) (Ar) rainbow

qeymaẍ (f) sour cream

qeymeqamî city hall (of a small city)

qeytan (f) (1) shoelace (Qeytana pêlava xwe girê de. *Tie your shoelace.*)
(2) cord [cotton or silk]

qeyş (f) (*see* qaîş)

qeza (f) (Ar) small city [e.g., Zaxo]

qêrrqêrr kirin, qêrrqêrr bike to shout (Min u deyka xwe qêrrqêrr kir. Me Hana ji xew rakir. *My mother and I shouted at [fought] each other and woke Hana up.*)

qifil (f) lock (Qifla wê derrgehî veke. *Open/unlock the lock on that door.*) (Qifla wê bigirre. *Lock it [the lock on it].*)

qilêdîk (f) necklace [beads]

qimaş (m) (1) cloth [new]
(2) fabric [new]

qirr (f) (1) owl
(2) raven

qirrase (f) elastic hair band

qirrş shark

qirrşik (f) (1) pine needles
(2) small pieces of straw

qisim (m) dormitory (qismê 'ilumê *[college of] science dormitory*) (Ez li qismê daxilî bîm wextê ez li kulîê. *I lived in a dormitory when I was in college.*)

qita pasê bus stop

qîjqîj kirin, qîjqîjê bike to shout (Biçîk îna bes qîjqîjê bikin. *She brought the child but they shouted [fought].*)

qîtar (f) (Ar) train

qodiret (f) ability (Xwedê qodiret da me da em bişêîn ferqîê bikîn. *God gave us the ability to make our own choices.*)
qodîk (f) (1) can [of food] (qodîka neylon *plastic food storage container*)
(2) small metal container [for milk, oil, yogurt, etc.]
(3) carton
(4) mirror (Min qodîka berê xwe danê. *I looked at myself in the mirror.*)
qolaç (f) corner (Mala min yê li qolaça meḧlê ye. *My house is on the corner of the general area.*) (Mala min yê li qolaça "E" Street u Main Street. *My house is on the corner of "E" St. and Main St.*)
qolipandî upside down
qolipî sprained (Pê wê qolipî. *Her ankle is sprained.*)
qondere (f) shoe (Qonderêt xwe bike ber xwe. *Put your shoes on.*)
qopçe (f) button (Qopça xwe veke. *Undo [open] your buttons.*)
qorî (m) tea kettle
qormiçî wrinkled
qosandin, biqosîne (Ar) to cut (with scissors) (Min pirrça xwe qosand. *I cut my hair. / I got my hair cut.*)
Qosîrîa min 'efî ke. (1) Excuse me.
(2) I'm sorry.
qota bi xane (f) school
qotabî (m/f) (1) student (Hana qotabî ye li sefa dûê. *Hana is a student in the second grade.*)
(2) scholar
(3) disciple
qotan, biqote (1) to knock (Derrgehê cîrana biqote. *Knock on the neighbor's door.*)
(2) to beat
(3) to spank (Min Hana qota. *I spanked Hana.*)
(4) to clap (Me desta qotan. *We clapped.*)
qowet (f) strength
qudîk (*see* qodîk)
qumbere (f) bomb (Sedamî qumberek mezin li Kurdistanê da. *Saddam dropped a big bomb on Kurdistan.*)
qun buttocks
Qur'an (f) Koran (*also* Quran)
qurban (m/f) sacrifice (Qurbanekê bide. *Give a sacrifice [for him because he's sick].*)
qurban kirin, qurban bike to sacrifice (Wan qurbanek bu Xwedê ser jê kirin. *They sacrificed to God.*) (En şaallah ez qurbana te bim! *literally: God willing I'll be sacrificed for you! [said by a mother to her child to express her love for the child]*)

qurrî (m) tea pot
qurtal kirin, qurtal bike (1) to deliver (Me ji ewê çewit qurtal bike. *Deliver us from the evil one.*)
(2) to rescue (Min qurtal kir ji mirinê. *I rescued her from death.*)
(3) to save (Kî dişêt qurtal bît? *Who can be saved?*)
(4) to cut down (Min vê darê qurtal kir ji binî. *I cut this tree down at the base.*)
qurtalbûn (f) salvation
qurtalkirin (f) redemption

r

rabî(n) (1) then [used in story telling]
(2) after that [used in story telling] (Rabî çû daristanê. *After that he went to the forest.*)
(3) so [used in story telling]
rabîn ji pê ve, rabe ji pê ve to stand up on your feet
rabîn, rabe (1) to stand up [people, animals]
(2) get up [people, animals] (Hana, dê rabe! *Hana, get up!*)
(3) to rise [bread] (Nanê min rabî. *My bread rose.*)
rabûn (*see* rabîn)
raçêt (f) prescription (Emê çîn seydelîê raçêta te bîn da em dermana bu te bînîn. *We're going to the pharmacy to get your prescription.*) (Min telefuna dermanxanê kir da raçêta dermanêt min serif kit. *I called the pharmacy for them to fill my prescription.*)
radiu (f) radio
Raḧêl Rachel
rakirin, rake (1) to pick up (Qelemî rake. *Pick up the pen.*)
(2) to lift up ('Elema Emrîke rakirin. *They lifted up the flag.*)
(3) to raise (Destê xwe rake. *Raise your hand.*)
(4) to set up (Kurrê Çîmenê dulaba min rakir. *Çîmen's son set up my china cabinet.*)
(5) to put away
(6) to save (Min hindek parêt xwe yêt rakirîn bu wextê meḧtace ye. *I saved some money for emergencies.*)
(7) to answer ([Telefonê] rake. *Answer [pick up] the phone.*) (Kesê telefon ne rakir. *No one answered [picked up] the phone.*)
raman (f) (1) thought
(2) thinking (bê raman *without thinking*)
raman, birame to think
Rame Ramah
rapor reporter [journalist]

rast (1) straight (rast u rast *straight ahead* (Herre rast u rast. *Go straight ahead.*)
(2) flat
(3) true / right (Eve ne rast e. *This isn't right.*) (Fatimaê rast got. *Fatima spoke the truth.*)
(4) across (Bixwîne rast. *Read across [the page].*)
(5) upright (righteous) (beramberî Xwedê rast *upright in the sight of the Lord*)
(6) righteous (rast u pêtvî *righteous*) (rast u dirist *righteous*) (miruvêt rast u dirist *righteous people*)
(7) right side up (Ew rast e. *It's right side up.*)

rastgu (f) righteousness (rastgua wî *his righteousness*)

rastik (f) part [in hair]

rastî (1) true (beta ne rastî ne *false [wooden; not live] ducks]*)
(2) of course (Rastî ez dê evroke fravînê xwim. *I will certainly eat lunch today.*)

rastî (m) (1) truth (bi rastîê *in truth*)
(2) righteousness (berê min didet rêkêt rastîê *before me are paths of righteousness*)

rawesta (f) (1) special
(2) special feature

rawestan, biraweste (1) to stop
(2) to remain (standing up) (Buçî hîn serê rojê li vêrê dirawestin bê kar? *Why have you been standing here all day long doing nothing?*)

razî satisfied (Şirîn ji min razî bî bu dersa Kurdî. *Şirîn was satisfied with me for the Kurdish lesson.*) (Biçîk razî ne bîn bi hedîêt min. *The kids aren't satisfied with the gifts I give them.*)

reb (m) God

reben (f) nun

rebenî unfortunate

rebetbêyt (Ar) (f) housewife

recifîn, birrecife to shiver (shake) (Ez ne sax im. Ez dirrecifîm di taê da. *I'm sick. I've been shivering from fever.*)

refik (f) aisle (refka pêncê *aisle five*)

reh (f) root (Ew bê reh bû. *It had no root.*)

reh (pl) beard (Rehêt wî spî bîn. *His beard is white.*) (Leqmanî rehêt xwe teraşîn. *Leqman shaved his beard off.*)

rehazer (f) cumin (?)

rehin (m) thigh

rehreh basement

reḧ (m) spirit

reḧem (m) uterus

reḧet (1) comfortable
(2) restful
(3) peacefulness [people, situations] (Dilê min reḧet nîne. *My heart has no peace.*)
(4) quiet (Reḧet be! *Be quiet!*)
(5) calm
(6) relaxed
(7) low [heat] (Agirê wê reḧet bit. *The heat is low.*)
(8) slowly (Reḧet bi rê ve herre. *Walk slowly.*)

reḧetî peaceful (Nuke Kurdistan reḧetî ye. *Now Kurdistan is peaceful.*)

reḧim (f) mercy

reî (f) (1) opinion
(2) mind (Min reîa xwe bedil kir. *I changed my mind.*)
(3) perspective
(4) viewpoint

reîs (m) president

Remezan (f) Ramadan (Kengî Remezan e? *When is Ramadan?*)

remil (f) (1) dice
(2) lots

renc (m) wrench

rendeş grater

rendeş kirin, rendeş bike to grate (Ezê gêzera rendeş kim. *I'm grating carrots.*)

reng (m) (1) color (Eve çi reng e? Eve rengê kesik e. *What color is this? It's green.*) (rengê pirteqalî *orange color*)
(2) crayon (qelemêt reng u reng *crayons*)

reng kirin, reng bike to color

reng u reng colorful (qelemêt reng u reng *crayons*)

renga lê dan, renga lê bide to color

rengîn colorful (Kurdistanê ya rengîn *colorful / beautiful Kurdistan*)

req (1) hard (Çend kesmêt te req in! *Your cookies are too hard!*)
(2) calloused

req (f) turtle

reqem (m) number (reqemê êkê / dûê *number one / two*) (reqemê derrgeh *(apartment) door number*) (Reqemê telefuna te çend e? *What's your telephone number?*)

reqemê lê dan, reqemê lê bide to dial

reqisîn, bireqise to dance

resam artist

reş (m) (1) black
(2) very dark-skinned

reş u şîn bruised (Pê wî reş u şîn bî. *His leg is black and blue / bruised.*)
reşandin, reşîne to spray (Dermanî breşînîn. *We'll spray the poisin.*)
revandin, birrevîne to kidnap (Ew kiçke revandin. *The girl was kidnapped. [Someone kidnapped the girl.]*)
revîn, birreve (1) to escape (Em sala 1991 revîne çîaêt Tirkîe. *In 1991 we escaped to Turkey.*)
(2) to run away
rewze preschool
rex (m) side (rexê dî *on the other side*)
rez (m/f) (1) farm [has trees and bushes]
(2) vineyard (Wî firêkiri ne di nav rezî da. *He sent them to the vineyard.*).
(3) orchard
(4) farm field
rezvan (m) farmer
rêber (m/f) (1) leader (Ew zelam rêberek baş e. *That man is a good leader.*)
(2) guide
rêk (f) (1) way (Tu rêkê dizanî? *Do you know the way?*) (Rêka mala wê nîşa min bide. *Show me the way to her house.*)
(2) journey (Rêka me drêj e. *Our journey takes a long time.*) (rêka drêj *the long journey*) (rêka dîr *the far journey*)
(3) path (di rêka da *along the path*) (rêka geracê *driveway*) (Rêka me gelek teng e. *Our path is really narrow.*)
(4) route
(5) road (Rêka 495 gelek izdîḧam e. *I-495 is very busy.*)
(6) track (Wan rêka qîtarê xirab kir. *They ruined the train track.*)
(7) directions (Tu dişêî rêkê nîşa mi bidî? *Can you show / tell me how to get there?*)
(8) through [idiomatic] (Catholic dibêjin bawerîa wan nivêj bi rêka popî bitin. *Catholics believe that they must pray "through" the Pope.*)
(9) responsible [idiomatic] (Ev mirove rêka xwe da ye. *This person is resonsible.*)
rêkeftin (f) occasion (Ji ber rêkeftina Cejina Newrozê, emê çîne seyranê. *Because of the occasion of Newroz, we will go on a picnic.*)
rêncber (m) (1) laborer
(2) worker
rêvîng traveler ??
rêz (f) (1) layer (Min xanîê xwe pênc rêzêt qaẍeza jê vekirin. *I took five layers of wallpaper off my [walls].*) (Çend di rêz in? *How many layers are in it [the cake]?*)
(2) equal to (Te ew îna rêza min? *You made her equal to me?*) (Min ne îne rêza wê. *Don't make me equal to her.*)

(3) line (Biçîka xwe rêz kir. *The children formed a line.*)
(4) row (Çend li vê rêzê ne? *How many are in this row?*)
rêz girtin, rêz bigire (1) to honor (Rêza dayk u babêt xwi bigire. *Honor your father and mother.*)
(2) to make a line (Rêzê bigire. *Make a line [of people, to wait for something].*)
rijid (pl) tiny noodles which are fried and served with rice (Piçek duhinî bike binê qazanê da u rijdêt xwe biqelîne. *Put some shortening in the pan and fry the tiny noodles.*)
rih (*see* reh)
rihik (f) small fried meat patties
riḧ (f) spirit
risasî gray
risim (m) (1) picture (rismê destî *painting [picture]*)
(2) drawing
(3) art
(4) reflexion
(5) photograph (Bila ez risimê te bistînim? *May I take your picture/photo?*)
risim girtin, risimî bigire to take a picture (Min divêt ez risimekê bigirim. *I want to take a picture.*)
risim kêşan, risimê bikêşe to take a picture (Risimekê bu min bikêşe! *Take a picture for me.*)
risim standin, risimî bistîne to take a picture (Bila ez risimê te bistînim? *May I take your picture/photo?*)
risim şîştin, risima bişo to process film (Ez dê risima şom. *I will develop the photos.*)
risimî çêkirin, risimî çêke to draw a picture
rist (f) sentence (Ristekê bu min bêje. *Tell me a sentence.*)
ristik (f) (1) necklace [really long chain]
(2) metal chain
riteb (f/pl) fresh (not dried) date [fruit]
rişk u speh lice
riştin, birrêje (1) to pour (Avê birrêje. *Pour the water.*)
(2) to spill (Çay rişt. *The tea spilled.*)
(3) to overflow (Perdaẍa min bi serda rişt. *My cup overflow(s).*)
rizname (f) calendar
rizyank plant (a nice-smelling one)

rî (m) (1) cover [for a padded mat or pillow] (rîê balîfkê *pillowcase*) (Rîêt duşekêt xwe bişo. *Wash your duşek covers.*)
(2) cheek??
rîa∂e kirin, rîa∂î bike to exercise (Ez temrînêt rîa∂î dikim da ez ze'îf bibim. *I'm exercising so I'll get thin.*)
rîaze (f) sports
rîazîat (f) mathematics (Biraê min bi rîazîata zîrek e. *My brother is smart in math.*)
rîbat (f) tie
rînê tavê sunscreen
rîniştin, rîne (1) to sit (Ez dişêm bes piçîskekê rînim. *I can only stay/sit for a short time.*)
(2) to sit down
rîniştin xwarê, rîne xwarê (1) to sit down
(2) to be quiet
rîsît receipt
rîvî (m) fox
rîvî(k) (pl) intestines
rîvîka kure appendix
rîz (1) naked (Destêt wê rîz in. *Her arms are naked. [Her clothes don't have sleeves.]*)
(2) immodest (Ew cilkêt rîz nawergirit. *She doesn't wear immodest clothing.*)
rîzatî (f) nakedness (Rîzatî ya zêde gelek şerim e. *Extra nakedness [immodesty] is very embarrassing [bad].*)
ro river rapids
robe (m) bathrobe
roj (f) day (roj bu rojê *day by day*) (rojê carekê *once a day*) (rojê du ca *twice a day*) (rojekê e êkê ne *every other day*) (roja dî *the next day*) (Roja Evînîê *Valentine's Day*) (roja dîv … da *the day after* (Roja dîv Pêncşembê day çi ye? *What is the day after Thursday?*) (roja deyk bîna te *your birthday/date*) (rojê hemîa / rojê ĥemîê *all day* (Me rojê hemîa şul kir. *We worked all day.*) (Kîşk rojê Xwedê tu daî? *On which day were you born? / When were you born?*) (roja deyk bîna te *your birthday/date*) (roj bu rojê *day by day*) (her dû rojêt çûîn *for the last two days*) (betira pêr *three days ago*) (her du sê roja *a few days*) (her roj *every day*)
(rojekê e êkê ne *every other day*) (her dû roja carekê *every two days*)
rojava (m) west
rojhelat (m) east (Tav li rojhelatê diderkevit. *The sun rises in the east.*)
rojî girtin, rojîa bigire to fast [for religious purposes]

rojnam (f) newspaper (Rojnama Xabatê beĥsa dengubasêt ji der ve kirin. *The Xabat newspaper talks about the news from the outside world.*)
role rollers [for hair]
roxset (f) permission (Roxsetê bide min; ez dê çim. *Give me permission; I'm leaving. / I'd like to leave, please.*)
ruhin kirin, ruhin bike to explain (Bu min dersa Hanaê ruhin bike. *Explain Hana's lesson/schoolwork for me.*)
ruĥ (f) spirit (ruĥ herşî *crushed in spirit*)
rukin (m) corner (Xanîê min li rukinî ye. *My house is the first house in a row of houses.*)
runahî (f) (1) light (Roj runahî ye siĥarî. *The day is light in the morning.*)
(2) bright (Dinya runahî ye u tav e. *The weather is bright and sunny.*)
runahî dan, runahîê bide to shine (Tavê runahîa xwe da mala me. *The sun shone on our house.*)
runahî kirin, runahî bike to brighten (Te runahî kir mala me. *You brightened our house [with your presence].*)
runak light
rundik (f/pl) tears (Rundik ji çava hatine xwarê. *Tears ran down.*)
rut u bet humid
rûhin (m) grease
rûhin lê dan, rûhinî lê bide to grease (Rûhinî gelekê li binê qazanê bide. *Grease the bottom of the pan well.*)
rûn (m) (1) oil
(2) fat (liquid)
(3) grease
(4) margarine
rûn kirin, rûn bike (1) to oil (Min sênîa xwe rûn kir u min kesmêt xwe kirin tê da. *I oiled my pan and put kesme on it.*)
(2) to lubricate
(3) to anoint
rûnkirî anointed (Ez dizanim tê rûnkirî ewê dibêjinê mesîĥ dê êyn. *I know an anointed one called the Mesiah will come.*)

s

sa'î berîd postman
sa'îê berîdê delivery person
sabîn (f) soap
sabîna amana ya ruhin dishwashing soap

safî (Ar) (f) clear [no pollution or fog]
sahî (Ar) (f) clear [no clouds]
sal (f) year (sala bêt / sala têt / salek dî *next year*) (sala çûî *last year / a year ago*)
salib negative [pole]
salik dish drainer
salun (Ar) (f) beauty salon
Samîre Samaria
Samirî (m/f) Samaritan
sanahî (1) easy (Ev derse sanahî ye. *This lesson is easy.*)
(2) simple
sanîe (f) second
santî sanitary pad
santîmetir (f) centimeter
saqit bîn, saqit bibe to fail (Ez saqit bîm. *I failed (the test).*)
sarr (1) cold [temperature] (Min sarr e. *I'm cold.*)
(2) cool
sava tiny [infants, baby animals]
savar (m) bulgar (cracked wheat)
sax (1) healthy (Ez ne sax im. *I don't feel well [healthy].*)
(2) alive
(3) unbroken
(4) living
sax kirin, sax bike to resurrect (Xwedê 'Îsa ji mirnê sax kir. *God resurrected Jesus from death.*)
sayiq (m) driver (sayiqê pasê *bus driver*)
se (m) dog
se'et (f) (1) hour (Se'et çend e? *What time is it?*) (Bi teyarê) çend se'et in? *How many hours (by plane)?*) (Se'eta te bi çendê ye? *How much do you make an hour?*)
(2) clock
(3) watch
sebaẍ (m) house painter
sebeb (m) (Ar) (1) excuse (Çi sebeb te hebî te evro ne çûî medresê? *What excuse did you have for not going to school today?*)
(2) why [idiomatic] (Sebeb çi ye tu ne dihatî mala me? *Why didn't you come to my house?*)
(3) reason (Sebeb çi ye evroke tu drengî hatî? *What is the reason you came late today?*)
sebir (m) patience (Sebirî nîşa me dit. *We learn patience.*) (Sebirê xwe bikêşe ḧeta ew bêt. *Have patience until he comes.*)
sebure (f) blackboard

sed (f) one hundred (sedê *percent* (95 sedê *95%*)
Sedam Saddam
sedef oyster
sef (f) (Ar) (1) class [in school]
(2) grade in school (sefa sîê *third grade*) (sefa dûê kulîê *sophomore year in college*)
(3) rank
(4) line
sefare nation state (Me sefare di welata da nîne. *We don't have a nation state in the country.*)
sefer kirin, seferê bike to travel
sefiḧ (f) page (Sefḧê bîst u dûê veke. *Open to page 22.*)
sefir (Ar) (f) vacation/trip (Sefira te xweş bî? *Did you have a nice trip?*)
sefî (1) insane (crazy)
(2) only a little bit insane
sefîne (f) (Ar) (1) ship (Sefînêt leşkerê Emrîkî geheştin di beḧrê da. *The US Army ships reached the ocean.*)
(2) ferry
sefîr (m/f) ambassador
sefuk (f) collander
sehil (1) easy
(2) simple
seḧ kirin, seḧ bike (1) to see
(2) to look at (Ez dê seḧ kimê. *I'll see.*) (Em dê seḧ kînê. *We'll see.*) (Seḧ kê! *Look at this!*)
(3) to visit (Em dê seḧa miruvêt xwe kîn. *We will go visit our relatives.*)
(4) to watch [TV, movies]
(5) to smell (Ez bêhina mexelelê seḧ dikim. *I smell the pickles.*)
seḧet (f) health (Seḧeta ta çawan e? *How are you feeling?*)
Seḧet bit! You're welcome! [said in response to a compliment to your cooking]
seḧira (f) desert
sekinandin, bisekinîne to stop (something) (Min seyare sekinand ber derrgehî. *I stopped the car in front of the door.*)
sekinîn, bisekine (1) to stop (Bisekine! Te xelet çêkir. *Stop! You made a mistake.*) (Seyare sekinî ber derrgehî. *The car stopped in front of the door.*) (Baran sekinî. *The rain stopped.*)
(2) to wait (Bisekine li hîvîa min. *Wait for me.*)
seksuk goatee
selace (f) refrigerator (Selaca min şul nakit. *My refrigerator isn't working.*)

selal (1) top (Ji selal heta xwarê bixwîne. *Read from the top down.*)
(2) up (Ji xwarê heta selal bixwîne. *Read from the bottom up.*)
Selam u 'elêykum! (Ar) Hello.
sele basketball
selik (f) basket [one that keeps its shape] (selka sîkê *shopping / store basket*) (selka cilkêt pîs *dirty clothes basket*) (selka zibilî *wastebasket / trash can*)
selîfun aluminum foil
sema'e hearing aid (Vêt sema'a bêxin guhî. *He needs a hearing aid.*)
semun (f) raised round or oval, 1" thick Kurdish bread] (semuna firnê *raised bread cooked in the oven*)
sendel (f) sandal [like American sandals]
sendewiç (f) sandwich (Min bu xwe sendewiça hêka kirrî. *I bought an egg sandwich for myself.*)
senem idol (Hindî 'îbadeta senema dikin. *Indians worship idols.*)
sent (f) (1) penny
(2) cent
seqer (f) eagle
seqet disabled
seqif (m) ceiling (Seqifê me dilupa dikit. *Our ceiling is leaking.*)
ser (1) for (ser dînarekê *for a denarius*)
(2) over
(3) above
(4) on
ser (m) (1) top (serê rojê *all day long*) (Buçî hîn serê rojê li vêrê dirawestin bê kar? *Why have you been standing here all day long doing nothing?*) (serê lempê *lamp shade*) (serê textî *head board*)
(2) head (ser u ser *head first*) (ser u pê *Kurdish meal of intestines, brains, stomachs, and lamb or goat forelegs*) (Serê min diêşit. *My head hurts. / I have a headache.*)
ser avê ketin, ser avê bikeve to float (Min selka kurrê xwe ber da avê da. Selik ser av ket. *I put my son in a basket in the water. The basket floated.*)
ser bi ser dan, ser bi ser bide to break even (Min kitêbêt xwe ser bi ser dan. *I broke even [when I sold] my books.*)
ser çava you're welcome
ser evrazî uphill (Rêka min ser evrazî ye. *My way [the road] goes uphill.*)
ser êk continuously (Baran ser êk têt. *It rained continuously.*)
ser firaz righteous (Ew ser firaz e. *He is righteous.*)
ser nişîv upside down

ser nuşîv kirin, ser nuşîv ke to turn upside down [dishes only] (Amanêt xwe ser nuşîv ke. *Turn the dishes over and stack them so the water drains off of them.*)
ser nuşîvî downhill (Rêka min ser nuşîvî ye. *My way [the road] goes downhill.*)
ser serê min you're welcome
ser xatra te (1) greeting (Ez hatim Holende ser xatra te. *I came to Holland to see you / because I miss you / because I like you.*)
(2) (*also* bu xatra te *and* jiber xatra te)
Ser xêrê bit! Congratulations!
Sera çi? What are we playing / betting for? What will the prize be for the winner of this card game?
sera dan, sera bide to visit [as a long-term guest; to visit someone who is sick or has a problem] (Sera me bide! *Visit us!*) (Min sera Çîmenê da. *I visited Çîmen.*)
serbanê upstairs
serbaz (1) soldier
(2) officer [soldier]
serbest free [freedom to be independent] (Kurdistan serbest e. *Kurdistan is independent.*)
serda çûn, serda biçe (herre) to have an abundance (of something) (Sitla min ya avê serda çû. *There is a lot of water in my bucket.*) (Goştê min serda çû. *I have a lot of meat.*) (Ew dê serda çît. *He will have an abundance.*)
serdav (f) (Ar) basement (Min serdava xwe lêk da. *I rearranged my basement.*)
serdem (f) (1) age (dumahîa serdema cîhanê *the end of the age of the world*) (Dumahîka serdema Sedamî, çû di Kuwêtê da. Bu wî bî ne xweşî. *At the end of Saddam's time in office, he went to Kuwait. It was very bad for him.*)
(2) period
serê firnê hilkirin, serê firnê hilke to broil
serê xwe girêdan, serê xwe bigirêde to cover one's head
serê xwe şîştin di banîuê da, serê xwe bişo di banîuê da (1) to take a bath
(2) to bathe
serê xwe şîştin, serê xwe bişo to take a shower
seredan visitor
seretan cancer (Wî seretanê hey. *He has cancer.*) (Seretana hestîê hey. *He has bone cancer.*)
serhatî (f) (1) short, true story which happened a long time ago [used to teach a moral or lesson]
(2) parable

serif kirim, serif bike to (ex)change money (Ez dê çim sîka para da ez pareêt xwe serif kim. *I'm going to go to the money changer's shop to (ex)change my money.*)
serî first (people / ones) (Serî bi dumahî bîne. *Bring the first ones last.*)
serḧ straight (hair) (Pirrça wê serḧ e. *Her hair is straight.*)
serjimêr (f) census
serjimêr kirin, serjimêr bike to take a census
serkeftin, serkeve (1) to come up
(2) to spring up (Ew zî bi serkeft. *It sprang up quickly.*)
(3) to grow up [plants] (Evroke 2 roja şîn bîn u serkeft. *(My flower) sprouted and grew up in 2 days.*)
(4) to succeed (Hana li medresê serkeft. *Hana succeeded in school.*)
serketin înan, serketin bîne to overcome (Min serketin li ser cîhanê îna. *I have overcome the world.*)
serkilafkêt hajireşka mushrooms
serrma (f) cold (sickness) (Serrmaê ezê girtîm. *I'm getting a cold.*) (Serrmaê yê li min daî. *I have a cold.*)
serserik head first (Min xwe serserkî havêt di avê da. *I jumped into the water head first. / I dove into the water.*)
serspî (f) older woman who assists the bride at her wedding
serşu(k) (f) small room for washing clothes by hand and for taking showers (Zavaê bibine serşuê … *Bring the bridegroom to the shower room … [part of a song]*)
sertiraş xane barber shop (sertiraş xana jinka *beauty salon*)
seruk (m) president (Serukê me Mes'ûd Barzanî ye. *Our president is Me'sûd Barzanî.*)
serve outside (of clothes, things)
seuka tenîrê small round, ¼" thick Kurdish bread
sewkêt kuncîa sesame seed candy
seyare (f) car (seyara min *my car*) (Ez dê seyarê nîşa Çîmenê dim. *I will give Çimen a driving lesson.*)
seydelî (f) (Ar) pharmacy (Emê çîn seydelîê. *We're going to the pharmacy.*)
seyr kirin, seyr bike to do miracles??
seyran (f) picnic (cihê seyranê *park*)
sê (f) three (sê behir *one-third*) (sê cara *three times*) (sê çarêk *three-fourths*)
sê çarêk three quarters
sê kujî triangular
sê kujî (f) triangle
sêhwane (f) umbrella
sênî (f) (1) tray
(2) cookie sheet

sênîk (f) plate (Sênîkê bu min bîne. *Bring me a plate.*)
sêşemb (f) Tuesday
sêv (f) apple
sêyda (Ar) teacher
sêyid (m/f) a person who is a descendant of the prophet Muhammed
sêzde (f) thirteen
sîac (m) fence (Dizî xwe ji ser sîacî havêt. *The thief jumped over the fence.*)
sîal kirin, sîal bike to beg (Jinik nan sîal kir. *The woman begged for bread.*)
sîaqet (f) driving (Kengî tu dê sîaqetê nîşa min dî? *When will you show me how to drive?*)
sîar bîn, sîar be (1) to ride [car, horse, boat; said by villagers] (Ez sîar bîm [li hespî]. *I rode [the horse].*)
(2) to transfer (Ez pasek dî sîar bîm. *I transfered to another bus.*)
sîaset (f) politics (Ez ḧes ji sîaset nakim. *I don't like politics.*)
sîasî political (Ev rojname sîasî ye. *This newspaper is political.*)
sîasî (m/f) (1) politician
(2) political leader in war, in writing, etc.
sibe (1) tomorrow (sibe siḧarê *tomorrow morning*) (sibe nîvro *tomorrow afternoon*)
(2) (*see also* sobe)
sibehî tomorrow
sibehîk (f) a wedding tradition where a guest gives money to the bride or groom (Deyka min çû ser sibehîkaHevalî. *My mother went to give money to Heval because of his recent marriage.*)
sibiẍ (f) paint
sibiẍ kirin, sibiẍ ke to paint (Min metbexa xwe sibiẍ kir. *I painted my kitchen.*)
sicid kirin, sicid bike to bow low in Muslim prayers
sicin (f) dungeon
sifir zero (f)
sih (f) (1) shade (Ezê li ber siha darê rîniştîm. *I've been sitting in the shade of the tree.*)
(2) thirty
siḧabe zipper
siḧar (f) morning (Siḧarî bi xêr! *Good morning! [said until 11 a.m.]*)
siḧbet kirin, siḧbet bike to make small talk (Min u deyka xwe mi bu xwe siḧbet kir. *My mother and I made small talk.*)
siḧefî (m/f) journalist (Siḧefî gelek zeḧf bîn li Kurdistanê. *There were a lot of journalists in Kurdistan.*)

siḧr (f) (black) magic (Ew siḧrê çêdikit. *He does [black] magic.*)
sikeh (m) (train) track (Wan sikehê qîtarê xirab kir. *They ruined the train track.*)
sikirterî secretary
sil angry / upset (Sil ne be! *Don't be angry!*) (Ebed ez ji te sil nabim. *I'll never be upset with you.*)
silametî (f) safety (Polîs hatî ye medresê bu silametîa me. *The police has come to the school for our safety.*)
Silametî ye! Get well soon!
silav (f) greeting
silav kirin, silav bike to greet (Silava li mala xwe bike. *Greet your family [for me].*)
Silêmanî Solomon
siliḧ kirin, silḧê bike (Ar) to make up (with a friend after a fight)
silsîle (f) key chain
simbêl (pl) (1) mustache (Simbêlêt wî mezin in. *His mustache is big.*) (Ev zelame bi simbêl e. *This man has a mustache.*) (Ew zelame bê simbêl e. *That man doesn't have a mustache.*)
(2) whiskers
simiẍ (f) glue
simiẍ kirin, simiẍ bike to glue
simsimî (Ar) (f) sesame seed candy
sinar (m) (Ar) crochet hook
sinceq (f) (1) hair barrette
(2) scarf pin (Min sinceq êxist dersuka xwe. *I put a pin in my scarf. / I pinned my scarf together.*)
(3) bobby pin
sindî (f) grapefruit
sinduq (f) (1) package (sinduqa dermana *medicine cabinet*)
(2) box (Min mektubê xwe havête sinduqa berîdê. *I put a letter in the mailbox.*)
(3) cabinet (sinduqa dermana *medicine cabinet*)
(4) glove compartment (Bike di sinduqê da. *Put it in the glove compartment.*)
(5) trunk [of a car] (Min divêt ez van tişta bikime di sinduqa seyarê da. *I want to put this stuff in the trunk of the car.*)
sinnet kirin, sinnet bike to circumcize (Te kurrê xwe sinnet kir? *Did you circumcize your son?*)
sipreya pirrçê hair spray
sira line (Talibêt medresê li sira sekinînin. *The school students waiting in line.*) (Siraekê bigire. *Form a line.*) (Bi sira bisekine. *Stop at the line.*) (Herre siraê da. *Go stand in line.*)
Sirîa Assyrian (people)

sister (f) nurse (female)
sişwar (f) blow dryer
sitil (f) large bucket (Sitla min ya avê serda çû. *There is a lot of water in my bucket.*)
sitrêc (m) leggings
sivik light [weight]
sivure (m) squirrel
siwaḧ (Ar) tourist
Siwîd (f) Sweden
sizadan (f) (1) judgment (Ew hate sizadan kirinê bi destê Tirka. *They were given judgment by the Turks.*)
(2) condemnation (Ew dê hêne sizadan. *They will have condemnation. / They will be condemned.*)
sîê third (series)
sîfe (Ar) adjective
sîh (f) thirty
sîk (Ar) (f) (1) marketplace (sîka para *money changer's shop*) (sîka vekirî *farmer's market / open market / fresh market*)
(2) warehouse
sînd (f) (1) testimony (direw sînd *false testimony*)
(2) oath
sînd xwarin, sînd bixwe (1) to swear
(2) to take an oath
sînek club (playing card)
sîneme (1) cinema
(2) movie theater
(3) overhead projector
sîng (m) chest
sîr salty
sîr (f) garlic
sîratî (f) saltiness ??
sîrik u penîr (m) cheese and greens
sîsirk (f) cockroach
sîtafk (f) shadow (Herre ji ber sîtafka min. *Go in front of my shadow.*)
sleyd (mini) blinds
sobe (*see* sibe)
sobehî (*see* sibehî)
sobeẍ dyed [hair]
sope (f) heater [gas, kerosene]
sorr (m) red (Eve çi reng e? Sorr e. *What color is this? It's red.*)
sorrava leyva lipstick
sorrik measles (Ev sorrik in. *These are measles.*)

sotin, bisoje to burn (Cerimê min sot. *My skin got burned.*)
soz bit to promise
spagetî spaghetti noodles
spanî biçîk wrench
spêde (f) (1) morning (Ez spêdê rabîm ji xew. *I woke up in the morning.*)
(2) dawn
(3) sunrise
spênaẍ (f) spinach
spil (m) cottage cheese
spî (m) (1) white
(2) very light-skinned
spî kirin, spî ke to peel [fruit, eggs, vegetables]
spîatî dairy food
spîrtu (m) rubbing alcohol (Min destê xwe bi spîrtuê paqij kir. *I cleaned my hand with rubbing alcohol.*)
staîşa … kirin, staîşa ….biken to honor [someone]
standin, bistîne (1) to collect (Min kaẍez ji wan stand. *I collected the paper from them.*)
(2) to take (Biraê min parêt min ji min standin. *My brother took my money [from me].*)
stebil (f) stable (stebila hespa *horse stable*)
sterîo stereo system
stêr(ik) (f) star
stirî(k) (m/f) (1) thorn
(2) thistle
stivank necklace [short; with 2-3 charms]
stîr thick (weyrê stîr *thick wire*)
stran (f) song (Stranêt niştîmanî yêt stran bi Şivan gelek xweş in. *National songs, especially those sung by Şivan, are wonderful.*)
stran gotin, stran bêje to sing (Strana bu min bêje. *Sing for me.*)
stranbêj singer
stu (f) back of neck
stup (f) brake [of a car]
stup girtin, stupê bigire to brake (Min stup girt. *I pushed on the car brake until I stopped. / I braked. / "I stopped."*)
suda soft drink
suf (m) yarn (Min çakêtek bu Hanaê ji sufî çêkir. *I made a jacket for Hana from yarn.*) (Girêkekê li sufê xwe çêke. *Make a knot in your yarn.*)
sukerî diabetes (Min sukerîê hey. *I have diabetes.*)
sulîn (f) garbage disposal
supas thank you

Surîa Syria
sutin, bisuje to scorch (to burn / become dry)
suz bit to promise (Suz bit ez harî karîa te bikim. *I promise I will help you.*)
suzat oath??
swîç (f) light switch

Ş

şa'er (m) poet
şagird (m/f) (1) busboy (in a restaurant)
(2) man or boy who brings tea to customers and runs errands in a shop
(3) disciple
(4) follower (şagirdêt 'Îsaî *followers / disciples of Jesus)*
şahid witness (da her duzek bi şehdekîa dû yan sê şahda aşkirabît *so that every matter may be established by the testimony of two or three witnesses*)
şahîp king (playing card)
Şam (m) the area of Syria, Jordan, Palestine, and Lebanon
şamî(k) (pl) corn (genimê şamî *popcorn*) (Bu min şamîka çêke; ezê xwim. *Make some (pop)corn for me and I'll eat it.*)
şans (m) fate
şaq difficult (Çend şaq e! *This is very difficult!)*
şari' (m) (Ar) (1) road (Şari'ê Pohikê *Pohick Rd.*)
(2) street (Ev şari'e ḧemî tese ne. *This street has lots of pot holes.*)
şarq (Ar) (m) east
şaş confused
şaşe (f) screen
şax (m) (1) horn [animal's]
(2) antler
(3) tusk
şazde (f) sixteen
şebelut chestnut
şebrize anxious
şef chef
şefqe (m) (1) cap [baseball cap]
(2) hat with a bill [straw hat]
şeh (m) (1) brush
(2) comb
şeh kirin, şeh (bi)ke (1) to shuffle [cards for a game]
(2) to brush [hair]
(3) to comb

şehdekîê … kirin, şehdekîê … bike to testify (… daku şehdekîê bo rastîê bikim. *… in order for me to testify to the truth.*)
şehreza (1) proficient
(2) expert
(3) to know well / to be good at something (Ez ne gelek şehreza li van rêka. *I don't know this road / way very well.*)
şekir (f) sugar
şekirdan (f) sugar bowl
şekirk (f) candy that is not wrapped in paper
şel u şepik (m) Kurdish men's (very nice) outfit
şelît (f) (1) cassette tape
(2) video cassette tape
şeluwan suspenders
şelwal (m) (1) Kurdish men's (everyday) outfit
(2) the pants worn under a Sorani woman's dress
şem'edan (m) candlestick
şemalk (f) candle (Min şemalk hilkirin jiber cejina Newrozê. *I lit some candles for the Newroz holiday.*)
şembî (f) Saturday (şembîa çûî *Saturday of last week*)
(şembîa dîmahîkê ji heyva çûî *the last Saturday of last month*)
(şembîa sîê ji vê heyvê *the third Saturday of this month*)
şemendefer (f) train
şemilk (f) prayer rug (şemilka nivêjê *prayer rug*)
şempu shampoo
Şemẍun Simeon
şeq (f) very hard slap on the face (Şeqekê kiça xwe bide. *Give your daughter a slap.*)
şer (m) (*see* şerr)
şerab medicine (liquid)
şerbet (f) (1) juice
(2) punch
şerim (1) embarrassed
(2) shy
şerim kirin, şerim bike (1) to feel shame (Min şerim kir. *I was embarrassed.*)
(2) to be embarrassed (Ez şerim dikim. *I'm embarrassed / shy.*)
şermîn shy (Schnooki şermîn e. *Schnooki is shy.*)
şerr (m) (1) war
(2) battle
(3) fight / fighting (Ez ḧes ji şerrî nakim. *I don't like fighting.*)

şerr kirin, şerrî bike to fight (Şerrî ne kin! *Don't fight.*)
şerte (m) policeman (şertê mirur *traffic policeman*)
şeş (f) six
şeş kujî (f) six-sided shape [like a stop sign]
şev (f) night (şevê dî *last night*) (şeva dî *two nights ago*)
(şev tira dî *three nights ago*)
(şeva bêt / şeva têt / şevek dî *tomorrow night*)
Şeva te xweş bit. Good night.
şexsî private
Şeytan (m) [Kurds usually don't say this word] (1) Satan (şeytanperês *Satan worshiper*)
(2) the Devil
şeytan [Kurds usually don't say this word] (1) devilish
(2) wily
(3) deceitful
şêlim (f) (1) turnip
(2) white radish
şêr (m) lion
şêst (f) sixty
şêw (f) script (Kurdî bi şêwê 'Erebî *Kurdish in the Arabic script*)
şêx (1) religious leader [of the Yezidi or Islamic religions]
şi'er (f) (Ar) poem
Şibat February
şibihîn (f) (1) image (bi şibihîna Xwedêî *in the image of God*)
(2) likeness
şihade (f) (1) degree (Te çi şihade heye? *Which degree [from college] do you have?*)
(2) diploma
şihade standin, şihadê bistîne to graduate
Şihud Yehwe Jehovah's Witness (Bawerîa min fereq e li gel bawerîa Şihud Yehwe. *My faith is different from the faith of Jehovah's Witnesses.*)
şikandin, bişkêne (1) to break [active voice] (Kiça min sênîk şikand. *My daughter broke the plate.*)
(2) to spread [a pile of playing cards out]
şikeft (f) cave
şikestin, bişkê to break [passive voice] (Sênîk şikand. *The plate broke / was broken.*) (Destê wî şikest. *His arm broke.*)
şikestî broken (Milê xesîa Dilnazê yê şikestî. *Dilnaz' mother-in-law's shoulder is broken.*)
şikil (m) (1) shape (Şiklê wê çawa ne? *What does she/it look like? / What is her/its shape?*) (şiklê hêkê *the shape of an egg / oval*)
(2) picture (Bila ez şikilê te bikêşim? *May I take your picture?*)

şiklê ezman (m) dialect (Gelek şiklê ezmanê Kurdîê hey. *There are many Kurdish dialects.*)
şil wet
şilindir (f) beet
şilqandin, bişilqîne (1) to mix
(2) to shake [something] (Min dermanê xwe şilqand. *I shook my medicine.*)
şimik (f) (1) sandal [without a back strap] (Şimkêt xwe bide ser pêt xwe. *Put your sandals on your feet.*)
(2) flip flop (Deyka Leqmanî bu min şimkek îna. *Leqman's mother brought me some sandals.*)
(3) dressy sandal (Min şimkêt taze wergirtin. *I received some pretty sandals.*)
şipe (m) silver
şiq (f) apartment
şirenqe (f) (Ar) (1) shot (Min şirenqa telqîḧî deyna de Hanaê da ew ne sax nabit. *I gave Hana an immunization shot so that she won't get sick.*)
(2) injection
şirîn sweet
şirka avê waterfall
şitî (m) watermelon
şivan (m) shepherd (şivanê çêla *rancher*)
şivik (m) flexible bark used to make baskets
şixate (m) matchbox
şî kirî married [women] (Ez ne şî kirî me. *I'm not married.*)
şî kirin, şî bike to marry [women] (Ew dê şî kit. *She will get married.*)
şîan (1) power
(2) strength
şîan, bişê (1) to be able to
(2) can (Ez dişêm bêm. *I can come.*)
şîkirin (f) marriage (Şîkirna wan baş bî. *Their marriage is good.*)
şîmal (Ar) (m) north
şîn (m) (1) blue (Qemîsê min şîn e. *My shirt is blue.*)
(2) bluegreen
(3) green
şîn bîn, şîn bibe to sprout (Genim / gul şîn bîn. *The grain / flowers sprouted.*) (Evroke 2 roja şîn bîn u serkeft. *(My flower) sprouted and grew up in 2 days.*)
şîr (m) (1) milk (şîrê bi duhin *cream*) (Min şîrê xwe kir mast. *I made my milk into yogurt.*)
(2) sword

şîr duşan, şîrî biduşe to milk (Berivan şîrî duşit. *The milkmaid milks.*)
şîr u vekirin, şîr u veke to explain
şîş(ik) (f) knitting needle
şîşe jar
şîştin, bişo to wash (Destêt xwe bi sabînê bişo. *Wash your hands with soap.*)
şîtik (f) sash (Şîtika min qeta. *My sash tore.*)
şîv (f) evening meal [dinner; supper] (Te çi xwar evro şîvê? *What did you eat for dinner?*)
şîvik stream (like a river)??
şîwe dialect (Gelek şîwe hene nav ezmanê Kurdî. *There are lots of Kurdish dialects.*)
ştî like this (Bu min gulekê ştî ve çêke. *Make a flower like this.*)
ştî êk (1) similar
(2) alike
şufer (m) chauffer
şul (m) (1) job (Şulê te çi ye? Tu çi dikî? *What is your job? What do you do?*)
(2) work (Te şul heye? *Do you have work to do?*)
(3) business
(4) [idiomatic] (Ez dê çim Zaxo. Te çi şul nîne? *I'm going to go to Zakho. Do you want me to do anything for you / get you anything while I'm there?*)
(5) [idiomatic] (Min şulekê te hey. *I want to talk to you about something.*)
şul bi destê … ketin, şul bu destê … bikeve to hire (Çi şul bi destê min ne ket. *I wasn't hired.*)
şul kirin, şul bike to work [function] (Tankê ava gerim şul nakit. *The water heater isn't working.*)
şula xwe veşartin, şula xwe veşêre to deceive (Wî şula xwe veşart. *He deceived [us].*)
şurbe (f) soup [rice, broth] that is not made with a tomato soup base
şurr pouting [idiomatic] (Lêvêt wî şurr in. *He's pouting.*)
şuv (f) farm

t

ta (f) (1) fever (Taî ya li min e. *I have a fever.*) (Ez ne sax im. Ez dirrecifîm di taê da. *I'm sick. I've been shivering from fever.*)

(2) temperature (Min ta gelek heye. *I have a high temperature.*)
ta (m) (1) cord
(2) string
(3) thread
ta'et (f) obedience / faithfulness to God (Ne kirîna ta'eta Xwedê gunneh e. *Disobedience to God is sin.*) (Ez ta'etî bu Xwedê dikim. / Ez ji Xwedê tirs im. *I'm faithful to God / afraid of God.*)
ta'în fatally ill people (Êşa ta'în kete di nav milletê. *The pain of the fatally ill was felt by the people.*)
tabe' (Ar) stamp (postage)
tabi'et (m) nature (Tabî'etê Nazdarê xweş e. *Nazdar's nature is gentle. / She's a nice person.*)
tacir (1) merchant
(2) business man
taê yê paqijkirna didanê dental floss
taî kirin, taî bike? to tie a knot
taîd (f) laundry detergent
taîre volleyball
talib (m) (1) student (Ez talib im medresê. *I'm a student in school.*)
(2) scholar
(3) disciple
talîbe (f) (*see* talib)
tam (f) taste (Av bê tam e. *The water is without taste / tasteless.*) (Tama xwarina te xweş e. *The taste of your food is yummy.*)
tam kirin, tam bike to taste (Tam bike hêkê. *Taste the egg.*)
tamirandin, (bi)tamirîne turn off (Zupê tamirîne. *Turn off the heat.*) (Moberîde tamirandî çinko dinya sarr bî. *The air conditioner is off because the weather is cold.*)
tankê ava gerim water heater
taqes (Ar) (f) weather
taqet (f) (1) energy (Min taqet ne maî ye. *I don't have any energy.*)
(2) strength
taqî kirin, taqî bike to test [someone; e.g., to question's mental ability]
taqîkirin (f) temptation
tarî dark (keskê tarî *dark green*)
tarî (f) (1) the dark
(2) darkness
tarîx (f) (1) history
(2) date [month and day] (Evroke çi tarîx e? *What's today's date?*) (tarîxa deyk bîna te *your birthday/date*)

tasarr chills (Tasarr yê li min e. *I have chills.*)
tav sunny (Dinya runahî ye u tav e. *The weather is bright and sunny.*)
tav (f) sun
tax bitter [e.g., coffee]
taxima didana dentures
taxmek gerdenîa zêrra gold jewelry given a bride when she accepts a proposal of marriage
tay branch (di nav tayêt wê *in its branches*)
tazahî decoration (Perde bu tazahî ne. *The curtains are just for decorations.*)
taze (1) beautiful [babies, females, things]
(2) pretty [babies, clothes, flowers, plates, things] (Biluzê te taze ye. *Your sweater is pretty.*)
(3) cute [babies, females, things]
(4) nice (Şulê te taze ye. *Your work is nice.*)
(5) carefully (Taze bi rê ve herre. *Walk carefully.*)
tazî (m) mourning (Ew hatin tazîê li mala me. *They came to our house to mourn.*) (Min tazî hebî. *I was in mourning.*)
te (1) you (sng) [oblique] (Te kêk çêkir? *Did you make cake?*)
(2) your (sng) [oblique] (destê te *your hand*)
te'amil kirin, te'amilê bike (Ar) (1) to treat [the manner one uses in dealing with people] (Beyar te'amilê li gel jina xwe baş dikit. *Beyar treats his wife good.*)
(2) to bargain (Ez dê te'amilê li gel xudanê dikanê kim. *I will bargain with the store keeper.*)
(3) to negotiate
te'bî tired
te'et (f) obedience
te'lîm (f) (Ar) learning
te'mîn insurance (health, car)
te'xîrkî procrastination (Te divêt tu imtîĥanê te'xîrkî? *Do you want procrastination/to procrastinate on your test?*)
teb'an (Ar) of course
Tebax (f) June
tebaxe (f) stove
tebeq (1) story (Xanîê te çend tebeq e? *How many stories does your house have?*)
(2) level [of a building] (Tu li kîşk tebeqî? *Which level are you on?*)
tebesî (m) turquoise
tebe' kirin, tebe' k(bi)ke photocopy (v) (Van tebe' ke. *Print these.*)
tebeşîr (f) chalk

tebî'î (1) normal [natural] (Tebî'î ye heker kiçik u kurrik ḧes ji êk u dû bikin. *It's natural for girls and boys to like each other.*) (Gerdinê biçîkê xwe tebî'î bî. *Gerdin had her baby naturally [vaginally].*)
(2) OK [all right] (Tebî'î tu bêî mala me. *It's OK for you to come to our house.*)
teblîk (f) tea saucer
tebrît air conditioning (Tebrît hil e. *The air conditioning is on.*) (Tebrît tamirî ye. *The air conditioning is off.*)
tedirîs kirin, tedirîs bike to teach
tefkîr (f) (Ar) idea (Tefkîrek hate bîra min. *I got an idea.*)
tefkîr kirin, tefkîr bike (Ar) (1) to think about
(2) to daydream (Tu çi tefkîr dikî? *What are you thinking / daydreaming about?*)
tehecî kirin, tehecî bike to spell (Ka bu min navê xwe tehecî ke. *Spell your name for me.*)
teḧil bitter [not sweetened; e.g., tea or coffee without sugar, medicine, green fruit] (Ez ḧes jê dikim heker teḧil bit. *I like them if they're not sweet / less sweet.*)
teḧîn (f) sauce made from sesame seeds (Teḧîn u duşav xweş e. *Teḧîn and date syrup is delicious.*) (Teḧîn ji kuncîê çê dibit. *Teḧîn is made from sesame seeds.*)
teḧîna fisteq ebîda peanut butter
teḧînî beige
tejbe (Ar) in the image of (Bîk tejbê mirova ne. *Dolls are made like (in the image of) people.*)
teks (f) tax (Her sal ez teksê dim ḧikmetê. *Every year I pay taxes to the government.*)
teksî (f) taxi
teksîm kirin, teksîm ke to divide
tekst text [e.g., lyrics]
telefon (f) telephone
telefon girtin, telefonê bigire to hang up
telefon kirin, telefon bike to telephone (Telefona xoşka xwe bike. *Call your sister.*) (Çi wextê te divêt, telefona min bike. *Call me when you want to.*) (Min divêt ez telefona Adarê bikim. *I want to phone Adar.*)
telefun (f) telephone
televizîun (f) television
telhe (f) trap with bait
telhe ve dan, telhê ve de to set a trap with bait (Min telhe ve da li ber kêvrîşkê. *I set a trap with bait [to catch] rabbits.*)
telîs bag (telîsek şekirê *a [50 pound] bag of sugar*)

telqe havêtin, telqa bihavê to shoot
telqîḧî disease [infectious] (Min şirenqa telqîḧî deyna de Hanaê da ew ne sax nabit. *I gave Hana an immunization shot so that she won't get sick.*)
tema' greedy (Hindek mirov gelek tema' in. *Some people are really greedy.*)
temam (1) complete
(2) perfect [situations, things]
(3) certainly
temam kirin, temam bike (1) to fulfill
(2) to finish
(3) to complete (Me medresa xwe temam kir. *We finished school.*)
temamî legally (Xoşka te bi qeçaẍî hat? Ne, temamî hat. *Did you sister come illegally? No, she came legally.*)
temamkirin (f) fulfillment
temate (f) tomato
tembel lazy
temerhind tamarind [a sour tropical fruit that Kurds eat or drink the juice of; looks like a date]
temrîn (f) exercise (Ev temrîne gelek baş e. *This [physical] exercise is very good.*)
tena quiet [still] (avêt tena *quiet waters*)
tenahî (f) peace (aştî u tenahîa dilê *peace of the heart*)
teng (1) narrow (Mala me teng e. *Our house is narrow [small].*) (Rêka me gelek teng e. *Our path is really narrow.*)
(2) tight
(3) difficult (hevalê dilîvêt teng *all-weather / faithful friend = friend of difficult circumstances [idiomatic]*)
tengav (1) sick and wanting to go to the bathroom
(2) homesick
(3) [idiomatic] (Ez tengav im. *I have to go to the bathroom.*)
tengavî (f) (1) trouble (Hîn dê tengavê di cîhanê da bînin. *You will have trouble in this world.*)
(2) difficult (Ew tengavî ye. *It was difficult.*) (wextê tengavî *a difficult time*)
tengenefes asthma (Tengenefesê hey. *I have asthma.*)
tenha (1) on one's own
(2) alone
